# *TEZÊN AZADIYÊ - II*

# *ABDULLAH ÖCALAN*

*Weşanên AkademiyaJineolojiyê*

**Cihê Çapkirinê: Çapxaneya Roj**

**Dîroka Çapkirinê: Kanun 2017**



Tenê jina ku dikare bihêz bifikire, dikare baş, xweşik û rast bîryar bigire û bi wê awayê bi derbaskirina min dikare heyranê xwe bihêle û dikare bibe muxatabê min, bêguman yek ji kevirê goşê ya l êgerîna min a felsefî e

**PÊŞGOTIN**

Ez weke ‘Tezên Li ser Pirsgirêka Jinê’ difikirim. Di vê çarçoveyê de ji civaka Neolîtîkê heta roja me xebateke min a berfireh heye. Di şûna ku jina kurd biçûk û bêqîmet bibînim, min di serî de dayik, mezinkirina hemû jinên bê şans esas girt. Min girîngî da nêzikahiya zanistî. Tezên azadiya jinê heta bigihînin peymana civakî têkoşîn pêwîst e. Ez hewl didim ji bo vê, perspektîfeke zanistî û siyasî bînim. Jin, di mîtolojiyê de hatiye binaxkirin; jixwe piştre jî di siyasetê de cihê wê tune ye. Dîroka Neolîtîkê li Zagrosan, ji çiyayên Kurdistanê derket. Ya rastî ev axên ku li serê Neolîtîk derket şoreşa çandinî, gund û jinê ye. Ev ax hê jî ji vê şoreşê xwedî dibin. Windakirina jinê, windakirina azadî, wekhevî û civaka sosyalîzmê ye. Pêşketina dagirkerî û newekheviyê ye.

Piştre xwedayên Yewnan derdikevin holê. Kulta pêxember a Rojhilata Navîn jî li ser viya zêde dibe. Rewşeke wisa çêdibe weke ku jin tune ye. Di roja me de divê mirov veguherîne peymaneke civakîyanû. Pirsgirêkeke zindî ye. Ez dem bi dem,pirsa “Divê Çawa Bê Jiyankirin” tînim rojevê... Têkoşîna jinê, di çareseriya pirsgirêkên çînî û neteweyî de roleke bingehîn dileyîze. Ez wisa bi aborî, teng li pirsgirêka jinê nanihêrim. Bi erzanî hestê nagirim dest. Zêdetir exlaqî û felsefîk nêz dibim. Ne bi darizînên olî, ne jî bi çanda roja me nêz dibim. Ne wiha, felsefîk digirim dest. Ger derfet hebe ez ê hewl bidim viya derxînim holê. Ez exlaqa kevneşopî ya rojane cidî nagirim. Napejirînim. Li gor min têgihîştineke, feraseteke min heye. Ger derfet hebin ez dixwazim di pirtûka xwe de viya mîna tezan pêşkêş bikim.

***Abdullah Öcalan***

**1999**

**19’ê Hezîrana 1999’an**

Derbarê jinan de projeyeke jiyanê ya min ku nîvî mayî hebû. Naveroka wê dikare were tijekirin. Ji ber ku cewhera wê hatiye dayîn. Divê têkoşînên azadbûnê berdewam bikin û heta dawî biçin. Li gor min meşa jinê ya azadiyê hê jî têkoşîneke herî mafdar e û dikare hate dawî biçe. Bandora wê ya li ser jiyan û aştiyê divê were fikirandin. Divê yê nû were afirandin. Jina azad, ji bo min îdeal bû. Ew doza min divê bikaribe bigihê encamê. Jina azad dibe, çawa bixwazin, dikarin bixwe biryara xwe bidin. Li ser viya sekinandin kelecanê dide mirov. Tirsa min; şaş bê fêmkirin.

Asta têgihîştina girtîgehan bilind e, em dikarin ji hev re binivîsin. Tevi pratîkan, encam divê aştiyê bîne. Ev, hunerek e. Ger fersenda min çêbibe ez ê binivîsim. Divê bikaribin bi viya ve herin. Ew bixwe dikarin biryara xwe bidin. Ez nikarim empoze bikim, bi darê zorê bidim pejirandin. Têkildarî jiyana misoger û mêr, jina azad dibe çawa bixwaze divê wisa tevbigere. Dikarin piştgirî û têkoşîna xwe bi pêş bixin.

**26'ê Tîrmeha 1999'an**

Derbarê Tevgera Jina Azad de jî; di mijara jiyana azad de ez hezkirin û hurmetên xwe yên bêdawî diyar dikim. Bila projeya jiyana azad a nîvî mayî berdewam bikin, bi pêş bixînin.

**1'ê Tebaxa 1999'an**

Ez zêde pêwîstî nabînim li ser têkiliya civakî û jiyana we bisekinim. Ez ditirsim ku kêm û bêpêkanîn be. Min dixwest di şênberiya, şexsê jinê de çareser bikim, nîvî ma. Her çiqas gelek xemgîn bibim jî temamkirina viya zehmet e û ez niha derfetên wî nabînim. Lê aşkera ye ku pêwîstiya pêşketina têkilî û şêwazê jiyana ku wê zirarê nede cewherê, nîvî jî bimîne wateya wê xera neke heye. Wê ev, êdî hinek jî di afirîneriya kes a hunermendî de îfadeya xwe bibîne. Min bihîst ku YAJK bûye partî. Daxwaziya min serfiraziyê ji jina azad re bîne. Lê ez dikarim ji bo pêşketina wê

yapiralî û bi kûrahî hurmet, hezkirin û hesreta xwe ya bêdawî diyar bikim.

**16'ê Tebaxa 1999'an**

Ez divêm qey di dinê de partiya jinê ya yekem e, gavekî pêşketî ye. Hewl didin xurt û bi hêz bibin. Ez bawer im li Başûr jî rewşa wan pêşketî ye. Dibistanên hunerê hene. Bila di wan de xwe qeyd bikin, bi cî bibin. Perwerdeya polîtîk pir pêwîst e.

**26'ê Tebaxa 1999'an**

Îngilîz dizanin ku herî zêde min jinê azad kiriye. Ji azadbûna jinê ya fizîkî bigire, heta teşegirtina ruhî li cem me perwerdeyeke pir baş û xurt hebû.

**2'yê Êlûna 1999'an**

Tendirustiyê hinek îdare dikim. Bi pêşketina aştiyê ve têkildar e. Ji hemû girtîgehan, bi taybetî ji jinan re silavên min bibêjin. Ez ê di demên pêş de metnên pir xweş ên jiyanê –hinek weke ayetên jiyanê berevajî dikin- binivîsim. Hestên min ên pir balkêş, ecêb hene. (Jinên) Girtîgeha Sêwazê ecêb xweş nivîsandibûn. Rindî û xweşikayî di asta herî jor de ye, tengasiya min a herî mezin; parvenekirin e. Pêşketina aştiyê jî bi viya ve girêdayî ye. Ji ber ku jin aştî ye.

**Beşek Ji Nameya Rêbertî ya bi dîroka 5'ê Êlûna 1999'an ku ji Konseya Serokatiyê ya PKK'ê û Komîteya Navendî re Nivîsandiye**

Min peyama Partiya Jina Azad girt. Zehmet e ku mirov bi hestdariyeke kûr, watedar û bilind nirxekî bide girêdayîna wan. Ji bo min xebateke herî zehmet a salên dawîn bû. Mijar hesas bû. Bi hestên giran barkirî bû. Bûye girêka kor a pirsgirêkên hezar salan, ji rêzikên bêrehm ên şeran, ji dersan bigire; şêwazê jiyan û nêzikahiya xweşikahî, wekhevî û tije kedê derxistina holê; viya jî bi awayê bi hêza wan a cewherî kirin, derxistin, min rêyeke wisa da pêşiya xwe, tercîh kir. Ger hebûya nêzikahiyeke pir kêm kesan

diwêrî, lê ne klasîk, cî nade serdestî û desthilatiyê, pêwîst e wiha bûya. Girêdana di navbera zayend, civak û siyasetê de divê rast bihata têgihîştin. Her wiha bi jinê re mirov tenê dikarîbû xweş bijî. Ji bo pirsgirêkên cewher û teşeyê bersiv pêwîst e.

Tevî ku merhaleyên girîng hatine derbaskirin jî li gor min kêm mabû. Her wiha li derdora min derdoreke, hestî ya xwe bi zêdeyî feda bike, biteqîne pir zorê dida min. Di dema dawîn de ev hîn jî zêde bûbû. Her wiha, ev hêzên hest û fikrên kûr ku hatine bidestxistin, li dinyayê jî xwe nîşan dide. Jinê ji objebûnê (tiştbûnê) derxistin û bûyîna sûbje, bi nasnameya xwe ya cewherî bibin hêza îrade û serwextbûnê di rastiya me ya berbiçav de xwedî girîngiyeke mezin e. Gaveke bi îdîa ya viya partîbûyîn ye. Bi viya, bêguman li şûna dinyaya civaka bi desthilatiya mêr a hezar salan, wê bang li jinê bike ku xwedî li hişmendî û îradeya jinê ya xweser, parvekirina civakeke rast bigire. Li ser vê bingehê di jinûve şekildayîna jêr û joravahî de cî bigire. Bi bername, rêxistin, şêwazê jiyanê ji bo xwe ji nû ve ava bikin li ser vê esasê wê bi rêgez bimeşin. Ez ji kûr ve bawerî bi pêwîstiya viya dibînim.

Ez hurmeteke mezin nîşan didim ku jiyana xwe fedayî min dikin. Li şûna beriya ku bên dinyayê bibin pîrekên mêran, divê beriya her tiştî bibin jina hezkirinê, gel û xweşikiyê. Ez bawer dikim ku di demên aştiyê de wê fazîletên bi esîl zêdetir bi pêş ve bibin, ne bi koletî girêdayî bin, bibin hêza bi xweşikî ber bi xwe ve dikişîne ya azadiyê. Bi qasî ku ev belkî bibe xebateke şoreşger a sedsala 21. a herî zêde bi xwe re dikişîne û gelek nirx didim serkeftina wan, ez bawer dikim ku wê serfiraz bin. Ez hêvî dikim ku di her qada xebatê de hêza xwe ya mezin a fedakarî û wêrekiyê, bi qasî ku dixwazin, bawer dikin û bi ser dikevin bi kar bînin. Ez ji hemûyan re hesret, bêrîkirin û hezkirina xwe ya mezin diyar dikim.

Zehmet be jî ez tendirustiya xwe diparêzim. Ez bi hêza mezin a hestan hevseng dikim. Encamên kesayeta azadî û hesreta mezin çi

ye, tiştekî bêhempa ye. Mîtolojî, ol, siyaset, felsefe, hiqûq û leşkerî yên bi koka xwe ji Mezopotamyayê ne, tên zanîn an nayên zanîn, hê jî pir bi bandor in. Li wê derê zayîna hunera gel efsûnkar e. Ez viya hîs dikim. Zayîna jiyana azad, her tim ricifîneke pîroz û hêcanekê dide. Çareseriya aliyên rast û şaş a şerê we, ji viya derxistina berhema hunerî ya pêwîst, divêtiya felsefeyeke, jiyaneke exlaqî ya nû hê jêneger dibînim. Ez naxwazim zêde bikevim trajediya tê jiyankirin. Ger hûn ji zarokên lêzimên windayan re, bi giştî ji jin û pîr û extiyaran re, ji hemû feqîr û xizan û yên muhtacî alîkariyê ne, yên eş dikişînin, yên bi cewher û mafdar dixwazin, ji xweşikahiyan re, ji aliyê min ve ji daxwaziyên wan re bibin bersiv, bi qasî ku ez ê gelek kêfxweş bibim, ez we bi bêrîkirin û hezkirinên xwe yên bêtarîf helmêz dikim. Ez diyar dikim ku heta dawî ez yê we hemûyan im, bi qasî ku dixwazin yê her kesî me û silav dikim...

**9'ê Êlûna 1999'an**

Koma jinên ku ez nas dikim hinek bi rik û înad in. Bila nebin desthilatdariya zû. Bila nebin dînên desthilatiyê. Xebateke ku wê bandora wê ya sedsaleyî hebe. Wê hinek pêşniyarên min ên pratîk hebin. Weke mînak di Xiristiyaniyê de ezîz û ezîze hene. Ez viya jî pêşniyar nakim. Di roja me de tevgerên femînîst hene. Ew jî qut dibin. Ev, pêkhateyeke xweser, hîn radîkal e. Wê zorê bide ku di nav heman partiyê de cî bigirin. Xebatên jinê, wê reng û bandora xwe bidin xebatên dema aştiyê. Ew girêdana pir mezin a ku jin nîşan dide ger veguhere çalakiya aştiyê wê teqîneke pir xurt, girîng çêbibe.

Divê aliyê mêr xweserî û cudahiya Partiya Jina Azad bibîne. Mêr, her ku biçe wê bertekan nîşan bide. Wê bi hêsanî dest ji desthilatdariya xwe bernedin. Wê xwe bavêjin erdê. Aliyê mêr, divê qet neaxivin. Alîkariyeke bikin ger hebe, bila di pratîkê de bikin. Ger jin hebe (ji viya re) bila hewl bidin xwe biguherînin û

veguherînin. Wê ev, wiha bi pêş bikeve. Ez bim ez ê bêdeng bim. Ger guhdar bikin wê guhdar bikin. Bi giraniya mêr teşeyek dayîn wê bertek û hêrsek derxe holê. Divê serbest were hiştin. Dikarin rexneyan bikin. Yan na wê bibe tiştekî weke sosyalîzma reel. Li çiyayan divê tedbîrên hîn baş werin girtin. Ev hinek xebata min bû min dimeşand. Bi tevahî wê bi awayê red bi pêş bikeve. Weke bertek teqînek e ji rêzikên mêr re. Bertek e ji tarzê jiyana ku hezar sal in bi destê mêr hatiye pêşxistin. Dibe ku dûr û dirêj berdewam bike. Dibe ku ev xebat ji bo hinek jin û mêran zehmet be.

Dikarin derbasî pergala civakî ya normal bibin. Min berê jî digot, lê bila nekin weke rêzik. Jin û mêr dikarin bi hev re bijîn. Heman jiyanê bila li aliyê din ferz nekin. Bila ferzkirina her du aliyan jî nebe. Mêr, divê zêde mudaxelekar nebe. Yên di pergala normal de jiyanê dixwazin, dikarin bizewicin. Jiyana li ba hev du ne weke rêzikeke partiyê, viya bila wek jiyana normal, pêvajoya xwezayî bijîn. Ferzkirinên rêzikî yên wiha, rêzika “Kes nikare bizewice” hê zû ye. Bila yên ku dixwazin kûr bibin jî rihet bihêlin.

Di cewhera vî karî de nakokiya zayendê heye. Kîn û hêrsa zayendê derdixe holê. Divê mirov nakokiyê nas bike. Mirov divê hêza wî nas bike. Nakokiyê çi zen dikin? Sedsala 21. bi tevahî weke nakokiya .... nîn e. Heta bibêjî mijar tevlihev e. Bibêjin “Çawa be jî hevala/ê şoreşger e. Diyardeya zayend ew qas jî girîng nîn e” ne rast e. Ew qas jî ne sivik û hêsan e. Xweseriya vî şerî –şerê zayend-heye. Heta bibêjî tevliheviya mijarê heye. Mirov divê danexîne têrbûna şexsî, cinseltiyê. Cinseltî tehlîleke pir cuda pêwîst dike. Min pir xurt dahûrandibû. Qey dahûrandinên min baş naxwînin?

Hat gotin ku tevgera jinê jana zayînê dikişîne. Ez 40 sal in bi vê janê dijîm. Divê jin xwe biguherîne. Divê pir kûr vebikin.

Xwedawend, hêza taybet pir baş birêxistin dikin. Pêwîstiya qadê bi kûrbûnê heye. Xweseriya viya heye. Pêwîstî bi ferzkirinên beramber hevdu tune ye. Xweseriya projeya me heye. Pêwîstî bi

fikra azad, mêjiyê azad, fikreke mezin û jiyanê heye. Divê weke sosyalîzma reel nebin. Dikarin jin û mêr bi hev re bijîn. Her kes jî nikare bimeşîne. Kesên bixwazin jiyana normal bijîn dikarin viya bijîn. Yê wê winda bikin jî hene. Wê lêgerîna xwe ya azadiyê winda bikin. Nikarin bibin azadixwazên mezin. Tenê dikarin rihet bibin. Ger dixwazin rihet bibin bila bibin. Di vê mijarê de qet xwe nexapînin. Berdêla divê bê dayîn heye. Pêwîst e tevlihevî û berevajîkirin nebe. Bila lez nekin.

Bila nîqaşa demokratîk bibe. Wê demokrasî hêza xwe bîne. Ez hinek jin û mêrên pir zehmetî dikişînin nas dikim. Ew jî li gor rêzikin aşîretê yên normal dikarin malbat ava bikin. Lê nikarin viya jî bînin asta rêzika partiyê. Bila weke awayekî şoreşger ferz nekin. Di vê astê de pêwîst e ji viya re nebin asteng.

Pêwîst e Aysel tevgera jinê kûr bike. Tevlîbûn, ketina we ya HADEP'ê girîng e. Wê dewlet bala xwe bide viya. Li derekê wê bibin weke berdevkên min. Baldar bin. Li ser nerazên. Bi erzanî jî negirin dest. Bi vî rengî belkî hûn xwe jî rizgar bikin. Min berê jî şiyarî da, nehat fêmkirin. Di vê mijarê de divê hûn hewldaneke mezin bidin. Pêwîst e hûn perwerde bibin. Pergal, jixwe ji kesan re sîstema qûl û padîşahiyê aniye. Hemû şêxên li rojhilat felcî ne. Bila îradeya we bi pêş bikeve. Min azadiya jinê jî ji ber vê yekê derxist holê. Ev dem demeke nû ye. Di encamê de di vê demê de demokrasî jî, jiyan jî, jin jî dikare bi ser bikeve, bi dest bixe...

**16'ê êlûna 1999'an**

Di vê derê de tespîta; wê pirsgirêka zayendê weke di pirsgirêkên din de di nav demokrasiyê de çareser bibe tespîteke pir xurt e. Nêzikahiya hem pirsgirêka neteweyî hem jî pirsgirêka jin û mêr dikare di nav modêla demokrasiyê de çareser bibe nêzikahiyeke rast e, pêwîst e were kûrkirin. Hûn jî divê nameya dawî ya YAJK'ê baş bixwînin. Di wê derê de jî nirxandinên xurt

hebûn. Bernameyên televizyonê çêdikin? Bila li gor demê bernameyên nû û xurt çêbikin. Li derve ji min çi tê xwestin?

**20’ê Êlûna 1999’an**

Girêdana jinan balkêş e, kûr û cuda ye.

**27’ê Êlûna 1999’an**

Îradeya jina azad derket holê, za. Divê mêr zêde têkildar nebe. Ji bo mirov li hev bike divê mirov azad be. Li gor felsefeya min divê jina azad were afirandin. Pêwîst e mirov ji îradeya azad re hurmetkar be. Ger serfiraz bibe mezin e, em ê silav bikin. Weke mêrekî min dikaribû haremekê ava bikim, bibim xwedî zar û zêç. Lê min xebata jina azad meşand. PJKK heye.

**21’ê Cotmeha 1999’an**

Xwezî me mijara pirsgirêka jinê ji pêvajoya piştî Dadgeha Bilind (Yargitay) re bihişta. Ez dixwazim bihêlim, me yê hîn rihet nîqaş bikira. Lê hûn bi vê asta şexsiyetê nikarin fêm bikin. Hûn dikarin fêm bikin? Min li derve bi sedan rûpel axaftin kir. Vana lêkolîn bikin, hûn nikarin têr binirxînin. Em vê mijarê piştre jî nîqaş bikin, ger fersenda min çêbibe.

Ji bo jinê, di metna min berê şandibû de, min çarçoveyeke bi rûpelekî çêkir, danî. Ez ji bo jinê viya pêşniyar dikim: bila xwe ji tiştbûn, metabûnê derxîne. Di hemû pozîsyona min de ev, ji bo min nêzikahiya azadiya felsefîk e. Ez vê nêzikahiya xwe hê jî berdewam dikim. Bûye mijara herî kûr, herî bi bandor, bi narîni, bi berfirehî, bi desthilatdarî ya mirovî, bûye mal. Bûye çîna herî kevn, hêmana metabûnê ya herî kevn. Jina ku bûye koleya hestên xwe, bûyereke wisa ye ku tiştekî weke pere ye. Di navbera jin û pere de têkiliyeke dijwar heye. Di navbera jin û aştiyê, azadiyê de têkiliyeke hişk heye. Bazirganî û dewlet, zêdetir karên mêr in, bi xwe re lidervehiştina jinê ya ji civakê tîne. Ev jî li karê mêr tê. Hinek di wateya klasîk de bi kuştina mêr dikare were fêmkirin. Min hinek derbas kir, îdîa kir. Ji viya re hêza we heye?

Hûn çiqas azadî dixwazin? Çiqas hêza we heye? Hûn azadiyê dixwazin? Gelek keçên me xwe şewitandin. Ez pir xemgîn bûm. Ev nêzikahî têkildarî azadiyê ye, ji ber vê yekê bû. Li gor min dîsa jî ev têkildarî azadiyê ye, ji ber vê yekê pêk hat. Li gor min dîsa jî divê mirov ji vê azadiyê re hurmetkar be. Azadî hatiye rewşa aktualîteyê.

Di jiyana xwe de tiştekî biçûk jî rûnîn bifikirin. Piştî ku we pêwîstiyeke madî ya herî sivik di jiyanê de bi cî anî rûnîn û bifikirin ka hûn ê çawa bibin xwedî nasname. Bifikirin hûn ê xwe çawa bikin xwedî nasname. Pêwîst e mirov bibe xwedî nasname, lê eleqedarî jêre tune ye. Meseleya hêzê ye. Ger hûn derkevin derveyî têkiliya jiyana xwe ya berdewam dibe hûn e bi tenê bimînin.

Azadî; xureka ruh û aqil e. Mirov bi xureka azadiyê dibe mirov. Lê cefa wî pir e. Di dîrokê de bi awayên cur be cur bi pêş dikeve. Di vê sedsalê de jî wiha bû. Hûn dikarin di konferans û panelan de nîqaş bikin. Hevaltiya min bi jinê re daniye, tiştekî xweş e. Min diyalogeke pir baş ava kiribû, lê nîvî ma. Kî jîr be dikare berdewam bike. Hûn dikarin fêm bikin ka ez çi dibêjim. Zayend gelek hat kirêtkirin. Jinbûnê anîn rewşa îşkenceya manewî. Nêzikahiyên şaş, di vê mijarê de, yanê tenê nêzikahiya cinsî pir kirêt e. Em bi vê mijarê re têkoşiyan, derbaskirina vê gelek girîng e. Em li ser zewaca klasîk û malbatê sekinîn. Ev, weke bîreke bêbinî ye, heta ji hev neyê derxistin, pirsgirêk nayê çareserkirin. Ji nan û avê zêdetir pêwîstî bi azadiyê heye. Divê hûn xwe bi xwe re têbikoşin. Hûn ê ji serî heta binî xwe nû bikin. Ez vê weke fizîkî nabêjim. Di vê astê de jin bi mêr re dibe, ev cînayet e. Ger tu cinseltî û têgîna namûsê bi kûrahî vekolî wê ji binê vê "Ez ji kesekî din re nakim yar, ger kesekî din çav berdê ez ê wan biperçiqînim, malê min e, namûsa min e" derkeve. Ger tu binê viya vekolî wê desthilatdariya bêsînor û asta metabûnê derkeve.

Ne ya xwe ye, hinek heta dawî xwediyê wê ne, eşq û evîna xwe davêje nav dest û pêyan. Zarokek jî li diya xwe wiha dike. Divê durûtî neyê kirin. Pêwîst e hûn pîrektiya xwe derbas bikin, têk bibin. Rewşa jinên mêrane jî divê were nirxandin. Hûn divê nasnameya xwe jî têk bibin. Divê hûn xwe bi xwe têk bibin. Jin li dijî jinê, jin li dijî xwe hîn bêrehm, bêmerhamet e. Hûn ê li hember jin û mêr şerekî çawa bidin? Têkoşîneke biaqil, baldar, şiyar û mezin pêwîst e. Ev, bi tevahî têkoşîneke demokratîk e. Çalakiya fikrê ye. Azadî mîlîtantiya aştiyê pêwîst dike. Lê li hember zordariyê divê xwe xurt bikin, hewl bidin bêhêziya xwe derbas bikin. Bi sedema bêhêziya xwe nikare vê feraset, têgihîştinê ji holê rake. Jin, ketin ferqa vê, lê nikarin dest ji bêhêziya xwe berdin. Herhal azadî ji hevser, mêr binirxtir û baş e. Ji zarokan jî baştir û girîngtir e.

Bêyî azadiyê her tişt heram e. Di vê derê de divê mirov namûsê li ser feraseteke rast bide rûniştandin. Namûsa eslî di vê derê de dest pê dike. Azadî ji bo min namûs e. Mêr, pir xasûk e, di vê pêvajoyê de jin jî pir xasûk bûye. Lê mêr serwer e. Derbaskirina vê îrade û hêz dixwaze. Ji bo vê dikarin xebateke demokratîk bikin. Di platformên weke partiyên siyasî de divê têkoşîn were dayîn. Pêwîst e têkoşîna demokratîk were dayîn. Hûn divê pêşî bibin xwe. Viya bikin weke nameyek. Ji bo girtîgehan, jinan û kovarê bişînin. Ez hestên xwe yên ji bo wan nikarim bi peyvan bînim ziman. Min xwest hem di mêjî û hem jî di jiyanê de bibim heval. Min hevaltiya bi fikir û îradeya xwe rast danî holê. Ya min tenê dibe hevaltî. Di vê rewşê de tiştekî din nabe. Nameyên tên hêja û watedar in. Di van şert û mecan de mirov dikare tenê silavek bişîne. Bi van êşên dikişînin jiyana herî xweş heq dikin. Ev xebatên min bersiva hesretên wan in. Ez ji bo ji hesretên wan re bersiv bidim dixebitim.

Ji bo jinê hinek fikrên min hene, gelek tiştên bên kirin hene. Di demên pêş de ez dikarim name û pirtûk binivîsim, li ser vê mijarê

bixebtim. Hûn ciwan in, ji bo mirovahiyê, ji bo rizgariya cinsê xwe bixebitin û şer bikin. Ne tenê ji bo pirsgirêkên xwe, ji bo pirsgirêkên hinekên din jî bibin hêza çareseriyê. Weke ezîz û ezîzeyên di dema Îsa de, di Musulmanetiyê de jî mumîn hene. Rewşa wan hatiye berevajîkirin. Yên ku rizgariya mirovahiyê ji xwe re kirine hedef ew in. Wateya viya ev e. Hatina we ya vê derê watedar e. Ya rastî têkoşîna azadiyê êpê hat dayîn. Ez divêm qey gihîştin, kamil bûn. Hêvîdar im zêdetir bi pêş bikevin. Gelek bi pêş ketin. Di nav wan de kes neçûn îxanetê. Jin û dayik zêdetir mirovên aştiyê ne. Jixwe destpêkê şer li dijî jinê hatiye pêşxistin û karê mêr e. Jin mirova aştiyê ye û miroveke civakî ye. Xwezaya jinê, şer û çînîbûnê napejirîne. Weke divêtiyeke xwezayî kesayeteke wê ya sosyalîst heye. Meyleke wê ya li ser jiyana sosyalîst heye. Têkiliya jiyanê ya mêr jî di zordariyê de ye. Bi nasnameya serwer a mêr re têkildar e. Aştî ew dem e ku jin herî zêde bi pêş bikeve. Şer jî mêr bi pêş dixe. Divê her tim mîlîtantiya aştiyê were kirin. Jin, di asta mîlîtanî de tevlî tevgera aştiyê bibe girîng e. Eleqe nîşanî tevgerên aştî û demokrasiyê bidin, pêşengiyê bikin. Aştî karê jinê ye. Ger hûn ji bo aştî û demokrasiyê pêşengiyê bikin hûn ê kesayeteke mîlîtan biafirînin.

Ger armanca jinê bi qasî rojê zelal be wê rêbaza xwe bibîne. Azweriya wê ya azadiyê xurt be, wê her rê û rêbaz werin dîtin. Di mijara azadiyê de divê mirov devlok û zimanbaz nebe. Di serê we de fikrên serwer ên mêr hebin hûn ê bibin şeytan. Ez gelek hêrs dibim ku gilî û gazinan dikin dibêjin “Em ê çawa bikin, pêşiya me dixitimînin”. Ez nefretê ji wan kesan dikim ku dibêjin “Pêşiya min vekin”. Bi vê gotinê hûn ji mêr alîkariyê dixwazin. Çi cudahiya te ji jina ku xwe avêtî stariya hevserê xwe ma. Ji hinekên din alîkariyê nexwazin. Destpêkê tu ji çiyayê Qafê bibuhure, dil û mêjiyê xwe bi pêş ve bibe. Rêhevala te ya herî mezin, azweriya azadiyê ye. Dil û mêjiyê xwe hîn bike, lê rêhevalên baş pêwîst in. Zarok digirîn.

Weke zarokan negirîn. Hûn bi aqil xwe bidin jiyankirin, bi pêş bixin. Ji bîr nekin, hûn li çarmîxekî ji min xerabtir hatine xistin. Yên xwe azad zen dikin nikarin bibin tu tiştekî. Ger hûn fêm bikin ku hûn li çarmîxê ne, bi qasî serê derziyê be jî hûn ê qiymeta azadiyê bizanibin. “Bila dewlet, bav tiştan bidin min” ev, îfadeya bêçaretiyê ye. Ger tu azadiyê pir bixwazî xwe bigihîne. Bi qasî hêza xwe kar bike. Wisa be bi îdîa nebin. Di vê mijarê de vekirî bin. Lê bi qasî hêza xwe rabike, eviya wiha her tiştî bike, tu yê sînor û pîvana xwe baş bizanibî. Çarenûs û rewşa xwe nîqaş bikin. Divê tu baş bizanibî xwe bi kar bînî, bixebitînî, tu baş nexebitînî tu yê biqedî.

Nêzî pêncsedî pirtûkên min hene. Ez jixwe nivîskar im. Naveroka pirtûka Eşqa Kurd xurt e? Min li  ser azadiyê nivîsandibû. Fikrên azadiya lîberal bi pêş dikevin. Di TIrkiyeya roja me de jî li ser vê tê sekinandin. Di vê mijarê de di çapemeniyê de nivîsên xweş hene, ez dixwînim. Gulay Gokturk baş dinivîse, ji me bandor bûye.

Tevgera Jinê ji bo aştiyê dikare rola xwe bilîze. Ger hûn pir bifikirin hûn dikarin kêmasiya mayî temam bikin. Ev şerê mirovahiyê ye. Em şerê mirovahiyê didin. Ev, zêdetir jinê eleqedar dike. Ji cewhera kar dertê. Bi gel û mirovên bindest re bûne yek.

Jin, mirovên baş in. Tiştekî xweş emirov bi jinê re bibe rêheval. Ji aliyê fikrê ve jin ji mêr paşvetir nîn e. Tu jin nikare min bîne rewşeke klasîk. Yên viya cêribandin hebûn. “Mirov bibe hevserekî baş an jî aşiq” ez nefretê ji viya dikim. Ez tu carî nayêm viya. Ez nêzî jina kole nabim. Aliyê herî balkêş ê kesayeta min ev e. Girîng e. Li ser kesayet û fikrên min baş bixebitin. Nivîsan kom bikin.

Min dikarî hinek ji bo dayikan binivîsim. Ez naxwazim ji bo dayikan biaxivim. Ez ji bo wan gelek xemgîn dibim. Hêsan e mirov gotinên sivik û erzan bike. Ez dixwazim bi kirinên xwe bêm zanîn. Ji bo jinan tiştên ez dikim ji bo wan in jî. Min têkiliya jin û mêr bi erdê re dûz kirin. Min ev qirêjiya dused salî xera kiribû. Min xwest bêsînor azadiya jinê biafirînim. Mumkun bû mirov viya hîn jî bi pêş

bixista. Min bi jinê re li ser esasekî gelek rast hevaltî kir. Mêr bi talûke ne, durû ne, dixapînin. Jin hatiye pîrek-kirin. Di vê mijarê de ez gihîştim encamên balkêş. Ez dibêjim bi qasî ku hêvî dikin û dixwazin ez yê wan im û silavên xwe rê dikim.

Mirovahî wê bi vana re bibe; eşq, hevaltî, rêhevaltî wê bi vana re pêk were. Tiştên min vegotin bi min nedin dubarekirin, di wê derê de her tişt hene. Hetanî hûn xwe di nav êşên tirsnak de diqedînin xwe bikin mîlîtanên aştiyê. Di şerê aştî û demokrasiyê de bi ser bikevin. Xwe bikin mîlîtan, di wê de xwe bihelînin. Neheqiyê nekin, bibin mînak. Encama ku wê were derxistin ev e. Ev jî îfadeyeke din a xwe şewitandinê ye. Hejmara vana bi dehan in. Ev, kesayetên mezin in. Bibin kesayetên mezin, nirx, di vê rewşê de hûn ê bibin kesayetên tên guhdarkirin. Girêdayîna bi bîranîna yên dişewitînin re wê serketina demokrasî û aştiyê pêk bîne. Van fikrên min bigihînin her kesî, ez ji bo wan a herî xweş difikirim.

Bi kesayeta Manî û Îsa re divê hevşibandin werin kirin, lê aliyên min ê xweserî min jî hene. Di Manî de li wêneyê binihêrin hûn ê her tiştî fêm bikin, li rewşekê binihêrin hûn ê her tiştî fêm bikin. Ê min jî hûn li bîranîneke min binihêrin, her tişt wê têra xwe bê fêmkirin. Li jiyana min, li bîranîneke min a azadiyê binihêrin hûn ê her tiştî fêm bikin. Mirin an jî mayîna min ne pirsgirêk e. Ya herî rast hûn bibêjin "Kesayeteke wiha jiyan kir".

Min tu tiştekî neda dayika xwe, careke ji min caw xwestibû, min nestend. Lê ne girîng e. Hezkirin û hurmeta min ji wê re pir mezin e. Ya girîng mirov ji bo mirovahiyê tiştekî bike.

Min bixwe nexwest ez erzan bijîm. Bi erzanî jiyankirin rezîlî ye. Mirov bibêje "ez ji her cure mirinê re amade me" ji min re zêde erzan tê. Ez jiyankirinê jî zêde ewk nabînim. Pêşeroja mezin a bêsînor di kêliyê de veşarî ye. Jiyaneke qirase û min wê kêliyê jiyan kir. Min vê kêliyê parast, radestî kesî nekir. Bi kesekî neda îxanetkirin. Mirin jî, înfaz jî were ne xema min e. Darvekirin, înfaz

min natirsînin. Pêwîst bû mirov ji bo aştiyê hin tiştan bikira, ji bo jiyanê jiyankirin ji min re rast dihat. Ez ji bo aştî û xuşk û biratiyê axivîm. Aştî ji min re rast hat, berxwedaneke çors, qabe watedar nîn e. Ev ne radestî ye. Ez bêm înfazkirin jî ez nabêjim "dijminayetiya tirk bikin". Ev, ne taktîk e. Yên xerab hene, ez ji bo gel têdikoşim.

**5'ê Mijdara 1999'an**

Kovara Jina Azad, dikare bibe weşana Komîsyona Jinên HADEP'ê. Dikarin faliyetên xwe bigihînin hev. Bila ji feraseta klasîk a ji bo mêr tê zanîn dûr bikevin. Bila tu têkilî ne li ser bingehên piştevaniyê, stariyê bin. Li şûna gilî û gazinan, divê jin bizanibin maf bigirin. Bila bê sebir nebin. Lê bila mêr bavtiyê nekin. Jinan negirin bin stara xwe. Mêr sîstemek, pergalek e. Tu yê jî têkoşîna xwe ya azadiyê bidî. Bila bi ser xwe ve biçin. Ji tu kesî jî hêviya alîkariyê nekin. Ferasêtên olî yên mîna wê sosyalîzm were û dewlet ava bike şaş in.

Ez ji bo jinan jî bi taybet viya dibêjim; mêr hevserê herî baş, evîndarê herî baş be jî, tu car destûrê nade te. Ew helbesta derbarê Manî ya min berê qal kiribû bila bixwînin, binirxînin. Bila berhemên nû yên hunerî çêbikin. Bikin weke lîstik. Bi ya min dikarin ji wî lîstokeke pêncî rûpelî derxin. Di wê derê de hevokeke wiha heye, weke wî dibêjim;

"Min nivîsand nivîsand nexwendin
Te got
Wan cuda fêm kirin
Wan jî li vê dinyayê
Jiyaneke din jiyan kirin"

Di vê derê de ez xwe dibînim. Ez van hevokan jî ji bo her kesî diyarî dikim. Ji bo nameyên min dikare weke bersiv were dayîn.

**8'ê Mijdara 1999'an**

Ji bo sala 2000’an dikarin Projeya Jina Azad bi pêş bixin. Ji bo vê min navê welat kêm dît. Ez difikirim ku divê Weqfa Jina Azad a Dinyayê bê sazkirin. Vejîna 4 hezar salan e, wê li hemû dinyayê pêk bê. (Bi ken) Her çawa be tê bîra min. Dibe ku li Romayê navendek hebe. Ji ber ku mafê îltîcayê dan min. Ji aliyê hiqûqî ve jî wê hîn erênî bibe. Ji bo xwezaya jinê ya winda bûye ji nû ve were keşifkirin, ji bo xweza û civakê danîna çarçoveyeke nêrînê wan ji nêz ve eleqedar dike, li dijî mêr û nêzikahiya civakî ya bi serweriya mêr, helwesta azad a jinê pêşxistin, rast fêmkirin, bi demê re ber bi rêxistinbûnê ve birin. Jin, li dijî desthilatdariya mêr a nêzikahiya hem civakî û hem xwezayê divê helwesta wekhev û azad bike hedef.

Ev proje lêkolîneke cidî dixwaze. Encamên bi vê lêkolînê bi dest xistin wê berbiçav bikin. Ji bo bîranîna jinên şehîd, ên xwe şewitandin û dayikan, tevkariya min a li gor xwe dixwazim bidim ev e. Ez nabêjim bila her kes bikevê, lê ji bo hinekan pir pêwîst e. Ji bo weqfê derfetên madî, li Rojhilata Navîn, Ewrûpa û Tirkiyeyê dibe malên partiyê hebin. Hin mal hebûn. Bi qasî pêwîstiyên xwe ev mal dikarin bi weqfê ve bên girêdan. Pêşniyara min e. Ji niha ve ji bo vê dibe ku hin navend hebin. Li Ewrûpayê, Rojhilata Navîn û li welat jî hene. Li Amedê pêwîst e cihekî bibînin. Ji aliyê îdeolojîk, moral, fizîkî ve divê jin di ber çav re were derbaskirin û bê parastin. Mal ji bo vê pêwîst in. Wê derfeta madî bibînin. Ji şer û pevçûnan pir zirar dîtin. Armanc, bicîanîna parastina vana ye.

Perwerde bingeh e. Pêwîst e xwe û zarokan perwerde bikin. Perwerdê, dikarin bi zimanê zikmakî bikin. Desthilatdariya mêr a çar hezar salan heye. Ez nabêjim ji bo vê “Bibin rahibe”, lê divê şêwazê jiyaneke ji wê jî dibuhure hebe. Ew jina ji însafa mêr re bê hiştin mehkûmî windakirinê ye. Ji bo vê jî derfetên madî pêwîst in. Mêr û civaka bi serweriya mêr wekî din nikarin ji hev de bixînin. Dema nikaribin ji hev de bixînin têkçûn jî ji rê de ye. Ji têkçûnê

rizgar nebin jî nikarin azad bibin. Wê ji serî, ji destpêkê ve winda bikin. Jixwe partiya xwe ava kirine, bi demê re dikarin bi pêş bikevin, navneteweyî bibin.

Jin, keçik, dayik û zarokên li erdê mane hene, pêwîst e li vana xwedî derkevin. Bi zimanê zikmakî divê ev werin perwerdekirin. Ev, erkeke, peywîreke li pêşiya hemû erkan e. Ji bo aştiyê erkeke girîng e. Em derfetên sînordarkirî didin. Bila baş bên bikaranîn. Ji dayika min bigire, heta ji bo yên xwe şewitandinehemûyan, ên di nav têkoşînê de şehîd ketine û bi taybetî ji bo dayikan. Ez ji bo tevan wiha bi giştî bersiv didim. Ji bo bersiveke watedar a bi hevaltî ku ez bikaribim bidim, ez vê projeyê pêşniyar dikim. Projeyeke baş pêwîst e, bi girîngî pêwîstî pê heye. Femînîst an jî ne tevgera komeleyî ya teng. Di çarçoveyeke xweşik de vêya pêşkêş bikin. Di sala du hezarî de diyariya dawî ku ez bidim jinan ev e. Ger wiha bibe wê ji bo pêşerojê hêvî bide.

Ew helbesta Manî di televizyonê de hat xwendin? Wî 1700 sal berê kirinên me kiriye. Ji Mêrdînê derketiye, di eyara Îsa de ye. Pir dişibe pêvajoya îro. Ew helbest pir baş dida. Dema roj hiltê û diçe ava wisa baş dide ku jê feyde bigirin. Hûn heta dîrokê nizanibin hûn nikarin xwe pênase bikin, nas bikin. Her ku ez wê dîrokê dixwînim, ev dinya li ber çavê min pênc pere nake.

Li Sûrî bajarekî bi navê Palmîra heye. Mîna harîkaya heftemîn a dinyayê ye. Teqez biçin bibînin. Ez çend caran çûm. Dîrok û îro ji hev qut nîn in, lê dîrok hatiye jibîrkirin. Qet nebe hin gotinên tên gotin bila bi kûrahî fêm bikin. Wateya wê heta bibêjî kûr e, ji bo jinê pir girîng e. Ez, ji bo êş neyên kişandin, ji navê rabin, jiyaneke watedar pêk were dixebitim. Di axaftinên xwe de, di panelên xwe de ez çawa bim min wisa bidin nasandin. Hûn min çiqas didin nasandin, şertên min ên fizîkî jî, tevgerên min jî bibêjin, vebêjin. Hê jî ji ber ku her kes min weke çavkaniya hêzê dibîne ez zehmetî

dikşînim. Ji ber şert û mercan ez têra xwe nikarim hêzê bidim. Hê jî nikarin heza rast bigirin.

**18'ê Mijdara 1999'an**

Pêşniyara min a Weqfa Azadiya Jinê hebû. Di vê mijarê de çi tê kirin? Pirsgirêka jinê ya perwerdê pir giran e. gotineke serokwezîrê Norweçê heye, dibêje "Ji bo berjewendiyekê zemîna herî baş perwerdeya jinê ye. Razemeniya herî baş ya li perwerdeya jinê tê kirin e". Rast e, veberhênana, razemeniya li jinê were kirin girîng e. Perwerdeyeke jinê ya xweser, afirîner pêwîst e. Keçikeke zarok di pazde saliya wê de dixin nav avahiya civaka bi desthilatdariyeke pir giran a mêr, ev, qedandina, dawîanîna jin, malbat, mêr û civakê ye. Ger hêza jinan hebe divê nexwin, venexwin xwe perwerde bikin. Jineke bîst salî xwedî deh zarok be cezayekî pir giran e. Divê hûn hinek bi bawerî bin. Perwerdeya xwe kûr û berfireh bikin. Wê mêr zorahiyê bide, lê di destê we de derfeteke rêxistinbûnê heye.

Ger weqif çêbibe, hinek avahî hene. Hûn dikarin wan bikin mulkiyeta xwe. Dibe ku sibe roj we qebûl nekin. Li wan deran xwe perwerde bikin. Divê hûn perwerdeya xwe weke ku îbadetê dikin bikin. Bi hestiyarî ranebin û xwe neşewitînin, navêjin agir. Negirîn, bila li kuçeyan nekevin rewşên zehmet. Derbarê jinan hewldanên, xebatên min hebûn, lê min temam nekir. Bila jin zarokan perwerde bikin. Bila xwendin û nivîsandinê, zimanê xwe, kurdî hîn bibin. Bila her yek 20, 30 zarok perwerde bikin. Ne pêwîst e îleh zarokên wan bi xwe bin, hemû zarok zarokên me ne. Va ye sosyalîzm, demokrasî ev e.

Kapîtalîzma wehşî, hov, civakê, vana mehf kiriye. Ev ya herî rast e. Bila alîkarî hev bin. Sazî û dezgehên sivîl, saziyên navneteweyî hene. Ger hûn bixwazin hûn dikarin alîkariya bêsînor bigirin. Silavên min ji bo wan bibêjin. Silavên min rasteqînî ne. Xizmeta min e, berbiçav e. Bila îradeya xwe ji bo karên wiha sewq bikin. Ger mimkun be bila li ser van esasan bixebitin. Pêwîst e êş li

perwerdê, rêxistin û xebatên bi feyde were veguherandin. Bila bi sebir bin, divê mirov fêmdar be. Wê bi xizmetên wiha rizgar bibin. Pirsgirêkên bi hezar salan in ketine ser hev hene. Tenê dikare wiha bi rêxistinbûnê bê derbaskirin. Ez li dijî malbatê nîn im. Dikarin zewacên zana û baş bikin. Ez dibêjim zewaca bi jinek an jî mêrekî nezan re heram e. Divê girêdan li ser bingeha zanînê be, li ser esasên karên bi feyde be. Ji bo min zêde wateya girêdaneke hestiyarî tune ye. Me di van mijaran de gelek hewl da, lê nikaribû biqedînin.

**2'yê Berfanbara 1999'an**

Di vê mijarê de min berê jî gotibû, ez rast nabînim ku xwe dişewitînin. Ger nirx bidin rastiya mezin, ev ji xweşewitandinê hîn hêjatir e. Nirxa herî mezin a ku ez didim jinê di vir de ye. Min nexapand û nehatim xapandin. Min axaftina xwe ya bi dayika xwe re berê jî ragihandibû. Di nav xwe de wî nîqaş bikin, kûr bikin. Divê hûn viya vekin "Ev mirov çima bi dayika xwe re nîqaşeke wiha kir?" Min vana li ser hev veguhest, vana baş binirxînin. Cihê vala di 50 saliya xwe de viya negot. Prensîbeke min e. Min got; "Ez ê nebim ew mêrê vî çaxî." Ji bo jinan ev girîng e. Min got; "Ger hûn ê min fêm nekin, dest ji min berdin, yan na hûn ê bi qirçeqirç bişewitin". Ev jî encameke viya ye. Ji nêz ve têkiliya viya bi azadbûna jinê re heye. Ev mirov dîn e, çima wiha dike, tevdigere, ne dîn be çima hûn min fêm nakin? Pêwîst e hûn fêm bikin. Ger hûn fêm nakin dest ji min berdin.

Min ev weqf jî ji bo wê xwest. Em weqfê ji destê mêran digirin didin we. Min berê jî gotibû, ger hê jî dimîne, dest nedabin ser, hin malan hem li Başûr hem li cihên din binirxînin. Her tim zêde zêde bixwînin. Perwerdeyeke mezin pêwîst dike. Xwe û zarokên xwe perwerde bikin. Ger hûn li gor kêfa xwe herin hûn ê bibin durû. Ji bo mêr jî wisa. Di hevpeyvîna min a bi Mahîr Sayin re de heye. Ez dibêjim; "Ez ê nebim mêrê vî çaxî". Ji bo vê jî ez eziyeteke mezin li

xwe dikim. Aliyê min ê baş tek ev e. Min ji yên li çiya re digot, jinên li alî min in ji min fêm dikin hûn nikarin bi hêsanî bi wan re serî derxin. Hûn nikarin jinên ji min fêm dikin bixapînin. Ger ji min tiştek fêm kiribin hûn nikarin ji rêzê nêz bibin. Ji bilî vê jina kole ye, jina heyî ji xwe re weke dane digire. Tu qebûl bikî, bikevî têkiliya bêrêgez, ev wê ji sedî not mêr jî biqedîne. Min nikarî ji dayika xwe re pênc mîtro caw bikirim, ancax ev qas didim we. Ez dikarim nan û cih bidim. Viya bigirin û binirxînin. Hûn qîma xwe bi viya neynin, dewletên emperyalîst li wê derê ne, hûn dikarin bi dilê xwe bedena xwe bidin xebitandin. Êdî hûn dizanin.

Heger du rêheval bı rastî gıhıştıbın nepenıya rêhevaltıyê û yekîtıya xwe avakırıbın, pêwîste ev weke nûnerıya xurt ya heqîqetê vere fêhmkırın. Bı rêhevalan re bûyîna rêheval, jı heqîqeta ku nûnerıya wê tê kırın para xwe gırtıne

**2000**

**23'yê Sibata 2000'an**

Min wan rojan di rojnameyan de dît, mijarên zewacê dihatin nîqaşkirin. Min 15 sal berê viya ji rojnamegerên Hurriyetê re jî gotibû. Ez bi azadiyê re zewicandî me. Zewaca min a bi wî rengî hê jî berdewam dike. Ez li dijî saziya zewacê nîn im. Awayê heyî jî xeter dibînim. Lê ez naxwazim zorê jî bidimê. Ji bo min azadî gelek girîng e.

Dîlgirtina min gunehê herî mezin e. Li vê derê dîrokeke qirêj a 4 hezar salî tê paqijkirin. Ji bo kûrahiyê tenêtiyeke kûr û dinyayeke hundurîn divê. Pêwîst bike divê 10, 20 sal xwe bidin tenêhayiyê û xwe azad bikin. Divê kesayetên xwe biafirînin û xwe bigihînin. Wekî din xelasiya ji koletiyê nabe.

**8'ê Adara 2000'an**

Ez bawer im xwe birêxistin dikin. Min berê gotibû Weqfa Jina Azad. "Wê jin serkeftina demokrasiyê bîne" Dibe ku ev bibe diruşm. Xebatên aştiyê ji şer girîngtir in. Silavên min li dayikên aştiyê, dayikên şehîdan bikin. Bila bi hemû hêza xwe tevlî xebatên aştiyê bibin. Ji bo rojê ez dikarim viya ji wan re bibêjim.

**Ji bo Jina 8'ê Adara 2000'an**

*Ji bo bi te re bijîm*
*Di navbera me de, ji Adem û Hewa ve*
*Diriyên hatine çandin bên rakirin*
*Dîwarên hatine bilindkirin bên rakirin*
*Ji bo vê;*
*Çîna destpêkê, serwerê destpêkê*
*Mêraniya derewkar were têkbirin*
*Û agirê ku şaristaniyê diziye bê girtin*
*Ji bo vê;*
*Min şerekî berdêlî hemû Pometheûsan girt ber çav*
*Dinyayê li hember xwe dît*
*Û li welatê Promethe bi xayînî hatim dîlxistin*
*Ey dayika pîroz,*
*Û jina sewdayê*

**29'ê Adara 2000'an**

Ez ji jinan re jî vê dibêjim; hûn dikarin viya weke peyamekê amade bikin û ji girtîgehan, Ewrûpa û hemû jinan re ragihînin. Mîna spasdariyek ji bo yên heta niha nivîsîne re hûn dikarin bişînin. Jin bikaribe hêza meşa serbixwe nîşan bide baş e. Ez ji jina kole nefret dikim. Wê ew bixwe azadiyê diyar bikin. Sînorê ew bixwe diyar bikin, lê azadî hêz e, bi rîsk e. Azadî li gor min ji her tiştî

birûmet-tir e. Ez dibêjim ez dildarê azadiyê me. Di têkoşîna jinê de, ez bi berdewamî kûr dibim û ji vê têkoşînê hez dikim.

**19'ê Nîsana 2000'an**

Ji bo rêxistina jinê ez dikarim vana bibêjim. Divê pêngavên azadiyê bên bipêşxistin. Ez dikarim vekim. Derbarê vêya de lêhûrbûna min heye. Di asta kesayeta rast de li gor min wê guherînên bingehîn jiyan bikin. Bila netirsin, wê pêvajoya wêjeyê bi pêş bikeve. Ez daxwaz, hêvî dikim ku perwerde, veguherîn û pêşketinên xwe yên ruhî, fizîkî û îdeolojîk berdewam bikin. Ez silav û hurmetên xwe ji jinan re pêşkêş dikim.

Bi mebesta Roja Dayikan bi hurmet silav dikim. Ger pêwîst bike dive 10, 20 sal vekişin silûsê (tenêtiyê) xwe azad bikin. Divê kesayetên xwe ava bikin û xwe bigihînin. Ji bilî vê xelasî ji koletiyê tune ye. Ger hewldaneke mezin bidin wê serkeftin mezin be. Li ser van esasan ez hurmetên xwe pêşkêş dikim.

**26'ê Nîsana 2000'an**

Mirov pirsgirêka jinê bi nirxandinên kin bigire dest a rast wê şaş be. Dem bi sînor e, lê dîsa jî em peyameke kin bidin. Rêxistinkirina jinê yek ji hêviyên min ên herî mezin e. Di rastiya dîrok û civaka vê erdnîgariyê de ya rast desptêkê bi qasî xwedawendekê li pêş bûye. Di roja me de jî anîne rewşeke wisa ku ji xistina gorê xerabtir e. Ev, ji bo min her tim bûye pirsgirêkeke esasîn. Ji bo vê ez ketim têkoşîneke mezin a azadiyê. Li ser van esasan bi jinê re hevdîtin pêk hatiye. Bi qasî hestiyarbûnê yekîtiya îradî hatiye bidestxistin.

Ez baweriya xwe ya di fikir û hest de berdewamiya kûrkirina pêşketina fizîkî diparêzim. Ev, ji her tiştî binirxtir e. Rêxistina wan a nû, mîna Akademiya Azadiya Jinê dibînim. Yên bikevin navê weke xwendevanên pola amadehiyê pênase dikim. Û ez hêvî dikim ku ji bo polê derbas bikin hewldaneke mezin nîşan bidin. Bi hewldanên xwe yên herî esîl wê di hîmê têkoşîna demokrasiyê de cî bigirin û wê xebata mezin serkeftinê diyar bike. Hewldanên keçên me û

dayikên me wê di serkeftinê de roleke misoger bilîze. Ez keç û dayikan bi hezkirin û hurmet silav dikim. Helbesta ku min berê dabû ya rastî denklemek bû. Divê hemû jin û dayîk wê denklemê ji hev derxin.

**17'ê Gulana 2000'an**

PJKK hêzek e kesayet bi dest xistiye? Ev gav hinek nûbûnan di nav xwe de dihewîne? Ji aliyê kesayetan ve ez dibêm girîng e. Ez jî li vir li ser kûr dibim. Ji aliyê jinê ve jî lêhûrbûnekê dikim. Ji bilî yên ku min bi pêş xistin, herhal divê ev lêhûrbûn bê kûrkirin. Kongre gavekî pêşketineke bi tendirustî û demokratîk e? Li gor min ji nakokiyeke siyasî ya teng, heta ji nakokiya çînî jî girîngtir e. Nakokiya herî bingehîn a mirovahiyê ye. Ji bo demokrasî û civak baş bi pêş bikeve; ji bo aştiya esas hîn bi tendirustî bi pêş bikeve heta bibêjî girîng e.

Li ser vê nakokiyê, divê projeya çareseriyê bê pêşxistin. Divê bi tendirustî bi pêş bikeve. Heta niha ku bi başî nehatibe serxistin ji feraseta femînîst an jî ji teqlîtkirina mêr a çors bingeha xwe digire. Fedakarî divê, xebat divê, pêwîst e parastina mêr neyê qebûlkirin. Divê hûn serbixwe û bi prensîb nêz bibin. Ji bilî tiştên bi serweriya mêr pêşketina ruhî û fizîkî pêwîst e. Ji bo jinê tiştê herî bingehîn e. Ji bo zewacê tê gotin koletiya herî kûr, giran e. Jin ji viya rizgar bibe girîng e. Dibe ku bi vî awayî têkiliyên malbatê yên klasîk winda bikin.

Kongre gavekî girîng û bixêr e. Pêwîst e bi xurtbûnê bi encam bibe. Berê hin nirxandinên min çêbûbûn. Wê ji bo kongreyê peyamekê min hebe. Ji bo huner û wêjeyê jî wê pêşerojê nirxandineke min çêbibe.

**31'ê Gulana 2000'an**

Ez alîgirê berdewamkirina radîkaltiyê me. Hin lêhûrbûnên min hene. Bila gelek li xwe baldar bin. Lê ez viya bibêjim; Ji bo min afirandina jina azad, ji welatekî û ji serxwebûnê hîn girîngtir e.

**7'ê Hezîrana 2000'an**

Navê partiyê, navê yekîtiyê, kîjan guncaw dibe ew dizane, bila ew bixwe biryar bigirin. Ya girîng; rexneya jinê ya sosyalîzma reel, rexneya jina di pergala kapîtalîst de baş bê danîn. Divê li ser dîroka koletiya jinê, pêşketina civaka bi serweriya jinê bisekinin. Dîrokeke kin û pêşketina wî divê were lêkolînkirin. Heman tişt ji bo tevgera jinê jî dibe. Divê dîroka tevgera jinê jî were lêkolînkirin. Têkiliya viya bi rastiyên civakî re were lêkolînkirin. Di rastiya me ya civakî de cihê jinê çi ye? Nêzikahiya jinê divê hîn bi kûrahî be. Rastiya jinê ya objektîf divê bînin ziman. Tevgereke jinê çima heye? Tevgereke cinsiyetê nîn e. Lê pêkutiya xwe dispêre cins, çînîbûn, cudahîxwazî çawa û çima bi pêş dikeve? Ev, divê objektîf werin lêkolînkirin.

Ev pirsgirêk ne tenê pirsgirêka jin, di heman demê de pirsgirêka mêr e jî. Peyre jî bernameyeke azadiya jinekê an jî rizgariya jinê divê bê derxistin. Dikarin weke "Pirsgirêka jinê ya azadiyê divê çawa bê çareserkirin" were binavkirin. Ez azadiya jinê gelekî girîng dibînim. Di vê mijarê de ez weke berê nafikirim. Ev bername û şêwazê tevgerê girîng e. Tevgereke pêwîst e li dijî biçûkdîtin û mêtingehkirina jinê bê pêşxistin. Pirsgirêka tevgera demokratîk e. Bi sekna viya ya di nav tevgera (hiqûqa) demokratîk de girêdayî ye. Di dema pêş de bernameya rizgariya jinê, şêwazê rêxistinkirin û tevgerê girîng e. Ev jî awayê tevgera demokratîk e. Tevgera jinê ya demokratîk awayê aştiyê ye. Zarok ji hinava wê derdikevin. Bila xwedî li zarok, kal û pîr û bêkesên di rewşa zehmet de ne derkevin. Pêwîst e tevgera jinê ya komara demokratîk bê afirandin. Civaka demokratîk, destûra bingehîn a demokratîk, ji bo demokrasiyê azadî, rêxistinbûn û çalakî girîng e. Bi van çalakiyên xwe, wê bibêjin ewlehiya tevgera azadiyê em in.

Heta ku dikarin divê ji derdora tundiyê dûr bikevin. Divê çalakiyên întîxarî, xwekuştinî nebin. Bi êş e, me pir êş kişand. Ez ev cure çalakiyan êdî hem exlaqî û hem ji aliyê siyasî ve rast nabînim.

Li şûna viya divê çalakiyên mafgerîna demokratîk bên pêşxistin. Ji bo tevgera demokratîk bi pêş bikeve û mayînde bibe pêwîst e xwe bi awayekî demokratîk û legal bi pêş bixin û bigihînin. Di mijarên ziman, çand, huner û demokrasiyê de divê xwe di asteke pir bilind de perwerde bikin. Ev hemû divê ji bo ji pirsa "Em bi mêran re têkiliyeke çawa, dinyayeke çawa, civakeke çawa, derdoreke çawa, aboriyeke çawa, avahiya malbateke çawa, jineke çawa dixwazin" bên kirin.

**30'yê Tebaxa 2000'an**

Şoreşa di serdema Neolîtîkê de li wê herêmê hat jiyankirin, destpêkê li ser wan axan bi xebatên jinê gihîşt serkeftinê. Têkiliya şoreşa ku wê çaxê bi pêş ket bi feraseta azadiya jinê ya kûr re heye. Jin şoreşa xwe ya azadiyê divê bi hêza xwe ya azad û îradeya xwe heta dawiyê bi pêş bixe. Ji bo rizgariya jinê ya li ser bingeha azadiyê, ew ax wateya dîrokî îfade dikin. Ji bo derbaskirina kolekirina jinê û civaka çînî ya ji Sumeran heta niha dest pê kiriye, bi qasî vê, aştî û demokrasiya ku hesreta hezar salan a gelan e pêk bînin erka herî pîroz e. Ji bo vê hêzên şoreşger ên herêmê pêwîst e di vê qadê de rol bigirin, li Mezopotamyayê azadiya jinê tam bi dest bixin û tam bigihîjin demokrasiyê. Li Başûrê Kurdistanê serkeftina demokrasiyê, wê li Iraq û Rojhilata Navîn bibe serkeftina demokrasiyê. Li ser van esasan, ez bang li hemû hêzên şoreşger û dostên gelê kurd dikim ku ji bo serkeftina şoreş, demokrasî û aştiyê bimeşînin.

Jin, pirtûkên min pêşniyar kirine xwendibûne. Ji dema Neolîtîkê ve kesayetên jin ên girîng ên her demê hene. Dema min got bila Safiye Sultan bixwînin; ji bo xwezilahiya xwe pê bînin min negot. Pêwîst e jiyanên jinan ên xweser di her çaxî de bixwînin; dema min got bila bixwînin ji bo vê min got. Şoreşa Neolîtîkê şoreşeke Kurdistanê ye, şoreşeke Mezopotamyayê, şoreşeke jinê ye. Dîroka piştre girîng e, bila pir baş binirxînin.

**6’ê Êlûna 2000’anJi Bo Rêhevalên Jin**

Bi hezkirin û hurmet ez kongreya we pîroz dikim. Mijara jinê ji rastiya çîn û neteweyê girîngtir e.  Hem ji aliyê dîrokî hem jî ji aliyê civakî ve berfireh e. Ji polîtîkavaniya li ser navê çînîbûn û netewbûnê tê kirin hîn girîngtir e. Ji bo vê, divê ew rastiya ku jin di vê mijarê de çîna di herî bin de û bi tevahî li derveyî civakê hatiye hiştin e bê dîtin û ev dîrok rast were dahûrandin. Heta roja me, divê rastiya dîrok û civakî ya jinê derxînin holê. Ji bo vê lêkolîn û perwerdeya bi kûrahî pêwîst e. Ger xwe weke rêxistin dibînin, divê mîna bername deynin ber xwe. Di vê mijarê de hêvî dikim hin pêşketin hatine bidestxistin.

Desthilatdariya mêr a ji civaka çînîdar a ku piştî civaka Neolîtîk bi pêş ket heta niha; diyardeyên desthilatdarbûn, çînîdarbûn, leşkerbûn û olbûn a bi xwespartina mêr bi berdewamî bi pêş dikeve, di nav van hemûyan de pêkutî û dagirkerî veşariye û hatiye rewşeke wehşî ya şaristaniyê. Di vê derê de para desthilatdariya cins mezin e. Di vê wateyê de sedsala 20. bûye sedsaleke ku herî bi wehşet derbas bûye.

Ez ê zêde nekevim dîrokê, lê sedsala 19. çawa bûbe sedsala partiyên bûrjûwa, sedsala 20. çawa bûbe partiyên xwe spartine kedê, wê sedsala 21. jî bibe sedsala partîbûna xwe spartiye jinê. Çawa jin bikeve pêvajoya polîtîkaya li gor xwe, divê di mijarên mafên mirovan, mafên civak û çandî, ji pirsgirêkên xweza û derdorê re hestiyarî, mafên zarokan, tendirustî û perwerdê de vebûnên bi kûrahî bên hêvîkirin.

Partiya jinê, divê di her astê de xeta parastina rewa esas bigire, di fikir û hestên xwe de bi hebûna xwe ya fizîkî û bedenî di mijara jiyana xwe de, ne hêza leşkerî, bêdawîbûna xwe esas bigire û xeteke rast a parastina rewa jiyanî bike. Jin, weke hêzeke ku herî zêde aştî û demokrasiyê bîne rojevê divê xwe bi pêş ve bibe. Di qada çand û hunerê de jin, pêwîst e bibe hêzeke herî bi îdîa. Ez

bawer dikim ku di van mijaran de hûn xwedî ferasetek û polîtîkbûnê ne.

Ez dizanim ku ev mijar hemû we bi zehmetiyan re rû bi rû dihêlin. Ji bo hûn viya derbas bikin, veguherînên berfireh ên kesayetê, rêxistinbûneke xurt, hewldanên lêkolîn û lêhûrbûnên kûr pêwîst dike. Dema ez li derve bûm, hemû nêzikahiyên ji bo we perwerdeyî bûn. Bi hemû hêza xwe ez wiha xebitîm. Bi qasî ku tu kesî newêrîbû min xwest desthilatdarbûna mêr hilweşînim, xera bikim. Dem bi dem min xwest ji Îmraliyê jî bi nameyên kin bang li we bikim. Bêguman min dixwest hîn berfirehtir û bi kûrahî bigihêm we.

Ez bawer dikim ku ev gava hûn davêjin gaveke dîrokî ye, ez nafikirim ku ev tenê gavekî cins e. Şoreşa Neolîtîk, ew erdnîgariya ku afirîneriya dîroka jinê lê pêk hat –ku ji vê derê re Xeleka Bi Bereket, navbera Toros û Zagrosan, “xeleka zêrîn” tê gotin- dergûşa şoreşa jinê ye. Şoreşa jinê girêdayî afirandina şaristaniya Sumer û Misrê û çanda xwedawend e ku jinê di şoreşa Neolîtîk de afirandiye. Ev erdnîgarî cî û warê Xwedawend Îsîs û Îştar e. Ya rast jin li vê derê xwedî dîrokeke bi heybet e. Piştî civaka çînî ya bi dewleta bajar a Sumer dest pê kir, jinê ev şansê xwe heta roja me winda kir. Hûn dikarin vî şansî ji nû ve bi dest bixin. Ez wisa difikirim ku gava hûn davêjin, li herêma ku hûn lê dijîn tê wateya di maneya nûjen de jinûve pêkhatina şoreşa Neolîtîkê. Ne tenê weke jinên kurd, bi jinên tirk, fars, ereb û ewrûpî re, hûn dikarin vê şoreşê li hemû dinyayê belav bikin. Viya jî hûn dikarin bi Weqfa Jina Azad pêk bînin. Ev, ne olek e, çandek, fikrek e. Ez bawer dikim ku hûn ê ji artêşbûnê dest pê bikin û pêl bi pêl belav bibin. Li gor çand û qanûnên welatên cuda divê hûn rêxistinbûneke guncaw ava bikin.

Di nav PKK’ê de divê hûn li yekîtiyê baldar bin. Li desthilatdariya mêr jî baldar bin û xwe baş biparêzin. Erka we; hîn zêdetir bijîn û

bidin jiyankirin e. Li ser esasên hûn xwe mezin bikin, li refan ez bawer im hûn ê bibin dengê herî xurt ê yekîtî, azadî û wêrekiyê.

Min hewl da di şexsê xwe de mêrê klasîk bikujim. Ji bo serkeftina şoreşa we, ez hêvî û daxwaz dikim ku hûn her tiştê xwe deynin holê û azad bibin.

***Bi Silav û Hezkirin***

**20'ê Êlûna 2000'an**

Ez dixwazim derbarê jinê de jî peyamek bidim. Wiha dibe;

**Ji Rêheval û Dostên min ên Partiya Azadiyê re!**

Di mijara jinê de her ku diçe lêhûrbûnên min çêdibin. Ez li ser vê mijarê pir disekinim. Li gor min, hatiye îspatkirin ku encamên ez gihîştimê bingehên xwe yên dîrokî hene. Şerê jinê, ya rast pirsgirêkeke dîrokî ye. Şoreşa Neolîtîkê, şoreşeke jinê ye; li ser vê erdnîgariyê pêk hatiye û li cihê ku Firat, Dîcle û Zap jê dizê bi pêş ketiye. Ji van deran dest pê dike û heta Çatalhoyukê diçe. Çandinî û sewalkariya destpêkê jin bi pêş dixe. Weke mînak bi du leoparan bi tena serê xwe, xwe diparêze. Di erdkolanên li wan deran tên kirin de her tim pêykerên jinê dertên, ji ber ku li wê derê jin serwer e. Civakeke bi serweriya jinê hebû.

Lê piştre jin, gav bi gav serweriya xwe winda kir. Bi derketina Sumeran re çawa saziyên weke ol, siyaset û rahibî yên joravahî yên dewletê jî ava bûn, jin gav bi gav ji serweriya xwe dûr ketiye. Lê wan deman jî xwedawendên jin ên weke Îştar hebûn. Heta B.Z. salên 2.500'î jî serwer in. Bi derketina Babîl re, jin misoger ji rêza yekemînî ya di desthilatiyê de dûr dikeve. Bi bin dikeve; desthilatiya hem cins hem jî çînî tê avakirin. Babîl dewletek e ku di vê çarçoveyê de pêş dikeve. Efsaneya Babîl baş bixwînin. Piştre

Yehûda, Îranî viya digirin û ji bo xwe pêk tînin. Grekî, Hindî digirin ji bo xwe pêk tînin. Jin gav bi gav winda dike. Her tiştê ku berê aydî jinê bû êdî ji nav tê birin, ji holê tê rakirin.

Mesela di Quranê de jî tê gotin ku “Ji parsûya mêr hatiye afirandin”. Tam berevajîkirinek e, berevajîkirineke mêr e. Çandînî, cotkarî û hwd. jinê daye destpêkirin. Weke mînak li ba me teşî û hwd. hene. Ev hemû vedîtinên jinê ne. Jinê da destpêkirin, lê di encam de hatin jibîrkirin û çûn. Lê mêr hem bûye dewlet hem jî çanda xwe serwer kiriye. Pêkutiya çînî û pêkutiya cinsî di nav hev de pêş dikeve. Dikarin bi berfirehî viya lêkolîn bikin. Mêranî, cinsê serwer, çîna serwer û dewleta serwer ava kiriye. Di vê mijarê de min mêr dahûrand. Di şexsê xwe de dahûrand. Bi dahûrandinê re jî nemam, min berê jî gotibû, min ev mêr kuşt. Dahûrandina mêr, kuştina mêr ku ev mêrê serwer e; dikarin bi berfirehî viya vebikin. Rêheval û dostên min ên jin dikarin lêhûrbûna xwe li ser mîtolojî, dîroka jinê bikin.

Ez ji hevalên mêr re jî viya dibêjim: Partiya Jina Azad îfadeyeke vê şoreşê ye. Pêwîst e ji viya re hurmetkar bin. Nêzikatiya li ser esasên cinseltiyeke teng ne rast e. Divê hurmetkar bin, nêzikahiyeke dostanî û rêhevalî serwer be. Divê biryardariya veguherandina xwe biparêzin. Gava partîbûyînê dîrokî ye; meşa mezin e ji jina hatiye mehkûmkirin ber bi jina azad ve. Gihandina jina azad rûmet e. Şaş nêzikbûna viya bêrûmetî ye. Gava li ser navê partiyê hatiye avêtin, gava bidestxistina rûmetê ye. Di dinyayê de yekemîn e. Bi vê hişmendiyê divê mirov deyne holê. Erkeke pir dîrokî ye. Min bixwe jî hewl da alîkar bibim. Di vê mijarê de dikarin heta dawî şexsiyeta min binirxînin.

Ez bawer dikim ku hewldana herî diyarker û mezin a ku civakê bibe demokrasî û wehkeviyê bi hêza xwe ya cewherî dikarin bidin. Wê bi ser bikevin. Li ser van esasan ez hezkirin û silavên xwe pêşkêş dikim.

Hûn dikarin viya mîna peyamekê çêbikin û ji hemû avahiya jin a girtîgehê re bişînin.

**3'yê Cotmeha 2000'an**

Min derbarê jinan nameyek nivîsandibû, ev dibe nameya duyem an sêyem? Ya rastî girîng bû. Dema dewletbûn dest pê kiriye, kralên Sumer û Misrî yên destpêkê jinan bi tomerî binax dikirin. Xwedawend jî têde bi tevahî jinan dikirin goran. Tevî xwedawendan jinan bi saxî binax kirin. Destpêka koletiya jinê di wê derê de ye. Pêncsed jin dişînin mirinê. Her çiqas bibêjin bi kralan re ji bo dinyaya din amadehî ye jî, di naverokê de bingeha cins û çîn heye. Zordarî û derewa mêr heye. Windakirina jinê heye.

Çaxê Neolîtîkê li Toros û Zagrosan dest pê dike. Çanda jinê û çanda gel li wan deran dest pê dike. Piştî avabûna dewletên mîna Sumer û Babîl, tevî azadiya jinan, çandên gelan jî hatiye çewisandin, di bin de maye. Çanda gel jî bi pêkutiya xebitandina dewletê re, nasnameya jinê û hwd di bin de maye, nikaribûye azad xwe heyî bike. Azadî û têkoşîna jinan wê bike ku çanda gel jî derkeve holê. Bi qasî mêr jinê dikuje min kuştina mêr jî vegotibû. Ev, têkoşîneke zehmet e. Dibe ku bi tenê bimînin. Bila ji tenêmayînê netirsin. Li dû hezkirinên erzan nerevin. Ez ê bibêjim hinek Bûdatî, lê tam jî ne wisa; ya herî xweş ew e ku miriyê nasname û fazîleta xwe bin.

**11'ê Cotmeha 2000'an**

Li Tirkiyeyê di demên dawî de ez dibêm qey di rêxistinbûna jinê de liv û tevgerek heye. Di vê de bandora helwesta min heye. Wê pêş de hîn baştir bê fêmkirin. Pirsgirêka jinê pirsgirêka herî girîng a demokratîkbûnê ye. Heta jin demokrat nebe civak demokrat nabe. Nan, av, rûmet, jiyan bi viya re girêdayî ye. Gelek êşên di vê mijarê de tên kişandin hene. Gelek komeleyên ji aliyê jinên kurd ve hatine avakirin hene. Her roj yeka nû tê avakirin. Divê di van deran de perwerde bê dayîn. Li Tirkiyeyê derfetên perwerdeyê gelek in. Xwe

perwerde bikin. Pêwîstiya her kesî bi perwerdeya demokratîk heye.

Divê rêxistineke we ya banî hebe. Dikarin ev gelek komeleyan di bin banekî de bigihînin hev. Demokratbûna jinê, di heman demê de partiyê jî demokrat dike. Navendên herêmî çêbikin. Bila cihên we yên serbixwe hebin. Jin li hember zordariyê ye. Pêwîstiya herêmê bi dijwarî bi viya heye. Di vê çarçoveyê de nirxandina kin li hev bînin û pêşkêş bikin. Enerjiya xwe bidin xebata rast, perwerde û rêxistineke hûr û kûr bikin, wê ev her aliyî pêş bixe. Feraseteke kûr pêwîst dike. Diyardeyeke civakî ye. Hê nû nû tê fêmkirin. Her ku biçe wê derkeve pêş. Pir ked dan.

Ji Dayikên Aştiyê yên hatine girtin re silavên min bibêjin. Ji bo dayikên şehîdan jî silavên min bibêjin. Li hemûyan xwedî derkevin. Bi gelek derdor re, bi avahiyên jinan re platformên hevpar ava bikin.

Dı ehleqa azadıyê de berıya her tıştî hêz bûyîn û beramberî hev vîyanên azad heye. Ehlaqê azadıyê şêweya têkılıyên gırêdayına koletîyê napejırîne

**2001**

**3'yê Çileya 2001'an**

Serxwebûna xwe diparêzin? Pêwîst e giraniyê bidin çalakiyên demokratîk. Bila perwerdeya xwe pêş bixin. Li her aliyî li cihên tevahî bila pergalên dibistanê pêş bixin, di viya de bi israr bin. Têkildarî jinê di asteke pêş de tevkarî dixwaze. Bila akademî ava bikin. Rizgariya xwe, feraseta xwe ya huner û jiyana cewherî di akademiyên ava dikin de pêwîst e pêş bixin. Bi rengekî divê perwerdeya xwe ew bixwe bikin. Di dibistan û akademiyên ku wê

ava bikin de divê perwerdeyên xwe yên îdeolojîk, ew bixwe bikin. Min dixwest di vê mijarê de pirtûkek binivîsim. Qada ku herî zêde li ser disekinim ev e. Bi çavkaniyên bi sînor, ez di vê mijarê de gihîştim tespîtên girîng. Di vê asta ku ez gihîştimê de fikir min têr kirin.

Divê xwe, peymana civakî ya jinê, di rengê Manîfestoya Azadiyê ya Jinê ya sedsala 21. de ava bikin. Çawa ku Peymana Civakî ya J.J. Rousseau hebe, ya jinê jî pêwîst e pirtûkeke bi awayê “Peymana Civakî ya Azad” an jî “Peymana Civakî ya Jinê” çêbikin. Ev mijar ne tenê ji bo jinên kurd û tirk, ji bo hemû jinên dinyayê ye. Peymana Civaka Azad a jinê divê berhema xebateke berfireh be. Ev, xwedî cewhereke gerdûnî û navneteweyî ye. Tevgera jinê divê bi tevgera hawirdorê re bibe yek, bigihên hev. Peymana Zarok û Hawirdorê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hat weşandin. Tevgera jinê divê bi vana re bibe yek.

Bi taybetî ji civaka Neolîtîkê ve jinê tevn, çandinî, nebat û gundbûnê pêş xistiye. Bi pêşketina şaristaniya civaka çînîdar ev, ji destê jinê hatine girtin. Di feraseta dewleta rahib de, di bin navê desthilatiya xweda de, li ser jinê serweriya zirav a rahib kral hatiye avakirin. Xweda kralekî sed jinî digire xizmeta xwe. Dema dimire di bin navê ez bi saxî dibim bihuştê de vana binax dike. Jinan wiha digire bin serweriyeke mezin.

Bila bizanibin ku çanda Îştar û Înanna çi ye. Divê viya lêkolîn bikin. Hûn dizanin, Îştar xwedawendekê bû. Li Misrê jî heye. Bi sedan jin dikin bin axê. Bi vî rengî jinê dikin bin desthilatdariyê. Li Babîlê jî dema Mardûk serwer dibe wiha kiriye. Bi koka xwe Samî ye. Hûn dizanin, Babîl Samî ne, jinê ji dîrokê rakirine. Piştre tu jin nabe xwedawend. Fersenda min hebûya min ê binivîsanda.

Di Tewratê de tunekirina jinê heye. Jixwe Babîl derbe lêdixe. Cihê jinê tune dike. Îsa dixwaze hinek jinê tevlî bike. Li gel Yewnanan ev çand hinek tevlihev e. Di Afrodît de hinek temsîla

jinê heye. Lê Zeûs li ser jinê tam pergala desthilatdariyê ava dike. Dikarin pirtûka Ezra Arhat a Ferhenga Mîtolojiyê (Mîtolojî Sozlugu) bixwînin. Îlyada û Homeros jî dikarin bixwînin. Di çavkaniyan de heye; sedsala 20. ,koletiya ji kapîtalîzmê derketiye, ew bixwe dikarin lêkolîn bikin. Peymana Civaka Azad dikarin çêbikin. Pênc, deh sal dikarin wiha bijîn. Tiştek nabe. Di vê demê de wê xebatên xwe yên îdeolojîk, polîtîk bimeşînin. Heta ku peymana civaka azad biqefêlin wê ev berdewam bike.

Pirtûka bi 4 cildî ya mîtolojiyê ya ku min xwendî, Gordon Child dikarin bixwînin. Salên 2000'an wê bibe salên azadbûna jinê. Ya ku ji zaroktiya xwe ve lê digeriyam, ez dikarim bibêjim min di Çaxa Neolîtîkê de dît. Hem jin hem jî gel di Çaxa Neolîtîkê de hasê mane. Piştî wî çaxî ne tenê pêşketina jinê, pêşketina gelan jî zêde pêş neketiye. Ger ez binivîsim ez ê li ser vî bingehî hin tiştan binivîsim. Ew strana ez jê hez dikim, li gel Sumeran kevneşopiyeke wê ya 4 hezar salî heye. Ez kêfxweş im min çavkaniya viya dît.

**24'ê Çileya 2001'an**

Ez weke Tezên Li ser Pirsgirêka Jinê difikirim. Di vê çarçoveyê de ji civaka Neolîtîkê heta roja me xebateke min a berfireh heye. Di şûna ku jina kurd biçûk û bêqîmet bibînim, min di serî de dayik, mezinkirina hemû jinên bê şans esas girt. Min girîngî da nêzikahiya zanistî. Tezên azadiya jinê heta bigihînin peymana civakî têkoşîn pêwîst e. Ez hewl didim ji bo vê perspektîfeke zanistî û siyasî bînim. Jin, di mîtolojiyê de hatiye binaxkirin; jixwe piştre jî di siyasetê de cihê wê tune ye. Dîroka Neolîtîkê li Zagrosan, ji çiyayên Kurdistanê derket. Ya rastî ev axên ku li serê Neolîtîk derket şoreşa çandinî, gund û jinê ye. Ev ax hê jî ji vê şoreşê xwedî dibin. Windakirina jinê, windakirina azadî, wekhevî û civaka sosyalîzmê ye. Pêşketina dagirkerî û newekheviyê ye.

Piştre xwedayên Yewnan derdikevin holê. Kulta pêxember a Rojhilata Navîn jî li ser viya zêde dibe. Rewşeke wisa çêdibe weke

ku jin tune ye. Di roja me de divê mirov veguherîne peymaneke civakîyanû. Pirsgirêkeke zindî ye. Ez dem bi dem pirsa "Divê Çawa Bê Jiyankirin" tînim rojevê... Têkoşîna jinê di çareseriya pirsgirêkên çînî û neteweyî de roleke bingehîn dileyîze. Ez wisa bi aborî, teng li pirsgirêka jinê nanihêrim. Bi erzanî hestê nagirim dest. Zêdetir exlaqî û felsefîk nêz dibim. Ne bi darizînên olî, ne jî bi çanda roja me –wa dibêjin çanda televole- nêz dibim. Ne wiha, felsefîk digirim dest. Ger derfet hebe ez ê hewl bidim viya derxînim holê. Ez exlaqa kevneşopî ya rojane cidî nagirim. Napejirînim. Li gor min têgihîştineke, feraseteke min heye. Ger derfet hebin ez dixwazim di pirtûka xwe de viya mîna tezan pêşkêş bikim. Dikarin pirtûkên ku min pêşniyar kiriye bixwînin.

**28'ê Sibata 2001'an**

Ger ez bigihînim hev ez ê hefteya bê têkildarî 8'ê adarê bi helbestekê bersiv bidim. Dibe ku weke "Giriyê ji Xwedawend Stêrk re" be. Ev xwedawenda ku ji xeleka zêrîn a bi bereket a Toros û Zagrosan derketiye diçe Mezopotamyayê, ji wê Misrê, ji wê derê Anatolya, ji wê derê Atîna û Roma, ji wê derê jî heta Çînê diçe. Ez dixwazim bi awayê girî, zêmar binivîsim. Tiştekî weke silavkirin. Ev, xebateke dîrokî ye. Kûrbûna xebata min a kevneşopî ye. Silavên min bixwe bibêjin. Bi rengê helbestê hûn ê dîsa ragihînin. Ez dikarim li ser 8'ê adarê û 21'ê adarê helbest binivîsim. Nêrîna di Mîlliyetê de derket hebû, girîng e: min digot "Kevokên min". Min di pirtûka Kuştina Mêr de vana vekiribû.

**14'ê Adara 2001'an**

Ji bo 8'ê adarê ev vê peyamê didim:

**Ji bo lêgerînerên Rastî, Dad, Edalet û Hezkirinê,**

Li ser esasên pêşketinên ji silava 8'ê adara 2000'an û vir ve derketine holê, liv û tevgera hatiye jiyankirin û bersiva ji nameyên ku we şandiye re ev e; Ez daxwaz dikim ku hûn kûr bibin. Her yek ji we dikare xwe bike dergahek, çavkaniyek.

Dema dîroka jinê hat lêkolînkirin, divê li van her sê deman bê veqetîn:

**Dema yekemîn**; Çaxê Seretayî yê Komunal e; em dikarin ji viya re bibêjin çaxê jinê jî. Bi mîtolojîkî çaxê xwedawendan e. Ji vê demê re ku rastî 10000, 4000 sal B.Z. tê Çaxa Neolîtîk jî tê gotin. Çaxeke ku jin têde serwer e. Li derdora jinê pêş dikeve; demeke têde çandinî hatiye pêşxistin, heywan hatine kedîkirin û demeke nêzî cewherê mirov e îfade dike.

**Dema duyemîn**; di navbera salên 4000 û 2000'an B.Z. de ye. Ev dema ku ketine qirika hev, dema derbasbûna malbata bavkanî ye. Di mîtolojiyê de di sîmgeyên Xwedawend Înanna û Xweda Enkî de, di mîtolojiya Sumer de îfadeya xwe dibîne. Ji bo hûn vê demê bi kûrahî dahûrînin, mîtolojî û avahiya Dewleta Sumer baş lêkolîn bikin. Kolebûna jinê di bin fetisandineke mezin de pêk hat. Divê hûn Xwedayê xasûk Enkî û Destana Afirandinê ya Babîl, mîtolojiyên din, mîtolojiyên Hind û Ewrûpa jî li ser vê bingehê fêm bikin.

**Dema sêyemîn**; merhaleya dawîn e. Ji salên 2000'an B.Z. dest pê dike û heta roja me tê. Demeke bi 4000 salî ye ku hêza zordar a mêr li hemû qadên aborî, çandî û siyasî ku li derdora desthilatiya mêr pêş dikevin, ew afirandiye. Ev dagirkeriya mezin, jêr û joravahiyên civakî li gor xwe sererast kiriye. Ji serweriya Babîl dest pê dike, bi Asûr xurt dibe û heta roja me tê. Ji bo ku mirov vê demê bi kûrahî dahûrînê, divê mirov ji salên 2000'an B.Z., ji Babîl û Asûr bigire û heta roja me pêşketina wî lêkolîn bike. Hûn dikarin sê olên yekxwedayî û 4 pirtûkên pîroz û pirtûkên têkildarî vana ne lêkolîn bikin. Têgîna Xweda çawa derketiye holê û têgîna Xwedawend çawa ji holê rabûye, teolojiya Yewnan, mîtolojiya Hind, Kîtab-i Muqedes lêkolîn bikin û girêdanê di navbera wan de ava bikin. Ev, pêşketineke bi koka xwe Mezopotamya ye. Xwedawend Îştar, li gel Sumeran mîna Înanna, li Misrê Îsîs û li Yewnan weke Afrodît derdikeve pêşberî me. Li beramberî Xwedawend Îştar mêr Dûmûzî

ye, Tammûz e. Li Misrê Îsîsî û Osîrîs, li ba Yewnanan dibe Afrodît û Adonîs. Hûn dikarin ji vana bigirin, mîtolojiya Ewrûpayê –ku ev mîtolojiyeke takekesî ye- ji mîtolojiyê derbasî ol û pirtûkên zanistî bikin. Kronolojî wiha dibe.

Ez hêvî û daxwaz dikim ku hûn pergalên xwe dispêrin siyaset û dagirkeriyê, pêvajoya kolebûna jinê lêkolîn bikin û kûr bibin, her wekî xwe ji nû ve biafirînin. Ji bo nivîsandinên we yên derbarê tenêbûnê jî ez wiha dibêjim: Divê tenêbûn li çavkaniya hêz û qudretê were veguherandin. Li ser vî esasê 8'ê adarê pîroz dikim.

**11'ê Nîsana 2001'an**

8'ê adarê û Newrozan li jinan pîroz dikim. Xurt tevlî bûbûn. Min bi sê beşan pêşketina dîrokî ya li ser azadî û pêşketina mezin a jiyana azad pêşkêş kiribû. Heta salên 4000'î Xwedawenda dayik, çanda Star, Îştar ya bi navend Sumer û Mezopotamya ku jin bi çanda mêr re têdikoşe, şerê Îştar û Enkî heye. Di navbera çanda çol-ereb û çanda çiya-kurd de şerekî ji 5000 sal berê dest pê dike heye. Asûrî û Babîlî viya qebûl dikin. 3 hezar sal berê Sumerî ji çiya re dibêjin "Kurtî". Di dema Brahîm de ji Ûrfayê re dibêjin "Ûr". Di maneya cihê li bilindahiyan de ye. Dîroka Ûrfayê heta 2000 sal B.Z. diçe. Dîroka şaristaniyê ji vê derê dest pê dike. Derbasî Yewnanan, ji wê derê Roma û derbasî Ewrûpayê dibe. Niha jî Emerîkayê girt. Em weke qalikê ziwa, çanç û telp man.

Jin, li wê derê Îştar, Artemîs, Afrodît, li Qudsê weke Meryem derdikeve pêşiya me. Mîna destanekê berdewam dike û diçe. Weke çemekî; çemekî ku ji qûntarên Zagros û Torosan, ji Firat û Dîcleyê dest pê dike û heta roja me tê. Min dixwest vî çemî binivîsim. Ez dîrokê dixwînim. Min Altindal (guliyê zêrîn) Thespîs û mîtolojiya 4 cild xwend. Yên di asta bilind de dikarin bixwînin. Dikarin pirtûkên pîroz bixwînin.

Îro salvegera koça dawîn a dayika min e. Salvegera rizgariya Ûrfayê ye. Ez ji bo bîranîna dayikan –ne tenê ji bo dayika xwe- vî

peyamî didim: Name watedar in, kûrahiyekê îfade dikin. Îştar-Star-Sterk ji wê derê tê. Zayîna we ya weke Star silav dikim. Ji bo bersiva nameyan wisa dibêjim.

**18'ê Nîsana 2001'an**

Bibêjin "Ji bo we weqfê vekiriye ez we pîroz dikim". Gavekî xweş e. Ev weqf, ne tenê ya kurdan, dive bibe cihê jinên tirk, kurd, Ewrûpa û hemû dinyayê. Pêwîst e mirov vê derê weke Akademiya Azadiyê binirxîne. Name û raporên ku jinan hê berê ji min re nivîsandibûn hebûn. Ez kasetan, diyalogên min kirine, dîsa diyalogên min li vê derê kirine diyariyî wan dikim. Bila weke dibistana azadiyê bi kar bînin. Divê destê mêrê qirêj û destê jina qirêj li vê derê nekeve. Wê temsîla xeta dîroka bi deh hezar salî bikin. Hin zarokên min gelek ji wan hez dikir, zarokên bêkes hebûn. Dîsa zarokên li Tirkiyeyê û Îranê xwe şewitandibûn hebûn. Weke komên bi 40, 50 kesan, bêyî ku weke keçik, kurik ji hev veqetînin bila van zarokan bigirin perwerde bikin. Dibistan, divê ji bo aştî û jiyana nû bibe cihê perwerdeyê, ji bo dayikan bibe cihê perwerdeyê. Weke dibistanekê; dibistaneke zimanê kurdî, dîroka kurd hîn dike. Projeya jiyana azad li vê derê jiyanî bikin. Ez ê nebêjim perestgeha jinê. Çawa ku li kerxane û mala taybet jinê mehf kirin; divê jin li wê derê bi çanda bi heybet a Xwedawendê were vejînkirin û bigihînin asta Xwedawendên jin. Di jiyanê de bibin xwedî hêz û li ser axên xwe bila li ser piyên xwe bisekinin. Bila xwe tenê hîs nekin. Di dîrokê de Xwedawendên Înanna, Îştar wana bila bi kûrahî bixwînin.

**9'ê Gulana 2001'an**

Min ji bo jinê gotibû lêgerînerên rastî û dadê. Nameyên ku we şandine ji aliyê edebî, felsefîk û naverok ve min dewlemend dîtin. Weke bersiva giştî ez wiha dibêjim: Bi Apo re 24 saet jiyankirin, ev, di heman demê de xaçepirsek, tiştanokek e. Yên di nav PKK'ê û li derveyî PKK'ê dost tevlî bibin. Weke nameya pêşbirkê ya bi 300-

400 rûpelî dibe. Ez ê ya/ê di pêşbirkê de bibe yekemîn erê dikim û tevlî dibim. Ev pêşbirka nivîsandina pirtûkê ye. Silav û hurmet.

**16'ê Gulana 2001'an**

Ji bo jinê min berê gotibû: Jin ewlehiya demokrasiyê ye. Min berê gotibû "Lêgerînerên dad, hezkirin û rastiyê". Ez hewl didim li gor hesretên we bijîm. Ez kêfxweş dibim ku îradeya wek felsefî û edebî pêş ketiye. Min gotibû "Bi min re 24 saet jiyankirin". Dikarin veguherînin romaneke edebî, felsefî ya sêsed, çarses rûpelî. Ji bo lêkolîn û lêgerînê dikarin mîtolojî, kulta Xwedawendê û Altindalê bixwînin. Dikarin li ser çanda Dîonîsos, çanda Hinda a Krîşna û Kopî, çanda Balkanan a Orfî, Adonîs, Kîbele, li Mezopotamyayê Înanna, Îştar lêhûrbûnan bikin. Alaya Bakhayan lêkolîn bikin. Ez bi armanca perwerdeya zanistî vana dibêjim.

**30'ê Gulana 2001'an**

Ez ê ji bo jinan viya bibêjim: Min nameyên we yên dawî negirtin. Nameyên ku we şandibû aliyê wan ê felsefî û edebî bilind bû. Ne tenê aliyê hest, aliyê hişmendî, zanînê bilind bû. Ez gelek nirx didim vana. Min berê jî gotibû. Ez dixwazim pêşerojê nameyeke hîn dirêj û balkêş binivîsim. Ji bo niha ez dixwazim vî peyamê kin bidim: Ez bawer dikim ku min di mijara jinê de çanda ku li ser îxanet û înkarê ya şaristanî ferz dike hilweşandiye. Îfadeya hurmeta min a ji we re ev e. Ez nikarim viya ne bi hestên şairane ne jî bi metnên felsefî îfade bikim. Lê aliyê min ê li dijî desthilatiya mêr, zordarî û pêkutiyê bi heybet e. Min dahûrandineke hişmendiya wê ya dîrokî bilind e dayî holê. Ez hêvî û daxwaz dikim ku bêyî ku bibin amûrê lanetî û kirêtiyê, bi hurmet bijîn û li ser vî esasî xwe xurt bikin. Ronesans, li Rojhilata Navîn li ser bingeha derketina jinê dibe. Bixwe bawer bin, xwedî li nasnameya xwe derkevin. Di bûyera azadiyê de xwe biparêzin. Silav û hezkirinên min pêşkêş bikin.

**11'ê Tîrmeha 2001'an**

Asta azadiya jinê asta civakê nîşan dide. Ji bo min xala nîrengiyê (xala herî jor a bilind e) ye. Çi diqewimin? Em dikarin di şexsê çend jinan de têkiliyên civakê dahûrînin. Ji bo encam jê derkeve girîng e. Ez di parêznameya xwe de ji jinê re cihekî pir bilind, berfireh vedikim. Metnekî ji bo jinê jî girîng e. Pêwîst e cewhera wî biqefêlin û pir baş ronî bikin. Divê jin di şoreşa zîhnî de cihê xwe bibîne. Ji bo jinê azadî ji her tiştî girîngtir e. Ji bo vê pêwîst e fedakariyê bikin. Ez serkeftinê dixwazim. Ger hûn ji min re agahî bînin ez dikarim bi nameyê bersivê bidim wan.

**25'ê Tîrmeha 2001'an**

Di şexsê jinê de wê civak azad bibe. Ji bo konferansa ku li dar xistine ez wan pîroz dikim. Di naveroka parêznameyên min ên dawîn de ji vî aliyî ve nirxandinên min ên berfireh hene. Zehmetî dîtin û zehmetî dan wan xwezayî ye. Meseleyek e bi tu awayî biçûk neyê dîtin e. Hurmeta li hember gel çi be, hurmeta li hember jinê jî di heman wateyê de ye. Bêguman şaşî û kêmasî wê hebin, lê ev, divê li pêşiya azadiya jinê nebe asteng. Min hewl da pêşiya wan vekim. Tiştên ku civaka çînîdar ferz dikin divê ne di xema wan de bin. "Dîroka 2-3 hezar salî ya şaristaniyê çi dibêje, mêr çi dibêje" divê di xema wan de nebe. Berxwedana herî mezin; israra di kesayeta jina azad de ye. Di demên dahatû de bi sedemên êşên kişandin xwe şewitandin. Israra di kesayeta we ya azad de, îfadeya herî mezin a girêdana bi min re ye. Li ser van esasan ez wan silav dikim.

We merhaleya zehmet derbas kir. Ji niha û şûnve pêwîst e ji bo xebata demokratîk girîngî bê dayîn. Projeya Qada Sêyemîn wê hinek jî bi têkoşîna jinê vebibe. Divê hemû bibin yek. Yekbûna wan girîng e. Pêwîst e bi bêrehmî û bi çêr û xeberan nêzî hev nebin. Ev dem divê were derbaskirin. Jin pêwîst e lêhûrbûnekê li ser xwe bike. Bi aqlê selîm di kesayet û wîcdanên xwe de bila bigihên

kûrahiyê. Bila kesayetên xwe yên azad pêş bixin. Kesayeta dayika xwedawend di kesayetên xwe de bidin rûniştandin. Ger lêhûrbûnê li ser parêznameyên dawîn bikin wê gelek tişt bibînin.

**8'ê Tebaxa 2001'an**

Ji bo jinê ez bi kurtasî hin tiştên din jî bibêjim: Min bûyera jinê mezin dahûrand, bi kok dahûrand. Aliyê dîrok û mîtolojiyê baş vekir. Ahmet Altan di tiştên derbarê jinê de min dişopîne. Ahmet meylên min dizane, hinek jî dişopîne. Dema dibêje kurd qesta min dike. Lê ez weke wî ji îdîaya profesorbûna eşq û jinê wêdetir, vê xebatê girîng dibînim. Ez ewkên Ahmet jî diecibînim. Ez ji nameyên ji girtîgehê tên fêm dikim ku yên me kûr bûne. Watedar dibînim. Pêwîst e kûr bibin, hinek pêşketin heye. Ji bo gelek pirsên di hişê wan de kom bûne wê bikaribin di parêznameyên min de bersiv bibînin. Ger pirsgirêka jinê wekhevî û azadî be, heta ku parêznameyan esas negirin nikarin derketinekê bibînin. Em gelek bi prensîb nêzî viya bûn. Em bûyera jinê ya ku ji 4000 salan ve ye hatiye xistin radikin. Şertê yekemîn ê sosyalîstbûnê; têgihîştina wekhevî û azadiyê ye; sosyalîstbûn bi hurmeta ji jin û dayikê re dibe. Berpirsiyariyeke dîrokî dixwaze. Em dikarin hurmeta mezin wiha nîşanî malbatê jî bidin. Jin jî pêwîst e xwe layiqî viya bibînin. Bûyera eşq û xwedawendiyê ji bo min pir cidî ye. Awayên viya yên di ol de jî gelek bi sextekarî ye, ev bêwate ne. Li derveyî viya rêyeke din a eşqê jî tune ye.

Girêdana rast, keda rast, berxwedana rast jî wê wiha were bidestxistin. Hewce bike bila bi salan bifikirin. Bila hinek lêhûrbûnê bikin. Pirsgirêkên wan hene, ji bo pirsgirêkên xwe çareser bikin bila bixebitin. Ez layiqî tu keçikê nabînim. Ev, nirx nedayîna xwe ye. Li ser navê siyaset, erka rêxistinê jinan bi kar tînin. Hurmet şert e. Feraseta wekhevî û fehmberiyê divê bi tevahiya jiyanê pêk were.

Nameyê berhev bikin. Ger hewce bike hûn dikarin ji nivîsê jî bigirin. Sedema ku ez navê hin jê dipirsim, ji bo "Gelo dibe ku di

nav hevakariyê de bin?” e. Hinek di nameyê de jî hebû. Min ew jî xwendin. Ji bo min ên pirsnîşanê, cihê pirsê hebûn. Kî ji wan dibêjin em herî zêde girêdayî ne?

Pir balkêş e, bûye şerê jin û mêr. Ez bi dijwarî şiyar dikim, min nameya din jî xwend. Tiştên hê berê jî girtin. Pêwîstî bi yekbûna wan heye. Divê çanda xwedawendiyê pêş bixin. Li ser navê min hûn dikarin pirtûka Altindalê bidin wan. Hûn ê Mîtolojiya Campbel a bi 4 cildî, Mîtolojiya Yewnan, Quranê, Kîtaba Muqedes bidin, bila diyariya min be. We pirtûka derbarê Sumeran de da? Hûn dikarin pirtûka Dîrok ji Sumeran dest pê dike (Tarih Sumerde Başlar), Xwedayê Xasûk Enkî (Kurnaz Tanri Enkî) bidin. Ev, pirtûkên pir balkêş in. Belkî ji hemûyî fêm nekin, lê wê wan pêş bixe. Di vê mijarê de kûr bibin feyde ye. Ew, di nav têkoşîneke gelek dîrokî de ne. Bila li Zagrosê mîtolojiyê lêkolîn bikin. Jixwe Akademiya Azad a wan jî hebûye. Hewce ye bi hev re nekevin nakokiyan, qebûl bikin û bidin xebitandin. Pêwîstiya wan ne bi nakokiya di nav hev de ye, hewceyî bi yekbûnê heye. Ger bixwazin xwe bazar jî bikin, ez wê nizanim.

Ez ji bo mêran viya dibêjim: Bila nebêjin jin û derbas nebin, jina nû fêm bikin. Jina nû, ji azadiya welat û civakê jî pêşekî ye. Ji bo me, di afirandina civaka azad de di dereceya yekemîn de girîng e. Em çima jinê lêkolîn dikin? Ji Sumeran ve ye jin hatiye xistin, kirine tiştê piyaseyê, bazarê. Kî kiriye? Civaka çînîdar viya afirandiye. Me hewl da jinê rabikin û ji nû ve biafirînin. Mêr jî, ji xasûkiyê wêdetir, divê jinê bilind bikin. Wê jin bilind bibe, jiyan jî bi wê xweşik bibe, divê mêr viya bi rûmet hilgirin. Ji bilî “Bû ya min, bû ya te”, bê gotin “bû ya civakê”. Girêdana bi min re têgihîştina vana ye. Ji Ahmet Altan wêdetir, ez xwedî exlaqeke mezin im, cidî me.

Di vê mijarê de wê Rêbertî jinê ji laneta cins rizgar bike. Ez girêdana xwe nikarim bidim şixulandin. Ez ê jinê ji vê sivikahiya cinseltiyê pak û paqij bikim û vê girêdanê bi têkoşîna mezin a

azadiyê bibersivînim. Bila zêde zêde nîqaş bikin. Lê bila hevdu bilind bikin. Ji vê nîqaşê yekîtiyeke pir mezin wê derkeve.

Ez ji mêran re jî viya dibêjim: Divê min lêkolîn bikin. Bi dehan keçên ji min bawer kirin derketin. Ez nikarim mîna bira û kek bi sivikayî binirxînim. Ez nabêjim "bila bibin weke bira û xuşk, xuşk û kek". Yên ez herî zêde rexneyên xwe li wan dikim, di heman demê de hez jî dikim. Bila bi sebir bin.

**15'ê Tebaxa 2001'an**

Ez nameyan ji jinê di girtîgehê de digirim. Wan bibînin, têr biaxivin, nameyeke kin bidin. Ez pêşketina wan girîng dibînim. Gihaştî ne. Bi qasî dahûrandina dewletê ez dahûrandina jinê girîng dibînim. Bi keçikan re zêde zêde viya nîqaş bikin. Min di parêznameya xwe de jinê êpê vekir. Ez ji mêr re jî viya dibêjim: Jiyana bi jinê re divê weke hestên welatparêziyê were destgirtin. Jiyana bi jina azad dibe re divê rûmetê bide. Jiyana min a bi jinê re, nêrîna min; jiyana cinsek na, jiyana çandî ya li derdora jinê, jiyankirina çanda li derdora jinê pêk hatiye girîng e.

Jiyana li derdora jinê veguherandin jiyana çolê, divê jiyana li derdora jinê were watedarkirin, di xeta jiyanê de bi îdîa bimînin. Têkilî pir besît, sivik, hêsan in, wisa weke "vexwarina dewekî" têkilî datînin, nabe. Meseleya rûmetê cuda ye, berxwedana wan xweş e, bila di viya de kûr bibin, dikarin li ber xwe bidin. Li hember êş û tenêtiyê li ber xwe didin, dikarin li ber viya jî li ber xwe bidin. Ger hûn destê xwe bidin mêrekî, hûn kulîlkek, çîçekek bin jî wê we bicû û bavêje. Girêdana jinê bi min re cuda ye.

Min her tiştên derbarê jinê de heta dawîn bi berpirsiyarî kir. Ger mirovê we bêhêz, xerab, zordest û derewkar bin, heta dawî li dijî viya derkevin. Mêr kirêtiyeke pir xerab e. Ev çandeke çawan e, min ew jî heta dawî da. Jin wisa nebû, ev çand paşê hatin vedîtin. Em divê çanda xwedawenda dayik biafirînin. Min mijara têkildarî Kesîreyê jî vekir. Em nikarin xwe bi xwe hez bikin, weke şer

qanûnên eşqê jî hene. Li gor fehmberiya xwe em nikarin wisa hez bikin. Ez gelek gelek girîng dibînim, yên dibêjin “Em bi te re ne” pir in.

Ev parêznameya nivîskî wê pêşiya wan jî vebike. Bila nebin du beş û neyên beramberî hev, hin navên veqetiyane hene, ez pir şaş nemam. Yên ji Ewrûpayê veqetiyan, ev ne tiştên dijraber in. Ez li vê derê tek im, lê bi jinê re dinyayeke xweş dijîm. Giraniya giştî li ser taybet tune ye. Tiştekî wiha nabe, ev mantiqeke çawan e? Her du di nav hev de ne. Ne mimkun e ji hev bên veqetandin. Ev di rêbazê de şaşîtiyê dikin. Ev mantiqa rahib, ne mantiqeke were fedakirin e; yekbûna wan girîng e, bi tena serê xwe be jî, wê bibîne ku jina azad bûyereke mezin e. Em ê nirxê bidinê.

**5’ê Êlûna 2001’an**

Bila parêznameyên min pir baş bixwînin. Ger baş têbigihîjin bangewazî ji bo zayîneke jinê ya awarte heye. Yên me tênagihîjin. Mezinkirina hezkirinê, bi tevahî karekî felsefî, siyasî ye. Ya rast Ahmet Altan hinek ji me fêm kiriye dibêm qey, li ser jinê dinivîse. Pirtûka wî ji 150 hezarî zêdetir firot. Ahmet Altan rûdaneke sivik a dahûrandinên me ye. Bila viya baş lêkolîn bikin û veguherînin hêzeke mezin a wateyê. Hezkirin, afirandina hêza mezin a nû ye. Bila pir berfireh viya vekin. Wê mêr hurmetê bidin viya, rêyeke din a viya tune ye. Keçikên me hinek lez nakin? Qey ez pîr bûm? Divê hinek hêza wan a berxwedanê hebe. Ez hatim vî temenê xwe, 55 saliya xwe, qet bêzar bûm? Min **dahûrandin** li ser dayika xwe kir. Di mijara jinê de hê bi heman heyecanê tiştên nû hîn dibim. Min eşqa li Ewrûpayê tê jiyankirin hinek dahûrand. Li Rojhilata Navîn hilweşandina eşqê berfireh dahûrand. Îştar, Promethe, Gilgameş. (Pirtûkên Mûazzez Îlmiye Çig ku li ba xwe anîbû nîşan da) Min ev baş ji hev derxistin. Îştar bûyera ku em jêre dibêjin Ster, yanê Star “stêrk” e. Star, Xwedawenda destpêkê ye. Xwedayê yekem bi navê

Star hat sîmgekirin ku hê jî di zimanê me de heye. Li ba we jî nabêjin “Ya Star”?

Ji wê derê weke Îştar derbasî Sumer bû. Ji bo wê ez dibêjim dîrokî ye. Ez li ser;  kurd çawa ji Zagrosan daketin û Neolîtîkê xebitîm. Dikarin vana bikin şano. Ji keçikan re bibêjin; ger hêza wan a hunerî hebe (NÇM’ê qest dike) koma şanoyê dibe. Xeta ku Ewrûpa di Shakespear de qefaltî, dikarin di Gilgameş de biqefêlin. Ji bo vê jî kûrahiya îdeolojîk, zanîna dîrokê hewce dike. Parêznameyên min asoyên dîrokê vedikin. Huner, muzîka destpêkê, ol ji wê derê (ji Mezopotamyayê) derketine. Ger hûn vana rast têbigihîjin, hûn dikarin bibin rewşenbîr, wê zanîneke we ya baş a dîrokê çêbibe, hûn ê bibin welatparêzeke xweşik.

**3’yê Cotmeha 2001’an**

Min di parêznameyê de kolekirina jinê vekir. Îştar, Înanna ew jina azad e ku ji Zagrosan, ji herêma çiya tê. Ji Înanna re dibêjin fahîşeya sereke. Ev, ne rast e. Kerxaneya destpêkê Mûsakkadîm, li Nîppûrê vedibe. Çanda Hollywoodê çavkaniya xwe ji vê derê digire. Romana Înanna baş nehatiye nivîsandin, me baştir fêm kir. Bi qasî ku dixuyê weke şerê di navbera xweda û xwedawend de ye. Destpêkê jin tê kolekirin, piştre civak. Ji bo viya bi civakê bidin qebûlkirin Zûggûrat tên avakirin. Di Zûggûratên wê demê de ji zanîngehên niha zêdetir mêjiyan dişon. Akademiya wêjeyê ya despêkê bi navê Edûbbayê li Nîppûrê vedibe. Li ser esasên çîna serwer pêş dikeve.

Civaka Neolîtîkê li erdnîgariya Kurdistana îro ya ku jê re Xeleka bi Bereket tê gotin ava dibe. Xwedayê xasûk ê Sumeran Enkî, ne tam despot e, nîv zanyar û nîv bavikê sazkar temsîl dike. Navên dapîr û dayikan ji Nînhûrsag û Înannayê tê. Ger fersenda min hebûya min dixwest li ser “Çi bi serê xweda û xwedawendan ve hat” binivîsanda. Jin dikarin binivîsin ku çi bi serê xweda û xwedawendan ve hat. Hûn dikarin vana bidin jinan.

Yên ku çanda axê afirandin jin in. Jin, hêzeke harîkûlade ye. Sedema ku çanda dayik ev qas xurt e ji vê derê tê. Romana rahiban nivîsandin pir balkêş e. Her sê pirtûkên pîroz ên îro, versiyon û teqlîdeke xerab a mîtolojiyê ye. Pêwîst e baş ji hev bê derxistin. Bi me re ji nêz ve eleqeder e. Îlmiye Çig zêde fêm nekiriye. Tiştên di pirtûka Bandora Sumeran Li Ser Her Sê Olan de nivîsandiye rast in. Lê me mîtolojiya Sumer baştir ji hev derxist.

**24’ê Cotmeha 2001’an**

Hûn dikarin ji min re du pirtûk bînin. Ez niha Mîtolojiya Dinyayê dixwînim. Ji weşanên Îmge Dîroka Dinyayê û Şamanîzm, ji bo hevalan, ên di girtîgehan de û ji yên derve re. Bi taybetî ji hevalên jin re destanên girîng; Homeros, Vergîlos, Destana Gilgamiş bixwe û parêznameya min, weke diyariya min bidin Ewrûpa, navendê, weqfê û girtîgehan. Destana Gilgamiş bixwe û ger hebe Destana Afirandinê ya Babîl ji min re bînin.

Min gotibû hûn her tim ji min hêvî dikin; derbarê wê ez ji dîrokê mînakek bidim. Ger fersenda min hebûya min dixwest çawa Înanna 104 ME’yên xwe ji Enkî, ji nava deryayê, ji giravekê digire û tîne Ûrûkê –‘ME’ qanûnên pîroz in û ya rastî aydî Înannayê ne- Enkî dixwaze wan paşve bigire, dîsa binirxanda. Hûn û PKK’yî girtineke we ya wiha heye. Hûn dikarin viya ji jinan re bibêjin. Hûn çi dixwazin ez bi dilxwazî didim, ez dixwazim bizanibim ka we jî çi girtiye. Pênc hezar sal in we mezin winda kiriye. Ji bo we ya pêwîst ev e; ne koletiya mêr, şeref, rûmet û azadiya we ye.

Parêznameya min desteka herî mezin e. Silav dikim û serkeftinê dixwazim. Bi taybetî bersivê didim. Bila bixwe bawer bin. Bila li ser bingeha parêznameyê gelek rêxistin, di qada çand, huner û zanistê de rêxistinan ava bikin. Li qadên xwe bila viya bikin û xwe fedayî viya bikin. Bila di hewldanên xwe de kûr bibin. Sê, pênc salên xwe bila bidin viya. Piştre ez dikarim nirxa azadiyê ji nû ve vebêjim. Pirsgirêka rêxistina jinê, çîrokeke pênc hezar salan e. Bixwe bawer

bin, bibin Xwedawend. Jin divê hewldanên xwe di partiya wê nû bê avakirin de zêde bikin û heta ji bo seroktiyê dikarin bixebitin

**26'ê Berfanbara 2001'an**

Derbarê nameyên ji girtîgehan tên ez viya bibêjim. Bila jin destnîşankirina min a xwedawendê şaş fêm nekin; bûyereke çandî ye. Çandeke wiha li ser axên me heye. Ez dibêjim çanda Înanna çanda Kîbele. Yanê mêr jî ketiye pêvajoya afirandinê. Li ser cemseran (her du alî) viya bibêjim; bila tîpê kevn ê jinê hilweşe here, tîpê kevn ê mêr jî wisa, bila hilweşe here. Tiştekî lanetî ye. Divê azadiyên xwe plan bikin. Me xwest di jinê de kesayetên bêsînor ava bikin. Me xwest jina xurt, jina jê re hurmet bê dayîn biafirînin. Bila hezkirinên biçûk biçin, kesayetên bêsînor werin afirandin. Ev, wê hezkirinê biafirîne.

Nivîsandin an nenivîsandin ne girîng e, xwedayîkirin heye. Di rêyeke xweş de ne. Bi qasî jina hurmet jêre bê dayîn, pêwîst e mêrê jêre hurmeta mezin bê dayîn jî were afirandin. Divê kesayetên bêsînor biafirînin. Peyama jinê ya sala 2002'yan pêwîst e mirov li ser van esasan bide. Qet ne hewce ye li hember êşan mirov hilweşe, pêwîstiya wan bi mezinkirina hurmet û hezkirinê heye.

Her çi qasî xwezaya jin di tarîtiyê de bimîne, hemû xwezaya civakê wê nikaribe ronahî bibe. Bi awayekî rastî û berfireh ronahîkirina xwezaya civakê, tenê bi awayekî rastî û berfireh ronahîkirina xwezaya jinê re gengaze

**2002**

**16’ê Çileya 2002’yan**

Ez ê peyamê bidim wan. Di avahiya xwe de mêr perwerde dikin ne wisa? Her hal kûrbûna wan pêş ketiye. Dibêjin xebatên Akademiyê kûr bûne. Giraniyê dane rêxistinkirina civaka sivîl. Ya rastî li Tirkiyeyê jî Akademiyên Azadiyê dibin. Di demên dawîn de her kes bûne şairên eşqê. Mîna ku tu nivîskar nemaye ku pênûs li van mijaran negerandibe. Hin jê dixwazin vê pêvajoyê berevajî bikin. Pêngava demokratîk a bûyera jinê pir tê berevajîkirin. Di bin navê eşqê de pir tê daxistin. Bi hezaran kadroyên tevgera me ya jinê hene. Ji bo pêşiya viya bigirin şairtiya eşqê hat afirandin.

Divê parêznameyên min li pirsgirêkên xwe bînin. Bila feraseta dîrok, felsefe û rêbaza parêznameya min li rastiyên xwe bînin. Bila dîroka jinê binivîsin. Di parêznameyên min de ji aliyê jinê ve kûrbûneke mezin heye. Herî baş jin parêznameyên min dinirxînin. Pirsgirêka jinê ne tenê di jina kurd de, li Ewrûpayê jî heye. Ev aliyê wî gerdûnî ye. Diyardeya Înanna rastiya Kurdistanê ye. Cihê wî yê mîtolojîkî heye. Di pirtûka pîroz de wê cihê xwe bibînin. Ez ji bo we jî pêşniyar dikim bixwînin. Çanda Înannayê ji Zagrosan daketiye Mezopotamyayê. Ez bi daneheva xwe ya 40 salan vana dibêjim. Serweriya deh hezar salan a jinê; ya ku zad dîtiye, hêraye, malê ava kiriye, darên fêkiyan xwedî kirine, kedîkirin encama keda jinê ye.

Mêr li derdorê weke nêçîrvanên bênav dihatin girtin. Divê heval li ser mîtolojî û arkeolojiyê zêde zêde pirtûk bixwînin. Xwedayê Babîl Mardûk, temsîlkarê destpêkê yê desthilatdariya mêr e. Çanda Babîl piştre bi rêya Brahîm derbasî Cihûyan dibe. Ez pêşniyar dikim Kîtab-i Muqeddesê bixwînin. Di vê derê de xistina jinê pir balkêş e. Hûn dikarin desthilatdariya mêr a di Destana Babîl de jî bixwînin. Jin, bi dawîbûna Çaxê Qeşayê yê 4. heta derketina civaka Neolîtîkê xwe dispêre. Di Sumeran de danehevên civaka Neolîtîkê tên dîtin. Perwerdeyên xwe divê di qadên mîtolojî,

felsefe, zanist û hunerê de bikin, bi vê zanînê rêxistinên civaka sivîl biafirînin.

**15’ê Gulana 2002’yan**

Ez difikirim ji bo jinê hefteya pêşiya me peyameke hîn bi detay bidim. Di jinê de hinek şiyarbûn heye ne wisa? Ez di azadbûna jinê de bi israr im, mirovên zanyar jî dibêjin; ji bo sedsala 21. dibêjin wê bibe “Sedsala Jinê”. Meseleya jinê meseleyeke civakî ye, ne tenê meseleya cins e. Li gor min jî meseleya mêr e. Şaristanî, afirîneriya mêr a pênc hezar salan e, qirêj e. Mêr, di vê qirêjiyê de parçe parçe tê xwarê, ez ê lêhûrbûnê li ser viya bikim. Ez niha li ser meseleya mêr im, ez ê viya vebikim, bila bi heyecan li bendê bin. Jinê hinek asta azadiyê bi dest xist, bi jinê re jiyaneke bi rûmet. Divê jin jiyaneke bi rûmet bi dest bixe. Ji min re dibêjin “Tu çawa dijî?”. Divê mirov meseleya jinê jî baş têbigihîje, em ê jinê bikin şûna mirovan. Wê bi awayekî bi rûmet jiyan hebe, wê demê bi jinê re jiyan wê bi rûmet be. Ez hemû hêza xwe ji ku derê digirim? Wiha jina mezin derxistina holê wê dinya û civakê rizgar bike. Li ser van esasan ez xurt im, bila ew jî xurt bin. Ez dibêjim “Bila ne bi dû mala taybet ne jî bi dû mala giştî bikevin”. Min berê jî gotibû “malên azad”. Ji malên azad, di dema Dewleta Sumer de hat kerxaneyê, Mûsakkadîm pêş ket. Bila li malên azad bigihên hev. Destpêkê malbat saziyeke baş bû, piştre hat kolekirin. Bila bi Dîroka Jinê, Peymana Civaka Azad a Jinê, biçin kongreyê. Divê hinek pereyên wan jî malên wan jî hebin. Ez nabêjim “Bila bibin rahib an jî rahibe”. Bila fêm bikin rahip çawa dijîn. Çanda xwedawend ji Star, Îştarê, Înannayê, heta Afrodîtê tê. Em ê hewl bidin vî çandî bidin jiyankirin, ev çanda me ye. Silavên min bibêjin.

**22’yê Gulana 2002’yan**

Di hin mijarên diyar de bila amadehiyên xurt bikin û wisa kongreya xwe li dar bixin, ez bawer im hêza wan têr dike. Têkoşîna jinê têkoşîneke pir girîng e. Min cihê vala negotibû “Sedsala 21. wê

bibe sedsala jinê". Veguherandina jinê tenê têr nake, divê pirsgirêkên veguherandina mêr bigirin dest. Dikarin endamên mêr jî bigirin partiya xwe, lê divê hin pîvanên wan hebin û ew wan diyar bikin. Yê wan jî divê hêzên parastina rewa yên bi hêza wan a cewherî hebin. Ez ji bo wan sê xebatên bingehîn pêşniyar dikim; ya yekemîn; dîroka jinê, ya duyemîn; şoreşa jinê, yanê azadbûna wê, ya sêyemîn; peymana civakî ya jinê. Di vê qadê de xebateke wan heye. Bila viya hîn jî kûr bikin. Piştî ku di van her sê mijaran de demeke xebatê ya dagirtî derbas bikin û kongreya xwe di çarçoveya vê amadehiyê de bikin wê baştir bibe. Hewce nakin ku lez bikin. Hûn dikarin van gotinên min weke nameyan li hev kom bikin û ji girtîgehan re bişînin. Ji girtîgeha Sêwazê re dikarin bişînin. Ev her sê xebat di aqlê xwe de bigirin û teqez ragihînin.

**5'ê Hezîrana 2002'yan**

Min berê bi awayê nameyan ji wan re hin peyam şandin, ez divêm niha gihîştiye. Min ji bo wan sê pirtûkên bingehîn pêşniyar kiribû. Ji aliyê naverok û berfirehî, bergehê ve divê lêhûrbûnekê li ser bikin. Ez girîng dibînim. Xebateke rêgezî ye. Bi awayekî demokratîk divê azadiya xwe diyar bikin. Dibe ku zehmetiyên diyar hebin, lê çi zehmetî hebin ew dizane ev ji bo min helwesteke rêgezî ye. Ji bo min xebatek e ku rêgezî û cewhera demokrasiyê diyar dike. Ez jiyanî dibînim. Xebateke herî bingehîn a Rojhilata Navîn e. Li Rojhilata Navîn pêşketin û Ronesans tune be, demokrasî pêş neketibe ji ber vê pirsgirêkê ye. Ev pirsgirêka herî girîng a Rojhilata Navîn ber bi çareseriyê ve bibin, ez li ser navê xwe heta dawî parêzvanê vê yê bi biryar im. Her sê pirtûkên ku min pêşniyar kirine bi kûrahî lênêrîn bikin û ji nivîsên min jî têra xwe bigirin dikarin kongreya xwe li dar bixin. Dikarin xebatên xwe bibin serî, berdewam bikin. Çawa ku gel çarenûsa xwe diyar dikin, jin jî pêwîst e çarenûsa xwe diyar bikin. Ev rêzika destpêkê ya hevgiriyê ye. Di xebatên siyasî yên demokratîk de divê pratîk bibin.

Xebatên xwe yên pratîk li Rojhilata Navîn bi bawerî pêwîst e berdewam bikin. Divê ciyawaziyên çêkirî nebin. Ne pîrektiya sivik bikin, ne jî serî ji desthilatiya mêr re deynin. Hin tiştên di min de jî car carna min xwest bi nameyan bigihînim wan, lê hûn dizanin, min zêde venekir. Pirsgirêka netewan, pirsgirêka navneteweyî, aborî, siyasî, divê berê pirsgirêkên jinê û yên derdora wê werin çareserkirin. Azadbûna jinê pêşekî ye. Dibe ku zehmetî hebin. Bêhêziyên çavkaniya xwe ji jin û mêr digirin jî dibe ku hebin. Bêhêziyên bi vî rengî ji viya re dibin asteng, lê rêgez rêgez e. Ne hêsan e tabî, dîrok û şaristaniya koletiya 5 hezar salî, aniye çi halî li holê ye. Çiqasî qirêjî afirandiye, Rojhilata Navîn çiqas bandor dike li holê ye. Bi awayekî din namûs nayê parastin. Nasname nabe, gel nabe, jiyaneke watedar nabe. Li ser van esasan ez ji wan re serkeftinê dixwazim. Ji parêzname û pirtûkên ez pêşniyar dikim dikarin têr feyde bigirin. Dikarin ji vana îlhama xwe bigirin. Di parêznameya xwe de ez bi dirêjahî li ser sekinîbûm.

**12'ê Hezîrana 2002'yan**

Ez dibêm qey jin kongreya xwe li dar dixin. Bila ji nivîsên min jî bigirin, ji pirtûkên min pêşniyar kirin û parêznameya min feyde bigirin û kongreya xwe li dar bixin. Tespîteke balkêş a nivîskarekî Îngilîz hebû. Ez dibêm qey dikeve tengasiyê, jineke kurd li gel e, ji rewşeke bêderfet xwe çip dike û davêje û wî ji zehmetiyê xelas dike. Li ser vê nivîskar wiha dibêje "Piştî ku min ev tevgera jina kurd dît, min bawer kir ku jina kurd dikare her tiştî bike". Îngilîz mirovên bi aqil in, wisa cihê vala nabêjin. Ez jî bawer dikim ku wê jinên kurd rûmet û azadiya xwe bi dest bixin. Ez bawer dikim ku wê her tişt ji destê jina kurd bê. Hûn li welatê xwedawendan dijîn, ez bi we bawer im, şaşîtiyê nekin... Bi silav û hezkirinên xwe serkeftinê dixwazim.

Dibêjin em girêdayî te ne, wiha ne rihet e. Bila nexapin; pêşxistina namûs û azadiyê wisa rihet nîn e. Têkoşîneke bi zehmetî

ye, kar ew qas ne rihet e. Wê ya zehmet bi ser bixin, ez bawer dikim. Ya rastî hûn dikarin hem rewşa hejmarî hem jî ya çawaniyê ya avahiya jinê hîn bibin û ji min re bînin. Pêşketinên piştî kongreyê, bi yên girêdayî re, heta yên dijber di asta nav de hûn ji min re bînin, ez ê li ser viya nirxandinekê bikim. Hûn dikarin vana ji bo kongreyê ragihînin. Me pêşiya jinê vekir. Derfeta azadbûnê afirand, divê viya binirxînin. Wekî din namûs û jiyan nabe.

**26'ê Hezîrana 2002'yan**

Kongreyê bi 255 delege li dar xistine? Bûne tam partî. Dayikek jî cî girtiye, erênî bûye. Her hal kesê cuda bûye tune.

Ez hewl didim çanda xwedawenda dayik ji nû ve zindî, şîn bikim. Koka wê qûntarên Toros û Zagrosan e. Çanda xwedawenda dayik çanda me ye.

Kulîlka min şandiye gihîştiye. Ji bo wê jî ez li vir bi îdareyê re êpê li hev ketim. Gotin "te çawa şand", "qedexe ye" filan gotin. Kulîlkên mayî hilkişandin, rûçikandin. De carek çi bû bû, gihîştibe baş bûye. Hûn ê ji hevalan re çîroka kulîlkê vebêjin. Kulîlk sembolek e, ya girîng kulîlkbûna jinê pêkanîn e.

Nivîskarekî Îngilîz di jêrnivîsa xwe de gotibû "Min keçeke kurd biçûk dît, hin tişt gotin. Min bawer kir tiştekî ku jina kurd nikaribe bike tune ye". Ez vê vegotina wî girîng dibînim.

**3'yê Tîrmeha 2002'yan**

Baş e, biryarên xweş girtine. Hûn ê silavên min ji bo wan bibêjin. Ez kongreya wan pîroz dikim lê biryargirtin tenê têr nake. Her yek ji vana meseleyeke rêxistinê ye, pêwîst e ev bi rêxistinê werin tacîdarkirin. Pratîk tenê wiha dixebite. Ji siyasetê heta aboriyê bila xwe rêxistin bikin. Ez nabêjim "Bila ji mêran veqetin". Lê bila hêza xwe ya cewherî baş rêxistin bikin. Ez nabêjim "Bila ji HPG'ê jî cuda bibin". Tabî wê tiştên wan ên hevpar hebin, lê divê hêza jinan a xwe biparêzin, ez çizanim çekeke wan hebe. Li ser esasên parastina rewa divê ew jî baş nîqaş bikin.

Min berê sê pirtûk pêşniyar kiribûn. Ez ê niha bi kurtasî tiştekî din jî bibêjim. Lê berê pêwîst e mirov vê meseleya namûsê baş ji hev derxe. Min hinek ji bo vê xwest jina kurd rakim ser piyan. Mêrik hem te dikuje, hem hevsera te, xuşk û birayên te, keça te nizanim çi dike, piştre dibêje “Ez axayê te me”. Dema ez bi jinan re diaxivîm ji bo ku kes şaş fêm neke min ji dayika xwe mînak didan. Mêrik canê min, malê min, her tiştî ji destê min digire, piştre bi dayika min re dizewice. Madem tu her tiştên min ji destê min digirî, dikujî, tu ji dayika min çi dixwazî? Ev viya wiha vekim; ez ewladê baş ê dayika xwe me, kurê wê yê baş im. Tu hem min dikujî, hem jî bi dayika min re dizewicî, dibî axa, li ser mîrasa derdora dayika min rûdinî. Li ba me meseleya namûsê ev e, pêwîst e pêşî ev ji hev bê derxistin. Ger hûn viya baş ji hev dernexin wê keda we vala biçe. Tu çiqas hewl bidî jî wê hinek werin li ser rûnîn. Peşmerge vaye dibêjin “Em herin jinên di PKK’ê de bigirin” û wisa nêzik dibin. nêzikahiya wan li holê ye, tu yê bi vana çi biparêzî?

Jinek hebû: Bêrîtan, ji bo radestî paşverûtiya kurd nebe xwe ji zinaran ve avêt. –Ji gundekî nêzî Depê ye- pêşmerge zarî û lava dikin, dibêjin “Radest bibe, em tiştek nakin”. Vaye xeta azadiya ku ez esas digirim ev e. Lê ew dibêje “Ez radestî paşverûtiya kurd nabim” û azadiyê esas digire. Parastina rûmeta azadiya wê jinê deynê stûyê me ye. Ev rêgeza min e.

**Ez jinan bi sê koman vediqetînim**

1-Yên alîgirê hilbijêrka azadiyê ne; Ez wan weke nebiyên Xwedawend Îştar dinirxînim. Xwedawend Îştar a rastî kurd e, vaye biwêja “Ya Star” ji wê derê tê. Kralên Hind jî girêdayî wê bûn, li ser navê wê kraltî dikirin. Li gel Sumeran Zîggûrat hene; her çiqas li wê derê jin hatibe xistin jî, li gor jinên din hîn bi îmtiyaz, di rewşeke azad de ye. Ez bêguman viya pêşniyar nakim, lê divê mirov azadiya jinê ya di wê derê de baş bibîne. Ew, jinên xwedawendê ne. Diyardeyeke azadiyê jî heye, hûn dizanin kerxane, mala taybet ji

wê derê tê. Yek jî di Xiristiyaniyê de rêxistina rahibeyan heye. Pêwîst e mirov bûyera rahibetiyê baş binirxîne. Îro di pêşketina civakên Ewrûpa de ev rola jinê girîng e. Ji ber ku di civakên Îslamê de bi vî rengî ronakbûna jinê nehatiye jiyankirin, di rewşeke pir paşverû de ne.

Ez nabêjim bila bibin rahib an jî rahibe, ez jiyana rahibetiyê jî li ser wan ferz nakim. Di vê derê de ya girîng, xwedawendbûnê, rahibetiyê, azadiya mûtleq a jinê fêmkirin e. Kî bixwaze dikare bi îradeya xwe ya azad viya bike. Yên aliyê azadiya mûtlaq bin dikarin bikevinê. Wê azadiya mûtleq esas bigirin. Ev, bi îradeya xwe ya azad tên, ev ên alîgirê azadiya mûtleq in. Wê bi îradeya xwe ya azad û hilbijartina azad bixebitin. Ev, îradeya mezin, hişmendî û hêzê pêwîst dike. Ev, nebiyên Îştar in.

**2-Koma perwerdekar in**; karê vana tenê perwerde dayîn e. Wê bixwînin, lêkolîn bikin û perwerde bidin. Bi teorîkî, pratîkî pêş bikevin, em dikarin ji vana re bibêjin talîp jî. Maneya xwe xwendekar, şagirt e.

**3-Koma sêyemîn**; li gor mîrasa Zerduşt dikarin bizewicin. Hûn dizanin, di kevneşopiya Zerduşt de zewaca bi îradeya azad heye. Zerduşt hevseriyeke baş ji bo jinê jî ji bo mêr jî datîne. Divê şêwazê pêxember Zerduşt, hezkirin û hurmeta ji hev re esas bigirin. Ez li dijî zewacên niha tên kirin im, ew şêwazê ereb in. Ez li dijî zewaca şêwaza ereb im. Lê ne li dijî zewaca azad a di kevneşopiya Zerduşt de me. Ev, bi fêmbariya azadiyê ya li hember hev dibe. Ger zewac hebe wê li ser esasa azadiyê bibe. Ez niha vana diyar dikim. Ji hemûyan re pir silavên min bibêjin.

**17'ê Tîrmeha 2002'yan**

Bi qasî 25-30 nemayên ji derdorên tarî hatine, dan min. Gerînende çima vana da, min fêm nekir. Meseleya jinê, nakokiyên min ên bi dayika min re û nêrînên min ên li ser demokrasiyê girtine

dest. Min dîtinên xwe yên di mijarên jin, demokrasî û mafê dayik û bav de bi zelalî danî holê, heta dawî baweriya min bi min heye. Nêrînên min ev qas zelal in.

Ez azadîxwaz im, nikarin bi min re li hev bikin. Min cihê vala li vê derê xeta Bêrîtanê negot. Li dijî netewperestiya seretayî, paşverûtî, bi lehengî li ber xwe da. Ji bo min diyarker e, rêgez e. Ji bo wê min xeta azadiyê ya Bêrîtanê esas girt. Li ser navê gelekî pir bawer dike, li ser navê yên pir êş kişandin ez axivîm. Wisa bi hêsanî mirov bi namûs nabe. Min her tiştî ji bo kurdan kir.

Derbarê jinê de tiştekî nû heye? Min dixwest têgînan vekim. Divê têgînên di wê derê de nîqaş bikin. Min gotibû "Malên jinê yên azad, perestgehên jina azad", pêwîst e lêhûrbûnên wan li ser van têgînan be. Min gotibû "Zewaca Zerduştî". Li ser viya pêwîst e pênc, deh pirtûk werin lêkolînkirin. Ya rastî, fikrên Zerduşt ên li ser zewacê divê bibin pirtûk. Bi sînor be jî li dijî koletiya jinê derdikeve. Zewaca bi koka xwe Samî bi tevahî jinê kir kole. Min di parêznameyên xwe de jî vekiribû, ya rastî azadbûna jinê ji çînan jî kevntir e, çîna yekem jin e. Samî, hûn dizanin ereb û cihû jî tê de ne. Îsa hinek nirx dide jinê. Min gotibû rahibe. Ew, ji bo xwe perwerde bikin du hezar sal in dixebitin, jinan perwerde dikin. Min dîroka pênc hezar salî ya koletiya jinê vekir. Yên me divê xwe pir perwerde bikin, ez dibêjim ji serî heta dawî ji nû ve perwerde. Di dîroka pênc hezar salî de ez nikarim mêr vebikim jî, bûne mîna dînazoran. Em ê piştre van têgînan vebikin, nîqaş bikin, li ser vî esasî silav û hurmetên min bibêjin.

**14'ê Tebaxa 2002'yan**

Di çarçoveya biryarên hatine girtin de konferansên xwe li dar dixin ne wisa? Malên ku wê vekin, mîna malên azadiyê yên ku min diyar kirin in newisa? Sumerolog Mûazzez Îlmiye Çig li ser çanda Sumer, Înanna dixebite, di pirtûka Star-Îştar de viya kiriye şano. Çanda Îştar, Înanna çanda klasîk a jinê ye. Stêrkan dikin weke

xwedayan. Di erdkolanên li Çatalhoyukê hatin kirin de hemû peyker jin in, ev derketiye holê. Salên 4000 û 2000 B.Z. ew dem e ku êdî derbasî feraseta civaka serweriya mêr dibin. Dema ez dibêjim "Malên azadiyê divê bikin weke perestgeh" divê şaş neyê fêmkirin, ev her yek sembol in. Wê perestgehên azad ên jinê, malên azadiyê bê gotin.

**28'ê Tebaxa 2002'yan**

Her tim tevlî bernameyên televizyonê bûne, xurt axivîbûne, li ser gel bandoreke erênî çêkiribûne.

Bi ya min jî niha xurt bûne. Min berê jî gotibû, nivîskarê Îngilîz di pirtûka xwe ya bi navê Bermahiyên Nînovayê de dibêje "Piştî ku min dît jina kurd di kêliyeke zehmet de ji şibakeyê xwe davêje û yên di zehmetiyê de ne xelas dike, min bawer kir ku wê jina kurd bikaribe her tiştî bike". Jina kurd **û** keça kurd, tevî hemû kêmasî û nebesiyên xwe mesela weke jinên ewrûpî tam nebûne pîrek. Min ev aliyê wan dît. Ji bo jin azad bibe min xebateke mezin kir.

Min li Romayê gotibû ku "Projeya Jina Azad nîvî ma". Lê bi lêhûrbûnên xwe yên li vê derê, min hîn jî kûr kir û viya di parêznameyên xwe de jî da. Hewldana min a di têkoşîna azadiya jinê de tê lêkolînkirin?

Di vê mijarê de lêkolîna kê heye? Divê di mijarên jin û êş, jin û dad, jin û azadî, jin û huner, jin û xweşikî de lêkolîn werin kirin, bikin pirtûk.

Min gotibû peymana civakê, ez dibêm qey wê çêkirine, kirine pirtûk. Jina xweşik, wêrek û bi îrade wê dinyayê fetih bike.

Ez tu car tam mîna jinekê nêzî jinê nebûm. Hin jin û mêr li hember viya dîn û har bûn. Beşek mezin a bertekên wan ên li hember min ji ber vê yekê ye. Di dîrokê de jî du xet hene; xeta Mûsa û Zerduşt. Xeta Zerduşt; li qûntarên Toros û Zagrosan xwe dispêre civaka Neolîtîk a ku bi çandinî û sewalkariyê re mijûl dibe. Ji desthilatdariya mêr wêdetir, aliyê wê yê ji azadiyê re vekirî û

wekhevîxwaz heye. Xeta Mûsa; Heta Sumeran diçe. Piştre xeta jinê ya ku bi Meryemê re pêş dikeve bi zewaca tek hê jî li Ewrûpayê berdewam dike.

Pêwîst e hîn jî kûr bibin. Her ku nasnameya xwe dibînin, azad dibin, niha şaşwaz dibin, dinyayeke nû keşif dikin. Li ser bingeha Akademiya Azadiyê divê xebatên xwe bimeşînin. Tu tiştekî ku wê wêrekî û îrade wan fetih neke tune ye. Yên îdîa û hêrsa wan hebin wê viya bi ser bixin. Dikarin ewkên perwerdeya rahibên Sumer û Misrê lêkolîn bikin.

Ez li vê derê bi serê xwe, min perwerdeyeke çar salan kir. Min di tarî û derdoreke bêhewa de vana pêk anî. Dikarin viya mînak bigirin. Lêhûrbûna wan dikare li ser çand û çalakiyên aborî be. Dikarin giraniyê bidin çalakiyên demokratîk û hunerê. Ev, karên pîroz in. Min berê jî diyar kiribû, di vê mijarê de fikrên weke baranê tên bîra min. Me şerm û kirêtiya hezar salan xera kir; me sebir, lehengî û wêrekiyê derxist holê. Ez bi viya kêfxweş dibim, rûmeta viya dijîm.

Di vê mijarê de wê bangewaziya min jî hebe; deng dayîn, erkeke pîroz e. Em dikarin bibêjin "Her dengek gulek e", dirûşmeke wiha jî dibe. Em bang dikin ku her kes tevlî viya bibe. Dengek, gula demokrasiyê ye. Ev meseleya gulê jî jixwe bû bûyer. Rengekî sosret girt. Gerînende jî pirsgirêk derxist. Min xistibû nav pirtûkê, hat ji nav girt. Buyera gulê pêl bi pêk belav bûye. Şoreşa jinê şoreşeke gulê ye. Derketiye holê ku wiha ye.

**18'ê Êlûna 2002'yan**

Di bernameyên televizyonê de bi giranî mijarên jinê bidin wê baş bibe. Pêşketina di şerê nasnameya jinê de ez bawer im li her derî heye. Diyardeya jinê gelek girîng e. Jin êdî dikare derkeve rûyê erdê, ronahiyê. Îradebûyîneke diyar hat jiyankirin. Li ser bingehên demokratîk bila viya derxin holê. Di pirtûka Ekolojiya Azadiyê ya ku min qal kir de tezên dişibin hene. Lê bi aliyekî ve hatiye dayîn, min

bi nêrîneke hîn dîrokî û civakî danî. Tevgera jinê û tevgera hawirdorê li dinyayê jî xurt dibe. Bi rengê ku em pêş dibînin pêk tê. Pêşketinên teorîk ên di wateya giştî de, rastiya fikrên ku em datînin holê îspat dikin.

Ez nameyan ji jinan digirim, bi taybetî ji Girtîgeha Sêwazê nameyên pir hestiyar, weke helbestê dinivîsin. Divê bi awayekî hûn ji wan re jî bersiv bidin.

Pinar Selek cihekî vekiriye, navê wê "Amargî" daniye, ji min re balkêş hat. Amargî li gel Sumeran di maneya "azadî" de ye, di maneya mecazî de jî "vegera dayikê" ye. Çima vegera li dayikê? Vegera li dayikê, vegera azadiyê ye. Ji bo vî navî ez dibêjim her bijî. Di civakê de jin, bi berdewamî winda dike. Ger bixwaze rast binihêre, divê bizanibe ku jin di civakê de her tim winda dike. Pêwîst e pêşketina viya ya dîrokî derxe holê. Bila berê xwe bidin wan xebatên ku wê bingehên azadbûna jinê li nîqaşê vebikin. Amargî, pêwîst e ji bo jinan têbikoşe û fikra azadiya jinê kûr bike. Ez xebatên wê diecibînin. Dikare derketina xwe xurt bike. Derdora li Tirkiyeyê ji bo vê dest dide.

Her jınek kırdeya jıyanê ye;
hêza herî xurt ya jıyanê ye

**2003**

**26'ê Adara 2003'yan**

Nameyên hatine zêdetir ji Girtîgehên Êlih û Mûşê ne. Nirxandinên baş hene, lê her hal nikarin pratîze bikin. Min xebata romana Hektor-Apo pêşniyar kiribû. Ev, di cewhera xwe de şerê sê hezar salî ya Rojhilat û Rojava ye. Ji bo tu binivîsî min pêşniyar kiribû, lê her hal ji kapasîteya te zêdetir e. Dîroka Heredot, Îlyada, Xwedayên Xasûk ê Sumeran Enkî pir bixwînin. Xasûkiya Atenayê

Hektor dibe mirinê. Wî wêrek dike û dişîne mirinê. Li min jî wisa kirin, lê min xwe neavêt ser mirinê. Ez jî hê nû nû ji hev derdixim “Ka ez çawa nebûm Hektor”.”Di şerê çandê yê Rojhilat û Rojava de rola min çi bû” ez hê nû dikevim ferqê.

Dema min nema, lê min dixwest ji bo jinê jî peyam bidim. Ez weke xebata romanê pêşniyar dikim. Ji bo niha bila yên girtîgehan viya çêbikin, dikarin li derdora fîgura Medya lêkolînek bikin. Ji Înannayê bê girtin û bînin çanda di Îsa de Meyrem, di Muhemmed de Ayşe û Fatma. Heta me jî bînin. Ji dîrokê ve bigirin, jina azad bidin şerkirin û derxin holê. Xebata jina azad rewşeke tirsnak e. Rewşa ku li qesran jina kurd xistinê Medya temsîl dike. Di serî de Kesîre, li gel me jî Medya hene. Romana Harpagos jî wê bê lêkolînkirin. Fermandarekî navdar e, Harpagos împaratoriya Med radestî Kîros dike. Di roja me de Şemdîn wî temsîl dike. Ev e, ew e, Harpagos, Barzanî, Talabanî...

**6’ê Tebaxa 2003’yan**

Cudahiya min ev e, li hemberî têkiliyan ez ji zarokatiya xwe ve bi guman nêz bûm, veciniqîm. Weke ku dayika min got pêk hat. Dayika min gotibû; “Bi vî halê xwe tu nikarî bi tu keçikê re bizewicî”. Ev bû şêwazê jiyana min. Piştre min bingeha viya ya teorîk jî dît. Min tu car ji çanda jin û mêrê hev bawer nekir. Çanda jin û mêrê hev gelek xetere ye. Eşqên mezin wiha dadiqurtînin? Dikujin? Madem malbat pîroz e, çima lêdan, çima dikevin qirika hev? Tiştekî ya rastî ev qas pîroz çima rê li ber zulm û qetlîameke wiha vedike? Vaye pêşketin eviya rast derdixin. Pirsgirêk îdeolojîk e. 5 hezar sal dîrokeke xerab a têkiliyên cinsiyetan heye. Vaye sosyolog hene, bila lêkolîn bikin, min ji we re gotibû, we ragihand?

Jin jî name dinivîsin, qala pirsgirêkên pir kûr dikin. Ew jî divê li ser van mijaran binivîsin. Dîroka têkiliyên cinsan ji Sumeran dest pê dike, ME’yên Înanna hene; 104 in, vaye di nav vê de her tişt hene. Çandinî, sewalkarî, xwedîkirina zarokan, yanê gelek rêgezên

jiyanê xwe dispêrin dayiksalariyê. Înanna ji Enkî re dibêje; “Te ev ji min dizîn, hemû nirxên min girtin”. Di vê derê de şerê her duyan girîng e. Di encamê de jin bi tavahî winda dike. Bûyera cinsiyetê tê rewşeke wisa ku nayê kişandin, hezkirin û hurmet wisa rihet pêk nayê, şoreş pêwîst e. Dema mirov negihê vana zewq û kefxweşiya jiyanê nabe. Mesele ne tenê mesela fizîkî, xweşikiyê ye, meseleya vekirîbûn-girtîbûnê ye; cudahiya her duyan ji hev tune ye. Her du jî dubareyî hev in, di her duyan de jî sextekarî heye. Aliyê îdeolojîk, felsefî û siyasî yê meseleya cinsiyetê heye.

Keçên me bila vana hemûyan lêkolîn bikin. Li ser navê bîranîna yên girêdayî ne, li ser navê hurmetê ez careke din vana diyar dikim. Ya rastî ez gelek li ser vê mijarê kûr bûm. Ez dikarim çend pirtûk binivîsim. Hin xeyalên min hene, lê ez naxwazim bibêjim, dibe ku şaş were fêmkirin, hûn dikarin nenivîsin. Dîdariya min bi jinê re di rewşeke xwedayî de ye. Ez ji bo vê dibêjim “Hevdîtina xwedayî”. Xeyalên min ên mezin hene. Ez nikarim weke Nazim bim. Ez helbestên ku wî ji girtîgehê nivîsandî sivik û dadixîne dibînim.

Di çanda Rojhilata Navîn de cureyên zewacên pîroz hene. Îsa û Mûsa jî jinê dadixînin. Di Meyremê de xwedawendîtiyeke nediyar heye. Em Rojhilata Navînî jinê weke Ayşe, Fatma, Rojava weke Meyrem dibînin. Çanda Meyrem ji çanda Ayşe-Fatma hîn pêşverû ye. Serdestiya çanda Rojava jî di vê derê de ye. Gotineke Ayşe heye, dibêje; “Xwedayo, li şûna te ez weke jinekê anîm dinyayê, te weke kevirekî ez bianîma”, ev gotin girîng e. Di bin zilmeke çiqas de ye ku wiha dibêje. Zehmetiya jinbûnê ew qas ferq kiriye ku, tevî ku hevsera pêxember e dibêje. Li hember viya tiştekî ku Ayşe-Fatma bikaribin bikin jî tune ye. Vaye ji bo vê şoreşa zîhniyetê pêwîst e. Bila keçik viya pêş ve bibin, kûr bikin. Ya rastî di vê mijarê de gelek tişt hene ku ez bibêjim, lê dem bi sînor e. Li ser vî esasî silavên min ji keçikan re bibêjin.

**27’ê Adara 2003’yan**

Min cewhera nameya ku PJA’yê şandî fêm kir. Min texmîn dikir ku xurt bûne. Ez jinê rast dibînim, derewa jinê tune ye. Tabî jina zana, ger nezan be wê tevlî her cure derewan bibe. Min di nirxandinên xwe yên berê de gotibû şoreşa cinsiyetê pêwîst e. Şoreşa cinsiyetê ne tenê jinê eleqedar dike. Pirsgirêka şaristaniya civaka çînîdar a 5000 hezar salî ye. Mêr, ji jinê jî xerabtir hetikî ne. Ev şoreşa zîhniyetê di heman demê de rizgariya mêr e jî. Min rastiya jinê dît. Jin hatiye xistin. Sê olên mezin, koledarî, feodalîzm û herî zêde jî kapîtalîzm jinê kirin meta. Kapîtalîzm jinê xebitandiye, kiriye meta. Her wiha şoreşeke cinsiyetê pêwîst e. Têkiliya jin û mêr pêwîst e bi mêjî were meşandin, ne bi hestan. Bi ajoyên cinsî nabe. Divê li ser bingehê zanistî were rûniştandin. Di van têkiliyan de zanist li derve nayê hiştin. Bi hestan nayê destgirtin. Zanist li derve nayê hiştin. Min ev, li ser hîmekî zanistî da rûniştandin. Divê têkiliya jin û zarok jî wiha be. Nêzikahiya ji zarok re jî divê li ser vî bingehî be. Ev, ji rizgarkirina malbat û cins jî wêdetir rizgarkirina civakê ye. Ji ber wê yekê bi hestan nabe ku were destgirtin.

Şoreşa jinê ji bo mirovahiyê wê bibe ronahiyeke biriqok. Serkeftina me ya herî mezin, di têkoşîna jinê de çêbû. Min nameya hevala Leyla Atabay a ji Çildêrana Wanê ye, ji girtîgeha Mûşê girt. Di nameya xwe ya balkêş de dibêje “Ez kêfxweş im ku ez weke jinekê hatim dinyayê”. Min berê gotina Hz. Ayşe ya ““Xwedayo, li şûna te ez weke jinekê anîm dinyayê, te weke kevirekî ez bianîma” ji we re gotibû. Hz. Ayşe viya ne tenê li hember zilma mêr, li hember lîstokên siyasî dibêje. Ger Leyla Atabay viya dibêje, ev pêşketineke gelek girîng nîşan dide. Ev, asta ku jin hatiyê nîşan dide.

Belê, tabî ku merhaleyeke girîng nîşan dide. Bi biyolojîkî jî ya ku divê em jê derxin; mêr, bûyereke piştî jinê ye. Ev pênaseyeke

zanistî ye. Li gor nivîseke zanistî; piştî 132 hezar salan wê cinsê mêr ji holê rabe. Jixwe kromozoma 'Y' kromozomeke piştre hatiye dîtin. Divê jin jî xweserbûnê bi dest bixe.

Şerê serokatıyê, şerê têkılıyên azade. Şoreşa serokatıyê, dı heman demê de şoreşa evînê ye.

Çalakıya me, çalakıyek azwerî û evînê ye

**2004**

**21'ê Çileya 2004'an**

Derbarê PJA'yê de ez vana dibêjim; di mijara PJA de xeta şehîd Bêrîtan ji bo min gelek girîng e. Ez bîranîn û xeta Bêrîtan dibêjim. Em divê jiyana şehîd Bêrîtan bikin xet. Nameyeke wê ji bo min hebû, ez ne şaş bim tek nameya wê ye. Hevaleke kûr, hêza wê ya entelektul hebûye. Radest nabe, radestî neteweperestên seretayî nebû. Ferhat ew radest dibin. Ev xetek e. Xwe ji zinar diavêje. Ev ne întîxarek e, xeteke azadiyê ye. Ne xeta reforma sosyal filan e. Reformparêzên sosyal ji viya fêm nakin. Ev, rûmeta mezin, berxwedana mezin a jinê ye. Ev, girîng e. Azadiya jinê wê jihevvebûna girêka kor a Rojhilata Navîn pêk bîne. Formuleke min a pênc hezar salan hebû. Em ji Neolîtîkê heta roja me, çanda xwedawendê rojane dikin. Ez ji viya re dibêjim "Şoreşa Cinsiyetê". Bila tevgera azadiyê jinê ya mezin jiyanî bikin. Bila sekna jinê saxlem be. Tu fikarên wan nebin. Heta dawiyê bila bixwe bawer bin. Wê ev Rojhilata Navîn çareser bike. Ez ê pêş de hevdîtinekê ji bo viya veqetînim.

**18'ê Sibata 2004'an**

Berxwedana min berxwedaneke li ser aqil û hişmendiyê ye. Weke ku hûn dibînin, ez pir xurt im. Wê demê hûn rastiya min bidin xuyakirin. Min komîteyên gelek girîng dan. Ew rêxistina banî

bû. We got Cûma û Fûat ketine komîteya zanistê. We berê wisa got, piştre jî got bûne alîgir. Tu hem ji bo komîteya zanist û hunerê têyî hilbijartin, hem jî fesadiyê pêş dixî. Hûn min çi zen dikin? Li ser navê vî gelî zanist û huner çawa tê kirin we yê wî pêş bixista. Komîteya zanist û hunerê yan tevgera fitne fesadiyê? Ez bang li komîteya zanistê dikim, ji bo gel zanist û hunerê pêş bixînin. Min got komîteya hundir û derve. Li şûna wî PKK jiyana sosyal nîqaş dike. Min şaş negot newisa, we di nav axaftinan de gotibû, dibêjin projeya jiyana sosyal newisa?

Dikarin biçin gel Barzanî û Talabanî, kî direve bila bireve.

Min hewl da keçikan perwerde bikim, zanabûna wan pêş bixim. Min qasekî berê di radyoyê de li Fatmagul Berktay guhdar kir. Bi heyecan li ser jinê diaxivî. Wekî ku hinek cewhera vê fêm kiriye, dibêje "Em têdikoşin, lê hêjîazad nabin". Pirtûka Fatmagul Berktay a Cinsiyeta Dîrokê bigirin bixwînin. Mûtleq keçên hêja hene. Ji girtîgehan jî name tên. Ji aliyê çendanî û çawaniyê ve ez wan baş dibînim.

Cewhera reformên sosyal ev e: Ger hûn dixwazin bizewicin, hûn dikarin zewaca koletiyê bikin. Ev ne ji sosyaltiyê, ne ji roformê fêm dikin. Di asta peyvê de jî nikarin viya ji hev derxin. Me berê jî tiştên wiha nîqaş kir. Bûyera Fûat, Seher hebû. Fûat qiyametê rakir. Ez ne li dijî me, ev nikarin ji hev re jin û mêrtiya rast jî bikin. Hê jî viya dikin mesele. Nikarin xwe kontrol bikin, ev qilifa wî ye.

Çaxê çi? Çaxeke tije koletî. Em ê vî çaxî derbas bikin. Em dibêjin; "Em ê şêwazê jiyaneke nû çawa derxin holê!". Di parêznameya xwe ya 5'ê gulanê de ez ê vana vebikim, hin pêwîstiyan di wê de pêş bixim. Weke peyama min, niha vana diyar bikin. Hê jî azadiya jinê fêm nekirine. Min cihê vala xeta Bêrîtan negot. Li ba me berxwedana Bêrîtan şêwazek e. Heval radest nebû, xwe ji kendal avêt. 9 keçik hebûn, govendek girê dan û bi bombeyê şehît bûn. Tenê ji bo nekevin dest wiha kirin. Ji bo me, ev hemû leheng in.

Gelek jinên berxwedêr ên bi esil ên me hene. Yên xwe şewitandine jî dîsa ji vê derê bi bîr tînim. Yên dixwazin nûjen bibin bila biçin nûjen bibin. Dixwazin biçin Ewrûpayê, biçin ku derê, bila biçin!

Ez vê ewka xwedawendiyê weke çand dibêjim. Bi zimanê magazînê nabêjim. Ev çand wê were geşkirin, zindîkirin. Mêr naxwaze fêm jî bike. Weke din jiyana azad nabe. Ew Fatmagul Berktaya ku di radyoyê de axivî ez wê diecibînim. Di paşeroja wê jinê de tiştên şoreşger hebûne. Dibe ku ji min bandor bûbe. Dibe ku bondorbûna li beramber hev çêbûbe, xwezayî ye. Hûn dikarin pirtûkên wê ji min re jî bînin. Herin pêre jî hevdîtin bikin. Hûn jî van pirtûkan bixwînin. Li ser jinê teroî, li ser jinê felsefe nû pêş dikeve. Azadiya jinê nû nû pêş dikeve, qanûnên wê hene. Dikarin bizewicin, aşiq bibin, ez tiştekî nabêjim. Malok, çanda jin û mêrê hev, her roj azadiyê dikuje. Kerxaneya derve li hundir vediguhere mala taybet. Çima nikarin azad bibin? Malok heta genên wan hikum kiriye. Fersenda min hebûya, min ê ji wê derê bigirta heta roja me bianiya, bikira pirtûk. Berktay dibêje; “Divê civînên serwerxtbûnê bên lidarxistin”, lê tenê ew jî têr nake.

Ez ê pênaseya eşqê bikim; bi sewdaserî nêzî jin an jî mêrekî nebûn, weke mirovek nêzikbûn û xurtkirin eşq e. Ji bo mêrekî xurt dikarin min mînak bigirin. Pêwîst e hêzê bidin jinê. Wisa bibêjin pêwîstiya te bi mêrekî, bi cinseltiyê heye, tiştekî pir hovane ye. Lê ev heval tiştekî pir seretayî, hov nîqaş dikin. Ev nîqaş wê bibe çanda Yeşîlçama li Tirkiyeyê. Hele jî di van şert û mercan de nîqaşkirina viya sextekarî ye. Di pêşerojê de pirsgirêka jinê wê ji meseleya neteweyî, siyasî zêdetir derkeve holê. PJA destpêkeke baş e, pêwîst e pêş bixin.

Weke ku li Efxenistanê, bêyî ku li hember çanda Hollywood a Emerîkan têk biçin, em ê feraseta, tevgera xwe ya azadiyê –di derdora Tirkiyeyê de guncaw- pêş bixin. Ya dikeve para wan, serî ji van mêran re nedanîn e. Dikarin min jî rexne bikin. Min nekarî di

hin pêvajoyên tunekirinê de wan rizgar bikim, lê ji bo azadiya wan hewldanên min ên girîng çêbûn. Bila navên weke eşq, zewaca şoreşger li viya nekin. Kî dixwaze bizewice bila bizewice. Wê demê her kes çi dike hûn ê jî heman karî bikin.

Weke meseleyeke siyasî pêwîst e viya nekin rojeva rêxistinê. Viya siyasî nekin. Weke meseleyeke cidî jî daneynin holê. Tu kes nikare bikeve pêşiya yên ku îdîaya wan a azadiyê heye. Min nexwest jinekê bi xwe ve girê bidim, exlaqa min viya ranedikir. Wê demê azadî dimire, armanca mezin dimire. Min ne xwe bi kesî ve girêda ne jî kesî bi xwe ve girê da. Exlaqa herî mezin ev e. Ev şoreşa exlaqê ya mezin e. Ez ji hemû jinan wekhev hez dikim. Bila ev gotina min şaş neyê fêmkirin. Ez wêjeya rahib, rahibetiyê nakim. Hinek dikarin –ez bibêjim bi şêwazê gundî, birjûwayê biçûk-bizewicin. Bila nerevin. Herin Wargeha Mexmûrê û weke malbatên li wê derê bin.

Kakilê jinê, kûrahiya wê ya îdeolojîk girîng e. Nasnameya jina azad wê di şexsê xwe de bidin rûniştandin. Ev, meseleya hêz û kêrhatinê ye. Pirsgirêka wan a pratîkbûnê heye. Wê xwe pêş ve bibin. Ger ên zeafên wan hebin dikarin vekişin, lê yên girêdayî jî hene, wê ew jî di xeta xwe de kûr bibin. Tabî avahiya navendî ya hiyerarşîk ji vana re asteng e. Tu dixwazî desthilatdariya mêr a bi pênc hezar salî hilweşînî. Her roj aliyekî cinawirî yê mêr derdikeve holê. Ji ber wê yekê pêwîst e her roj ji nû ve ji nû ve mêr bikujin. Jixwe ewkê wan ê partiyê heye. Rêxistinên girseyî mûtleq divê hebin. Hem dikarin bikevin komîteyan hem jî wê rêxistinên wan ên cuda yên girseyî hebin. Bi navê “Yekîtiya Jinên Azad”. Di nav xwe de wê ev navendî bibe. Di nav kongreyê de, dikarin di nav Komîteya Siyasal de bin. Jinên xurt, di nav Kongra Gel de, pêwîst e di nav hemû komîteyan de cî bigirin. Jixwe wê parastina wan a rewa hebe. Bila perwerdeyê bigirin dest. Dest bavêjin xebatên çandî yên demokratîk. Divê zehmetiyê nekişînin. Tevgera jinê, heta

yên girtîgehan de jî têde, divê rêxistinên girêdayî wan ên civaka sivîl hebin, vana pêşkêşî xizmeta civakê bikin.

**12'ê Adara 2004'an**

**8'ê adarê derbas bû, lê ez dixwazim peyameke kin bidim:**

Ez hewldana xwe ya li ser azadiya jinê mezin fikirandin û di kesayetê de kûrbûnê berdewam dikim. Ez girêdana xwe ya bi azweriya cewherî ya bi jinê re pêşkêş dikim. Min hemû pêkutiya bi tundî an jî bêtundî ya ji dîroka şaristaniyê kevntir ji hev derxist. Kî ji bo min di nav hewldanê de bin, spasiyên xwe ji wan re dikim, silav û hurmetên xwe pêşkêş dikim.

Ez diyar dikim ku jin, ewlehiya rastîn a serkeftinê ye. Li ser navê min, weke bersiva nameyên ku min navên wan bi we da nivîsandin, hûn dikarin bi rûpelekê binivîsin. Hûn dikarin ji nivîsên min ên kevn û parêznameya min feyde bigirin. Ji her kesî re mûtleqe cuda cuda binivîsin, wê bibe moral.

**17'ê Adara 2004'an**

Ez nayêm lîstokê. Îhtimal hebû ku we jî bixin vê lîstokê, hûn ji devê dîzikê xelas bûn. Lê ez weke guran im, min pêre, tavilê hîs kir. Ez neketim lîstika alîgir a sivik. Nikaribûn min bînin rewşa alîgir. Em nakevin van lîstokan. Wekî ku ez ê razêm. Ferhat pîrekê helanî revand, lê we çi kir? Ev reben in. Ya rastî bi xêra min dijîn. Ez ji bo wan ciwanan gelek xemgîn dibim. Pir bi min ve girêdayî ne. Ew qas jî bi min bawer bûbûn. Min ew qas ked da, jin jî ketin vî tiştî. Qismeke ji jinan li wê derê ne, qismek li vir. Nizanin azadî çi ye. Eger mesele mêrek be ew qas xwe li çiyan nedin. Pêwîst nîn e ji bo vê ev qas eziyet bikişînin.

Min bi destên xwe, ji bo tevgera azadiyê ya biesil a jinê xizmeta mezin kir. Ger hûn nikarin pênaseya azadiyê bikin, nêz nebin. Di van karan negerin. Ez ê bersiveke mîtolojîk bidim wan. Nirxên pir

esîl jî hene. Kedên mezin hatin dayîn. Wê têkiliya nûjen pêş bixin; ez ji viya re dibêjim “kerxane û mala taybet”, dibêjim “kerxaneyên ji Sumeran mane”. Wê min bi vana bixapînin? Azadî ne ev e! Min ev qas ked da xebatên jinê, lê fêm nekirin! Li Tirkiyeyê jî yên fêm dikin tune ne.

Azadî ji bo Tirkiyeyê jî pêwîst e. Mustefa Kemal jî fêm nakin. Çima çawa ku zewicî hema berda. Di mijara azadiya jinê de cidî bû. Ez viya dibêjim. Bila hema min weke “Ataturkparêz” nenirxînin, lê divê mirov hin rastiyan jî di cî de bibîne. Di mijarên turban (serê jinê girtin) û azadiya jinê de ji yên niha cidîtir e. Ne Tirkiyeya turbanê, ne jî Tirkiyeya mankentiyê Tirkiyeya Ataturk nîn e. Nêzikahiya min a jinê tabî hîn bi kûrahî ye. Bila tu kes min şaş pêk neyne. Min tika kiribû. Hevalên ez 25 sal in bi wan re mijûl dibim feraseta min a azadiyê fêm nakin? Min ji keçikan re negot “Îla jî werin!”. Ger tu yê ji bo azadiyê xwe bidî, wêrekiya te ya tu şer bikî hebe, tu bikaribî bişewitînî, wê demê tu yê azadiyê fêm bikî. Ez ne maceraperest im. Ez nirxên gelek bilind didim jiyanê. Tek daxwaziya min, min digot “hîn bibin, fêr bibin”. Şev û roj, odeyên xwe jî têde, min her tiştê xwe ji bo hînbûna wan veqetand. Hê jî fêm nekirine. Ji bo min a girîng, tevahîbûna madî û manewî ya mirov e. Dema ez li Sûrî bûm, bîst salan min nehişt tek zirarek jî bigihê wan.

Ez ji bo PJA’yê jî viya diyar dikim: Ez dixwazim projeyeke cidî pêş bixim. Komeke jin dikarin lêhûrbûn bikin? Ez wan li sisêyan vediqetînim: Ez ê bi vegotineke mîtolojîk vebêjim; Ya yekemîn; jinên di rêya xwedawendiyê de ne. Ya duyemîn; jinên dibin melek an jî di rêya melekbûnê de ne. Ya sêyemîn; jinên divê ji serî bên derxistin. Bi vegotineke mîtolojîk ez viya diyar dikim. Ji her komê, di navbera deh û sed de, bi tevahî herî zêde komên nêzî sêsed kesî dibin. Ger ev kom ava bibin ez dikarim bi wan re eleqeder bibim. Her sê kom jî girîng in. Em ê bi hev re mijûl bibin. Wê ew min ji rê

derxin an ez ê wan bixim rêya xwedawendiyê em ê binihêrin. Her kes wê rêya xwe di vir de bibîne. Wê bikevin rêya melekbûnê, yan min ji serî derxin? Em ê bibînin. Keçên çûne jî her hal niha şermok in.

Ez di parêznameya xwe de jina azad zelal pênase dikim. Min di parêznameya xwe de derbarê jinê de cihekî pir taybet veqetand. Ez jina azad pir berfireh vedikim. Yên din kole ne. Yên li ba Ferhat kole ne. Ger hûn jineke kole bin çi karê we li vê derê heye? Ez bi vana re mijûl nabim.

**24'ê Adara 2004'an**

Jin di bin bandorê de man. Heyfa we! Jin ji bo pêşketinê berendam in. Ez naxwazim ji vê rewşa we bawer bikim. Ez zen nakim ku hûn bikevin zeafên sivik ên jinê. Pêwîstiya wan bi kûrbûnê heye. Rexnedana xwe bidin, bibin yek, nebin amûrê her du aliyan jî. Xwedî li gelê me û nasnameya xwe derkevin. Qîma xwe bi ferasetên paşverû û klasîk neynin. Hûn ê vana binivîsin. Pêwîst bike hûn ê heval bişînin, bidin axaftin. Ferzkirina mêr wan vala derxistiye. Di vê mijarê de bila bi rûmet bin, bi nasname bin. Meseleya jinê gelek girîng e. Azadiya jinê girîng e; li Rojhilata Navîn jî, li Tirkiyeyê jî girîngiya xwe diparêze. Hûn dişopînin, turban çima ev qas tê nîqaşkirin, di bin de pirsgirêka jinê heye. Hûn ê vana bi gotinên min ên dawîn re bigihînin hev. Ez ji van hevalan re viya dibêjim; pêwîstiya we ya mezin bi azadiyê heye, jixwe we ji bo azadiyê soz dabû. Rê û rêzana xwe kûr bikin. Yên di rêya xwedawendan de bin, dixwazin mezin biafirînin, bi tiştên sivik re mijûl nabin. Ez bawer nakim ku gunehekî mezin ê tu kesî ji we hebe. Baweriya min berdewam dike. Pêwîstiya gel û herêmê bi jîrekiya we ya hestiyarî û analîtîk heye. Layiqî vana bin. Bixwe bawer bin, tevî ku qisûrên we hene ez bawer dikim hûn ê derbas bikin. Silavên xwe dişînim.

**14'ê Nîsana 2004'an**

Ya rastî zêde dem nema. Min dixwest bi sedema salvegera koça dawî ya dayika xwe çend tiştan bibêjim. Min dixwest derbarê rojbûnê de jî hin tiştan bibêjim. Lê em peyama we bigirin.

(Bi ken) Dixwazin ez nirxandina xwe ya derbarê Xwedawend, yên dibin melek û Afrodîtan de şênber, berbiçav bikim? Wê demê ez hewl bidim mîna mamosteyê Îngilîz ronî bikim. Ez pir ji mîtolojiyê hez dikim. Ez çar zimanî bi kar tînim. Zimanê mîtolojiyê, zimanê felsefê, ol û zanistê. Ji du jinên xerab Hera û Athenayê hez nakim. Ji Zeûs nefretê dikim. Athena ji aniya Zeûs hatiye afirandin. Zeûs xwedayê hîz (pûşt) e. Yanê ji aniya mêr hatiye afirandin. Hera jina Zeûs e. Ez zimanê mîtolojiyê bi kar tînim. Hera "jina çêlek", jineke fesad û pitpitok bûye. Yanê jina ku mêr ew afirandiye. Di mîtolojî û felsefeya min de ciyê vana tune ye. Li hember viya ez dibêjim "Star". Star –di zimanê Samî de Îştar, di zimanê Sumer de Înanna tê gotin, li ba me jî dibêjin ya "Ya Star"- ji dema Neolîtîkê maye. Di wateya Xweda de ye. Di mîtolojiyê de dayik Xwedawend e, jina afirîner e. Star jî ew e, hatiye bilindkirin, ez wê esas digirim. Jina ku xweşikiyê temsîl dike Afrodît e. Ne jina çêlek, yanê ne Athena. Jina melek, ya qirêjî pê nebûye, jina gel a paqij e. Di parêznameya xwe de min vana bi berfirehî vekir. Tu yê vana xweşik xweşik vebêjî.

Wê di hemû komîteyan de cî bigirin. Wê rêxistina cuda ya jinê hebe. Li her welatî jî di maneya legal de jî wê Yekîtiyên Jina Azad hebin. PJA cuda, rêxistina girseyî ya jin cuda ye. Dîsa temsîlkarên wê di Komîteya Amadekar de dibin. Sêsed kesên ku min pêşniyar kirin wê bêsînor xwe perwerde bikin. Yên biaqil û wêrek dikarin di vir de bin. Sêsed kesên min pêşniyar kirin dikarin bibin PJA. Yên din jî dikarin cî bigirin. Hûn ê bi dirêjahî vana vebêjin. Bikin weke nivîseke pênc, şeş rûpelan. Dema pêş ez ê hîn dirêj bersiv binivîsim. Parêznameyên xwe yên dawî jî ji bo wan weke rapor pêşkêş dikim. Azadî, ji nan û avê hêjatir e. Li Rojhilata Navîn

azadbûna jinê li ser bingeha jîrî, parastin û xweşikiyê, bi biharê re, ez bawer im em ê weke rojê biafirînin. Bi vê heyecanê silav û hurmetên xwe dişînim.

**30'yê Nîsana 2004'an**

Dema ez li qada Rojhilata Navîn bûm, li ba min gelek keçên hêja hebûn, lê min vana di rêya azadiyê de perwerde kir. Hûn dizanin, sed û bîst neviyên Bedirxan Beg hebûn. Yê Barzanî jî gelek ewkên wî hene. Min li qada Rojhilata Navîn ji bo yek ji wan jî xwedî bikim kedeke bêhempa xerc kir. Piştre jî gotin "Apo li wê derê harem ava kiriye" û nav bi dû min xistin. Gelek keçên li ba min bûne qehreman.

Min di parêznameya xwe de ewka zewacê danî. Hûn dizanin ew bûyera me Kesîre hebû. Min di parêznameya xwe de ew jî dahûrand. Min welatparêziyê, azadî û şer dahûrand. Heta ku têkoşîneke dijwar a azadî, welatparêzî neyê jiyîn eşq nayê jiyankirin.

...Hey mêrik, tu jiyana herî xweş dijî. Nîha jî rabûne dibêjin "Ez ê jinê li ser jinê bistînim". Vê zîhniyetê çawa qebûl dikin? Ez jî dikaribûm bizewicim. Lê min ji tu keçeke kurd re negot "were em bizewicin". Min jî dikaribû bizewicim, lê min çima nekir? Ji bo ku wê karên gelê kurd xera bibin min di hişê xwe re jî derbas nekir. Ji bo vê derfetê min jî hebûn, lê di hişê min de fikra wî jî derbas nebû. Rêhevalên min her roj di nav xwîn û xwêdanê de bin, min çawa dikaribû viya bikira? Min xort û keçên gelê xwe ji bo bibin milîtan xwedî kirin. Têkoşînê, hezkirinê, heta bigihê fizîka wan, min bi her awayî ew perwerde kirin. Viya ji PJA'yê re bibêjin. Min ev, ji bo ku azadiyê biparêzin kir. Min Xweda û Xwedawend ji bo vê dahûrand. Ez, weke rêhevalekî nêzî jinan bûm. Gel zarokên xwe ne ji bo ji wan re jinaniyê, pîrekiyê bikin, ji bo milîtaniyê dişîne. Di rojên dawîn de jî ji felaketa kuştinên namûsê dikarin wiha xelas bikin.

**5’ê Gulana 2004’an**

Ev ji zewacê jî fêm nakin. Wê parêznameya min bixwînin. Min di parêznameya xwe de eşq û zewacê vekir. Dilar jineke bûrjûwa ye. Dilar wê serê xwe bigire û here wargeha Mexmûrê yan jî gundekî. Botan wê sê mehan carekê here û were wê derê. Dîsa jina Ferhat a Îranî wê biçe vê wargehê. Ferhat jî wê sê mehan carekê here û were. Ji Cemal re bibêjin, bila sê mehan carekê destûrê bidin. Ji cejnê heta cejnê dibe. Di qadên rêxistinî û leşkerî de ev rezalet nabin. Hûn nikarin vî şêwazî di nav artêşê de rast bikin. Dikarin viya bixin tuzukê.

Şêwazekî wiha jî heye: Piştî ku Îskender di şerê Îssosê de bi ser dikeve, Darîûs dixwaze keça xwe bide Îskender. Îskender qebûl nake. Dibêje; “Ez keça te nagirim. Ev karekî ku ez dizanim e.” Îskender mirovekî pir balkêş e. Piştre deh hezar Makedonî û Persî dide zewicandin, ew bixwe jî dizewice. Hûn ê vê çîrokê jî têxin bîra wan. Dîsa di dîrokê de mînaka Napoleon heye. Napoleon mirovekî mezin e. Ger ên mîna Napoleon hebin, dibe ku Josephînên wan jî hebin, lê hûn ê weke Napoleon bin. Napoleon şervanekî baş bû.

Keçên baş hebûn. Jin, bi pêş dikeve, hin keçik pêş dikevin. Pêwîst e pêşiya vana were vekirin. Ez li Kurdistanê çanda koletiyê ya pênc hezar salan didim derbaskirin, ji hev derdixim. Hin alîkariyan didim. Çîroka pênc hezar salî ya koletiya jinê me danî holê. Ya rastî min ji bo wan ji Destana Derwêşê Evdî jî feyz girtibû û helbestek nivîsandibû. Xweş jî çêbûbû. Fersenda min çênebû, min ev neda we. Ez ji bo wan vê dibêjim: Nirxê çiyayên hûn lê ne bizanibin. Berê di mîtolojiyê de Toros û Zagros textên xweda û xwedawendan bû. Bila her kes li gor vî ruhî tevbigere. Divê hûn weke wan xwedayan xwe bilind bikin. Jixwe her yek ji we pêncî hezar mêrên we hene. Jin pêş dikeve. Jinan mîna pisîkan hindik hindik, dilop bi dilop didin û dixebitînin. Jinan anîne rewşa bilbilên bixeml. Ev, ne eşq e. Ev pir xerab e. Em li ser vê çandê lêkolîn dikin.

Pêwîst e her kes li hember vê çandê hurmetkar be. Ger jin bilind dibe hûn ê ji viya re hurmetkar bin. Tiştê ku ew ji eşqê fêm dikin, di nav du rojan de hevdu qedandin e. Weke min bikin, nekevin vê dehfikê.

Min di parêznameya xwe de gotibû "pisîka avêtine bîrê". We xwend newisa? Em li dijî hezkirinê nîn in. Bila weke min hez bikin. Ez li dijî hezkirinê nîn im. Mînaka min li holê ye. Bila bi hewldanên bi vî rengî hezkirinên xwe bilind bikin. Bi awayê din wê mehf bikin. Ji ber vê yekê min ev hemû di parêznameya xwe de vekirin. Hûn ê vana hîn bibin. Wê xwe biparêzin. Wê bibin mamosteyên hezkirinê. Çanda xweşik derxin holê. Wê nasnameyên xwe pir baş rêxistin bikin. Wê neyîniyên pênc hezar salî derbas bikin. A wê çaxê wê jin feth bike. Hûn muhtacî viya ne. Jiyana rast, tenê bi jina ku xweşikiyan feth bike dibe. Hûn tenê dikarin ji her sê 'S' yên min qal kirî xelas bibin. Yan bi seksê tevizandin, yan jî weke AKP'ê bi turbanê serî bigirin. Ev her du jî ne çareserî ne. Wê çaxê wê keçên wiha biçin. Ewka zewacê wê wiha be. Li ba şervanên leheng tiştekî wiha nabe. Viya nekin nava artêşê, wê ev, artêşê xera bike.

Min di parêznameya xwe de danî holê. Bi rengekî ku wê zirareke herî biçûk nedin partiyê bila vî karî li hev deynin. Ji Cemal re bibêjin, bila bi tuzuk an jî rêvebirnameyê rê û rêbazên vî karî, esasên wî li hev çêkin. Li yên dibin dîlê zeafên xwe, bi zanebûn berhevdaniyê dikin wê cezayên dîsîplînê bê birîn.

**12'ê Gulana 2004'an**

Ji jinan re bibêjin: wisa jiyan nabe. Barzanî û Talabanî qet we rihet dihêlin? Hezkirin wisa nabe. Bila keçikan bi kar neynin. Wê alî rexnedanên xwe bidin. Bexşandina xwe bixwazin. Bila hevdu bibexşînin. Şer û yekîtiya wan wê bi min re bibe. Vana baş vebêjin. Yan jî hûn ê bi rûreşî derbasî dîrokê bibin. Xetereyê vebêjin. Weke nameyan ji her aliyî re bişînin. Ez ji şaşiyan, li ser navê dostaniyê ji

îxanetê ditirsim. Ji ber ku komploya ecêb a 15’ê Sibatê li ser navê dostaniyê hat kirin tirsiyam, lê min ev komplo rast nirxand. Wê bi lez û bez bibin yek. Yekîtî û veqetîna wan wê bi min re bibe.

Ez paye filan pêşniyar nakim. Bila xwe bi xwe pêşniyar bikin. Ez ê heta nefesa xwe ya dawî gelê kurd biparêzim. Min navê “Parastina Gelekî” li parêznameya xwe kir. Gel bi min re girêdayî ye. Ger ji wan re bimîne kî dizane wê çi bi min bikirina? Min di parêznameya xwe de jî diyar kiribû, Xweda di Yahûda de, di Kîtab-i Muqeddes de ji bo Îsraîliyan dibêje; “Min we bi xwe re zewicand.” Ez jî bi gelê xwe re zewicîm. Ez ê vê zewaca me biparêzim. Ez şervanê namûsê me. Rûmeta jinê, nabe ku daxînin tiştekî biçûk. Nabe jin wiha bê bikaranîn. Rûmeta jinê cuda ye. Parêznameya min di çapana dinyayê de parastina jinê ye. Jina ku ji kerxaneyê derkeve jî dikare azad bibe. Dibêjin li Amedê şeş hezar jin ewk in. Em dikarin vana hemûyan jî bînin rêya rast. Wê bikevin rêya rast. Jina nexweşik tune ye. Jinên divê bên xweşik-kirin hene. Di parêznameya min de her tişt heye. Di zewaceke wiha de hezkirin û hurmet nirx nabîne. Bi jinê re wiha dostanî nabe. Ger bikaribûya wê Fatma min bixapanda. Min Fatma û Ferhat bikuşta ez ê têk biçûma. Wê bigotina hevsera xwe û birayê xwe da kuştin. Ez têk neçûm. Ji bo siyasetê jî jinê nakujim. Jixwe jin hatiye kolekirin; kole nayê kuştin, tê azadkirin.

Li Sûrî malên min hebûn. Ger min bixwesta min dikaribû bizewicîma, lê min ji bo vê newêribû. Ji bo ez rûmeta xwe biparêzim min wiha nekir. Hezkirin, eşq wiha nayê jiyankirin. Ji bo ez bikaribim bijîm divê qada azad were afriandin. Li Botanê an jî li derekî din qada azad biafirîn, eşq û hezkirinê bijî. Yan na tu yê heta binê îxanetê biçî. Di şerî de tu yê cidî bî.

**26’ê Gulana 2004’an**

Jin ev ewka desthilatdarîparêziyê baştir fêm dikin. Dema jîrekiya xwe ya hestiyarî û analîtîk digihînin hev baştir fêm dikin. Ez ji bo jinan viya dibêjim: Li hember bûyerên pêk hatine ez li vê derê şaşwaz bûm. Min got ev çawa dibe? Em gelekî êşkişandî ne. Ev hemû bûyerên pêk hatine ji we re jî ecêb nayên? Ez ji jinê re dibêjim, hûn cihê xwe rast fêm bikin. Hezkirin û eşq, têrkirina ajoyên we yên cinsî yên keyfî nîn e, hezkirin û eşq bi serkeftinê dibe.

Min ji yên me re nivîsand. Heta mirov azad nebe, mirov nikare bi destê jinekê bigire, hez bike. Pêwîst e mirov problema azadiyê bi bingeha wî ya dîrokî û civakî ve rast ji hev derxe. Heta ku azadî nebe mirov nikare bi mirovî bigihê hev. Ev felsefeya min e, lê we tiştên “ev bi viya re reviya, ew bi wiya re reviya” anî. Ez bi vana dîn û har bûm. Ev li dijraberî felsefeya min in. Ger wê wiha bin bila dest ji min berdin. Min hefteya borî gotinên Dîlek Kurt gotibûn. 40 salî ye, zarokên wê hene, lê sekna herî baş nîşan da. Feraseteke rast a hezkirinê heye. Ev, feraseteke hezkirinê ya bi rûmet û anor e. Ez jî dikaribûm bibim mêrê hinekan. Min, feraseta hezkirineke bi rûmet û anor pêş xist. Min got ez li dijî viya nîn im. Feraseta xwe ya hezkirinê min wiha pêş xist. Di yên me de çanda “em otorîteyê, pere û keçikê bi dest bixin” heye. Ev ne çanda bazarê ye? Li gel me ev nabe, em tevgereke azadiyê ne. Edî divê mirov ber bi encamê ve here. Yên aliyê min in divê zelal bibin. Yên aliyên min in wê hesabê xwe li gor vê bikin.

**9’ê Hezîrana 2004’an**

Herhal di nêz de wê PJA jî kongreya xwe li dar bixe. Bi giştî parêznameya min rapora polîtîk e. Beşa têkildarî jinan bila weke broşureke cuda ji bo kongreyê were pêşkêşkirin. Ez ji keçan re viya dibêjim: Ev îxanet, ev mêrê ketî dixwaze ewkê li ser pişta pêş bixe. Bila nedin kirin, hûn dikarin pêşiya viya bigirin.

Li çiyayê Cîloyê, li aliyê Iraqê jin dikarin parastina xwe ya rewa bigirin.

**21'ê Tîrmeha 2004'an**

Ji min re ecêb hat ku jin bêdeng mabûn. Li refên me bi deh hezaran şehadet hatine jiyankirin, kesekî fermandariya viya kiriye çawa dibe, jinekê digire direve? Bila şaş neyê fêmkirin, ez ne li dijî hezkirin û eşqê me, berevajî min rêya viya nîşan da. Aliyê civakî, siyasal, teorîk ê hezkirinê heye. Li ser vî esasî, li ser esasê îdeolojîk, polîtîk bi şertê ber bi azadiyê ve bifirin hezkirin dibe. Dema ber bi azadiyê ve birevin, rêya hezkirinê vekirî ye. Ber bi Talabanî ve çûyîn kirêtî ye, xwe dilewitînin. Têkiliyên jin û mêr ên di asta bûrjûwa de kirêt dibînim. Min deha berê jî ev gotibû. Hezkirin ger ber bi azadiyê ve çûyîn ve watedar e. Reva ber bi azadiyê ve azwerî ye. Şertê bingehîn ê hezkirinê ew e ku mirov têrî azadiyê hebe. Tu eleqeyeke kirinên vana bi min re, bi tevgera me re nabe, yên wiha bila ne nêzî min ne jî nêzî tevgera me bibin. Ev, temsîlkarên feodalîzmê ne.

Feraseta min a azadiyê diyar e. Pêwîst e mirov ji nirxên kapîtalîs, feodal re girtî be. Derbarê vana de divê bi lezgînî tedbîr bê girtin. Ya/ê li hember têkiliyên feodal, kapîtalîst û koledar derkeve azadîxwaz e. Derketina çiya çûndina hezkirinê, azadiyê ye. Yên wiha nebin ez wan qebûl nakim. Bila ji tevgera me dûr bisekinin. Bila vana nêzî min û tevgera me nekin. Pratîka vana ajantiya objektîf-sûbjektîf e, xefik e. Polîtîkaya her du aliyan li ser jinê wiha pêş ket; jinê weke mal dîtine û xwestine li serê bibin hêz. Ketine hesabê "wê bibe ya kî". Vana rêxistinê, hevdu, kariyera (pêşdeçûn) xwe weke mal dîtine. Hinek viya bi xêvikî, yên mîna Riza jî bi xasûkî kirine.

Ez azadîxwaz im, xeteke felsefîk, fîlozofîk a nirxên min ên azadiyê heye. Di eyara Boockhin, Nîetzsche de, heta xeteke min a ji wan dibihure heye. Çalakiya min a siyasî, leşkerî heye, lê

jirêderketin û berevajîkirin heye, yên xençer dikin jî hene. Xeta min a azadiyê pir xurt e. Kevneşopiya me, xeta me di mijara azadî û rêxistinbûna jinê de, di mijarên leşkerî, rêxistinî û pratîk de zelal e. Yên xurt ger rexnedan bidin li ser vî esasî dibe. Yê ku ev dikin xeta me ya azadiyê nîn e. Pêwîst e vana hemûyan bigirin lêpirsînê.

Ji bo PAJK'ê ez vana dibêjim: Roja man û nemanê ye. Li hember hiyerarşiya pênc hezar salî bila rêxistinbûna dijwar a jinê pêk bînin. Li hember îxanet û îxaneta hevkar ez helwesteke mînak hêvî dikim.

**28'ê Tîrmeha 2004'an**

Wê kordîneya navendî be? Weke model guncaw e. Yên HPG tevî rêxistinbûna wê ne, jixwe di navenda HPG'ê de jî jin hene. Ji aliyê azadiya jinê ve jî bi PAJK'ê re ne. Wê rengê xwe yên îdeolojîk bidinê. Di tiştên wiha de divê nekevin şaşiyan, afirîneriya xwe pêş bixin. Di vê mijarê de tiştên mirov ji jiyanê hîn dibin hene. Ne mimkun e ez bi rasteqîne rêxistinê bi rê ve bibim. Pêwîst e ew afirîneriya xwe bi kar bînin. Ne ku ev qas ked û rûmeta jinê heye. Di demeke ku jinê bi ser û şûn dikirin de em dixwazin derfeta azadiyê biafirînin, lê di vê pêvajoyê de çima hêza wan têr nekir?

Yeka ku min navê wê pir bi bîr dianî hebû: Saîme Aşkin. Ew jî hatibû kuştin. Ev tiştên ji bo xistina jinê ne. Manewra ne ji bo wan bêhêz bihêlin, di dest de bigirin. Ez gelek perwerdekar nêzî wan bûm. Pêwîst e bûyera jê re azadî dibêjin fêm bikin. Hewce ye azadiya jinê baş were fêmkirin. NATO'yê jî li Rojhilata Navîn azadiya jinê xistiye rojeva xwe. Ez weke cinseltiya sivik nagirim dest. Mêrê nexweş, jina nexweş; belkî ji sedî yek jî nêzî azadiyê nebûne. Ez dizanim ku ji sedî not û neh jin û mêrên nexweş in, lê em ê di azadiyê de israr bikin.

Min li hember dogmatîzma her sê olên mezin ên ji bo jinê şer da destpêkirin, min xwest hilweşînim. Me perdeya ji mîtolojiya Sumer heta roja me li ser jinê hatiye afirandin rakir. Li gor min ev erênî bûn. Ez bawer dikim ku jina azad bi rûmet e. Yan jî xweşika

dinyayê be jî, keça padîşê be jî heram e. Mirov tenezulî jineke wiha nake. Yên ber bi azadiyê ve pêngavan davêjin hene, lê pêşiya wan tê girtin. Rezîlê Ferhat jî vê zewacê ferz dike. Kirina wî bûyereke siyasî ye. Di salên 80'yî de vî mirovî di bûyera Fatmayê de aliyê wê girt. Qaşo kirinên min pûç dike. Bi Kesîre re têkiliyeke wî ya wiha hebû. Li gor wî ez bibêjim fobiyeke (tirseke) kektiyê, bibêjim hesûdiya biratiyê, ev pir balkêş e, rewşeke psîkolojîk e. Lê sedemên wî yên siyasî jî hene. Xwe avêtiye hembêza Talabanî, ev hewldana pûçkirina min e.

Behsa jiyana nûjen dikin. Ev têgîneke mirov sor dike; têgîneke li hember min tê pêşxistin. Tu eleqeya viya bi jiyana sosyal re tune ye. Awayekî berevajîkirî yê kuştinên namûsê ye. Ev, tiştekî weke rêbirî û eşqiyayî ye. Di wateya feodal, bûrjûwa de be jî nirxeke wî ya etîk tune ye. Mînaka yan bireve daholvan, yan jî zirnevan e. Em di azadiyê de bi israr in. Jina ku bi xwe bawer be wê meşa xwe dewam bike. Bûyereke ji çanda piyasayê jî dibihure. Civaka Rojhilata Navîn, piştî pênc hezar salî wê ewka jinê derxe plana pêş. Nêzikahiyeke emperyalîzmê jî wiha heye. Li ser azadiya jinê feraseta bûrjûwa tê ferzkirin. Bi çanda Hollywood ev tê ferzkirin. Ya me jî li gor me feraseta me ya azadiyê heye.

Ez ji jinan re dibêjim: Xeterî mezin e, hûn çima nabînin? We çima van tiştên berê xwe dane jinê nedît? Hûn ji ser ve, nikarin kûrahiyê bibînin. Mesele ne tenê hebûn an tunebûna mêrekî ye, mesele mirov xwedî azadî be û bi rûmet be. Yê mayî ne girîng e.

Bila tiştên şexsî nekin mesele. Divê mirov giştî rizgar bike. Hûn ê viya ji bo Kordînasyona Jinê weke name bişînin.

**29'ê Êlûna 2004'an**

PAJK dikare weke Yekîneyên Jinên Azad xwe birêxistin bike. Ez ê paşê bi berfirehî viya vebikim. Bila di nav komîteyan de cî bigirin. Ewlehiya xwe bigirin. Xwe biparêzin.

Ez ji bo jinan viya dibêjim: Baweriya min bi cewhera we heye. Hêvîdar im hûn ê nekevin kêmasiyên pratîk. Li ser van esasan ez silavên xwe ji hemûyan re dişînim. Li Sêrtê yekê tiştekî întîxarwarî kiriye û şehîd ketiye. Ez tiştên bi vî rengî qebûl nakim.

**20'ê Cotmeha 2004'an**

Wisa tê fêmkirin ku di mijara modela rêxistinî de tengasiyê dikşînin. Ez hema viya bibêjim: Dikarin di bi navê Koma Jinên Bilind de tevbigerin. Tirkiya wî Yüce Kadın Topluluğu dibe. Dikarin di bin vî navî de tevbigerin. Ez weke pêşniyar pêşkêş dikim. Bila nîqaşan berdewam bikin, li ser naveroka îdeolojîk û avahîbûnê nîqaş bikin. Ez bawer im tenê yekîtî an jî partî nabe. Bila kûr bibin. Cewher pir girîng e. Revanadina van keçan ne tenê têrkirina ajoyan e. Bi birçîbûna cinselî nayê ravekirin. Ev, azadiya jinê tune dike. Neyên lîstoka yên mîna Osman. Ez dizanim sebra we, fedakariya we, wêrekiya we mezin e, bêdawî ye. Ez bim jî bi vana nexapin. Ji bo we azadî ji nan û avê jî girîngtir e. Bila nekevin çalakiyên întîxarî. Li Sêrtê jinekê çalakî danî. Ez viya rast nabînim. Bila bûyerên mîna vê nebin.

Bila li herêmên bi ewle xebatên demokratîk, çandî bikin. Paradîgmaya nû nikaribin têbigihîjin, hema fêm nekin ne sûc e. Kêmasiyeke pir jî mezin nîn e. Ez jî encax piştî ev qas tişt gihîştim viya. Ez we weke keçên biaqil û jîr dibînim. Ez hêvî dikim ku hûn bi lêhûrbûneke bi lez bikevin paradîgmaya nû.

Ez ê niha ji bo jinan ji pirtûka I. Wallerstein ya bi navê Kapîtalîzma Dîrokî, ji rûpela 83. Hevokekê bixwînim, girîng e, ez dixwazim hûn heman binivîsin: “Weke sîstemek dîrokî kapîtalîzm hilweşandiye an jî veguherandiye, li gor sîstemên dîrokî yên cur be cur ên berê pêşketinê temsîl dike, hema yekser ne rast e. Ez dema viya dinivîsim jî diricifim. Xemgîn im ku ez bi hemû yên di dirûvê min de re heman duayan dikim.” Yek jî di heman rûpelî de paragrafa jor jî girîng e. Hûn ê bixwînin. Di wê derê de jî dibêje “Ez

ji wê xezebê ditirsim ku bi hemû yên mîna xwe re heman tiştî difikirim”. Hê beriya ku ez vana bixwînim jî min gotibû “Marksîzm, mezhebeke kapîtalîzmê ye”. Yekî mîna Wallersteîn di çapana dinyayê de zanyarekî sosyal ê navdar e vana dibêje. Fikirdarên weke Bookchin, Wallerstein girîng in. Vana bixwînin. Hûn wêrek in, fedakar in, ez di şexsê we de hemû hevalan silav dikim. Ez bawer dikim ku hûn ê li wan çiyayên azadiyê yên bi heybet ya herî xweş biafirînin. Her jiyanên li derveyî vê ji mirinê xerabtir in. Bixwe bawer bin.

**12’ê Berfanbara 2004’an**

Ez ji bo we hemûyan dibêjim. An azadî an mirin! Azadiya jinê bingeha hemû azadiyan e; bingeha azadiyên civakî ye. Koletiya jinê jî bingeha hemû koletiyan e. Hûn viya qebûl dikin, nakin? Yên azadbûnê qebûl dikin divê li ser vî esasî têkoşînê bidin ber çav. Hemû bingehên azadiyên civakê, di azadiya jinê re derbas dibe. Cewhera rizgariya çînî, etnîkî û olî ye. Ez wiha dinihêrim. Wisa tê fêmkirin ku dil û mêjiyê we yê mêr xesp kiriye heye. Hûn diwêrin desthilatiya di ruh û mêjiyê xwe de jê paqij bikin bavêjin an na? Ger ji bo desthilatiya mêr a di hundirê we de hilweşinîn hûn xwe didin berê hûn ê hevgirtî bin. Hat fêmkirin ku di yên direvin de ev cewher tune ye.

Ez ê mijareke lêkolînê bidim jinê: Jina azad kî ye û divê çawa bijî? Wê rexneyî û rexnedanî nêzikahiya ji bo bûyera koletiyê bigirin dest. Di giştî de û di xweseriya me de çawa hat jiyankirin? Axaftinên min hene, parêznameyên min hene. Tabî di mijara jinê de divê lîteratur jî di ber çav re bê derbaskirin. Zêdetir jî wê têkoşîna xwe pênase bikin. Ev, mijareke jiyanî ye. Li Ewrûpayê tevgerên femînîst ên yekemîn, duyemîn û sêyemîn hene. Têkoşîna herî girîng a du sed salên dawîn e. Li Rojhilata Navîn jin mirî ye. Jiyana wê bi qasî mirîşk, bi qasî çêlekek hêja ye. Ji bo bi lehengî

bijîn, bûyera jin û jiyanê divê bi kok bigirin dest. Ev, di nav hev de ye.

Osman, mirovê xêtik, beredayî. Ji bo jinekê vana wê deh welat bifiroşin. Rewşa jinên ku çûn jî ev e. Lê bi sedan jî tên. Têkoşîna azadiyê wiha nabe. Wiha li şeref û rûmetê xwedî nayê derkevin. Mêrê serwer, lêdan, tundî, çêr û xeber û şer e. Ger hûn viya qebûl dikin tiştekî ku ez bibêjim tune ye. Me dît, rewşa qaşo fermandarên bîst salan li holê ye. Azadiya jinê têkoşîneke pir mezin li ber çav girtin e. Ev hem ji wan re, hem ji avahiya jinên li Tirkiyeyê, heta ji bo tevgerên jinê yên dinyayê re bersiva min e. Ez hewl didim di jiyana xwe de viya pratîk bikim.

Min got “kuştina mêr”. Derbarê viya de dahûrandinên min hene. Ya rastî pêwîst e mirov peyamekê jî bide hevalên mêr: ew jî “divê mirov bi jinê re çawa jiyan bike” ji hev derxin. Hûn çanda Hollywood dizanin. Ji bo Gilgamêş ji Tirkiyeyê li jinê digerin. Ger em ji sosyalîzmê bawer bin, ji civakparêziyê bawer bin, “Feraseta me ya estetîk-xweşikî çi ye, di civakê de cihê tevgera jinê çi ye” viya di şexsiyetên xwe de zelal bikin. Di pirtûkê de divê hem rexneyî, hem rexnedanî vana bigirin dest. Viya hem ji bo jinên li Ewrûpayê, hem jî Tirkiyeyê ragihînin.

Divê qet neyê jibîrkirin jiyana bi wate û bi şeref bi jinêre zanebûn û bilindiya mezin dixwaze. Kesên xwedî îdaya evîna mezinin, divê her kêlî bibîrbînin ku, rêya pêkanîna vê di bilindiya zanebûna vê re derbas dibe. Şêweyên din îxaneta evînê û xizmeta koletiyêye. Bêyî gîhana heqîqeta civakî, gîhana evînê nabe

**2005**

**23’ê Sibata 2005’an**

Têkiliyên PAJK û PKK ‘ê divê di tuzukê de çawa bin li serê nîqaş kirine. Wê hebûna xwe biparêzin. Feydeya xwe heye ku PAJK weke hêza îdeolojîk bimîne. Li dijî mêr hê pir rêya wan heye. Ger dirust bin wê ev pêş bikevin. Lêhûrbûn li ser Îdeolojiya Rizgariya Jinê dibe, ya min tenê pêşniyar e, ez ji wan re dihêlim.

Wê pirtûkê dê pêş bixînin. Ez viya watedar dibînim, bila zêde baweriya xwe bi mêr neynin. Serxwebûna xwe wê jin bixwe biparêze. Bila ewlehiya xwe bigirin. Pêwîst e mirov ji azadiya jinê netirse. Jin, divê namûsa xwe ew bixwe biparêze, wê jin bibe miroveke ku xwe bi xwe diparêze. Ez wiha bi jinê re rêheval im. Wî aqilsivikî nivîsandiye, gotiye; “Ocalan wiha bûye, nizanim çawa bûye”. Ew tiştê cins ê qabe, çor çîrok e.

Min bi jinê re rêhevaltiyeke pir bi heybet kir, hevaltiyeke min a pir xurt bi jinê re heye. Ev, meseleyeke hêz û baweriyê ye. Mêrên wiha hebin ew jî dikarin alîkar bibin. Ez wiha bersivê didim keda ji bo min a rêhevalên xwe yên jin. Ez hurmeta ji dayika xwe re wiha didim. Gelek rêhevalên min ên jin ku ji bo min xwe şewitandin hebûn. Ez wiha bersivê didim bîranîna wan. Jinên weke ajanan disekinîn hebûn. Ez ê şerê xwe li hember ên dixwazin min bi kar bînin jî bidim. Min çawa ji bo Fûat wana pêşniyar kir, ger diaxivin ez ji bo jinan jî pêşniyar dikim: Wê her hefte yek derkeve biaxive. Bila bi erebî, kurdî, farisî, bi zimanên cuda axaftinên jinê yên heftane dest pê bikin. Bila pişta xwe bidin min û şîroveyên xwe jî tevlî bikin. Bila pexşan (meqale) jî binivîsin. Wê her hefte derkevin biaxivin.

Koma Jinên Bilind wê bi awayê Konseyeke Rêvebirinê bibe. Wê bibe rêxistina banî. Dezgeheke îdeolojîk, di rizgariya jinê de divê bibin dezgeheke îdeolojîk. PAJK bi vî awayî dikare bimîne. Bila li ser Îdeolojiya Rizgariya Jinê kûr bibin, lê di nav vê avahiya îdeolojîk de divê kesên bi xwe bawer bimînin. Ez ji doza jinê ya

mezin bawer dikim. Ji ber vê yekê kesên meraqdarê, miriyê azadî û rûmeta xwe ne, yên bixwe bawer wê cî bigirin. Problemên weke “Di nav de, li der ve” divê ji xwe re nekin mesele. Ya esas cewher e, cehwer girîng e, lê şekil jî girîng e. Hemû dikevin nav Koma Jinên Bilind. Di nav Kongra-Gel de Kongra-Gel dibe. Wê PAJK bibe rêxistina îdeolojîk. 300-400 kes in, lê ew bixwe dizanin. Ez tenê pêşniyar dikim. Doza jinê girîng e, her hal rêhevalên jin ên hevgirtî hene.

Bi sedema 8’ê adarê ez çend tiştan diyar bikim: Ez dilêriya, lehengiya jinê dizanim. Her hal Şemdîn jî pirtûkek nivîsandiye.

Hemû jin ên min in û ez yê hemû jinan im. Ez bersiv didim wî, ez jinan weke malê mêr nabînim. Ez li dijî pîrek-kirina jinê me. Ev di parêznameya min de hene, ez bi bîr dixim. Di vê mijarê de di nav PKK’ê de şerekî dijwar hat meşandin. Hûn ê nêrînên min ên di parêznameyan de li hev çêkin û bidin. Ez ji azadî û rûmeta jinan bawer im, parêzvanekî viya yê jêneger im. Olîver Kontry meqaleyekê nivîsandibû. Di mijara “Jinê di ku derê de winda kir” cî dabû nêrînin min. Bi wî re hê têkilî hene?

Jin, kîngê bi îdeolojîkî hat dîlgirtin? Çanda xwedawendê li ser van axan dest pê kiribû. Xwedayekî bi navê Enkî hebû, di bûyera Enkî û Îştarê de, di wê derê de şerekî mîtolojîk ê pir mezin heye. Ez ê bînim Konfederalîzma Demokratîk. Çandeke jinê ya bi 5-6 hezar salî heye. Mêr, şerekî mezin vedike. Çanda civaka dayik, li hember hiyerarşiyê têkçûneke kûr dijî. Ev, heta roja me tê. Li wê derê çandeke ku jin afirandiye heye. Mêr, li hember wê çandê şerekî dide destpêkirin. Di wî şerî de çanda civaka dayikê, bi derketina hiyerarşiyê re li wê derê têkçûneke tirsnak dibîne. Di pirtûka “Dîrok di Sumeran de Dest pê Dike” de hatiye vegotin. Ev bûyer, di salên 5000-4000 B.Z. de pêk tên. Şerekî, berberiyeke îdeolojîk heye. Bi mîtolojîkî tê vegotin. Ev, heta Zeûs û Herayê, heta Misrê diçe. Piştre olên yekxwedayî di asteke pir tirsnak de koletiya jinê

pêş dixin. Çaxekî xwedawendan hebû, lê hemû taybetiyên Xwedayê roja me mêranî ne. Ez li dijî kolekirina jinê derdikevim. We wê pirtûkê neanî. Pirtûka Fatmagul Berktay a bi navê “Li Hember Olên Yekxwedayî Jin”, ew jin lêkolînên baş dike. Di derketina felsefeyê de jî Yewnan bi Zagros re têkilî danîne. Bi sedema 8’ê adarê hûn ê van gotinên min weke peyam li hev çêbikin.

**9’ê Adara 2005’an**

Partî, rêxistina îdeolojiyek, zîhniyetekê ne. Nabêje “Em bibin dewlet”. Zîhniyet û fikra demokrasiyê bi rêxistin dike, pirsgirêkan nîqaş dike, kadroyên hilbijartî digihîne, xebatên akademîk dike. Dikarin Akademî ava bikin, lijneyên rêveberî yên xwe hilbijêrin. Kadroyên li pêş tên divê mirov weke hêzeke bi awayê “dewletê” nebîne. Nasandina, pênaseya giştî ev e. Ya girîng; ew jin û mêrên xurt, ên bikaribin têbikoşin, ji aliyê îdeolojiyê ve gihîştî û li hember derve jî bikaribin xwe îfade bikin derxistina holê, xwedîkirin e. Gotinên min ên din jî hene, parêznameyên min hene, ev hemû raporên min in, wê pêşkêşî kongreyê bikin. Lijneyek wê vana li hev deyne, çêke û pêşkêşî kongreyê bike.

**16’ê Adara 2005’an**

Ez ê şiyariyê bidim keçên me. Jinên me di vê mijarê de pêwîst e pir şiyar bin. Fersendeke pênc hezar salî hatiye bidestxistin. Ji bo her yek ji we, ji bo we hemûyan her yek qesrek jî bidin tuf bikin rûyê wan. Bila keçik qiyametê rakin. Dixwazin dîsa we têxin nav cendereyê, zordestiyê. Li ser jinan lîstokeke mezin heye. Her kes ji çiyê de dakeve jî, heta ku aştiyeke wan a bi rûmet pêk were wê têbikoşin, danekevin. Hûn berxwedana Bêrîtan dizanin. Hûn dizanin ji Dersimê bû. Dema li qeraxa kendal e pêşmerge bang dikin dibêjin; “Were em te nakujin”. Lê ew, ji bo radest nebe xwe ji kendal ve davêje. Wê xeta Bêrîtan bişopînin. Ez neferekî vê xetê me. Heta ku aştiyeke bi rûmet were wê vê xetê berdewam bikin.

Rezîlê Ferhat çû, hûn dizanin, lê jinên me birûmet in. Ez bawer dikim ku keçên me yên pir birûmet hene.

Şemdîn jî pirtûk nivîsandiye, rezîl! Belê, hemû jin ên min in. Em ê jinên me nekin pîrek. Ez ê ew jinên ku wan kirine pîrek jî ji dest wan bigirim. Hemû yên me ne, em bêsînor ên hevdu ne; eşq ev e. Ez vana ne di maneya mulkiyetê de, weke ruh dibêjim. Ez rûyê tu kesî ji wan nabînim, li em bi wan re wiha bi hev ve girêdayî ne. Yek jî wêneyekî "jina di hemamê de" çêkiriye. Firotiye bi du milyarî. Selîm jî tiştên mîna vana nivîsandibû. Bersiva me ev e: Çanda xwedawendê heye, ev nêzikahiyên destanî ne. Keda wan heye. Hûn diyalogên Înanna bi Xweda Enkî re dizanin. Jinên me bilind in; em kurê wan, aşiqê wan û yarê wan in. Ev ne bi bedenî, girêdana ruhî, fikrî ye. Di vê derê de girêdana ruhî girîng e.

**4'ê Gulana 2005'an**

Kûrûltaya Jina Azad hat lidarxistin? Ev, avabûna Koma Jinên Bilind bû? Kongreya girseyî ya jinan e. Kûrûltaya jina zana. Hem min hevserokatî pêşniyar kiribû. Di nav giştî de dibe, lê wê xwesertiya wan jî hebe. Pirsgirêka jînê pirsgirêkeke di bingeha hemû pirsgirêkan de ye. Ger çalakî û rêxistina wê pêş bikeve wê asta aştiya giştî û rêxistinbûna wê jî pêş bikeve. Di vê çarçoveyê de ez serkeftinê dixwazim.

Konfederalîzma jinê pêwîst nîn e. Di nav avahiya giştî de dibe, lê bila xweseriya xwe biparêzin. Jixwe lingê wan ê girseyê jî hebû. Ez ji jinê bawer im. Di vê mijarê de asteke nêrînê ya min a pir cidî heye, dîtinên min nû ne. Di min de hinek jî bermahiya îdeolojiya mêrê desthilatdar tune ye, min ev hilweşand. Ger viya fêm bikin ez ê tenê ji bo wan li çepikan bidim û wê ew bi ser bikevin. Ez bi jina jihevdeketî re eleqedar nabim. Ez jinê weke tişta mêtiyê, tişta cins, tişta zar û zêç nabînim. Bi sedsalan e ev wiha tê kirin. Bi teorîkî jî ji Eflatûn û vir ve ev kirin. Em ji bo kesayeta cewherî ya jinê wêrekiyê

dikin. Li ser esasên bi civakê re hevnasîn, ji mêr hesab pirsîn, dîdariya bi jiyanê re ez kesayeta jinê nas dikim.
Parvekirina jiyana wekhev û azad bi jinê re bi gengazî zanîna heqîqeta civakî ya beramberî hevdu pêwîst dike. Evîna rast encax di dengeya hêza heqîqeta civakî ya beramberî hevdû de were jiyankirin

## 2006

**22'yê Sibata 2006'an**

### BI SEDEMA 8'Ê ADARÊ ROJA JINÊN KEDKAR Ê DINYAYÊ JI BORÊHEVALÊN JIN Û DOSTAN

Ez vê dîdariya we ya ku îfadeya derketina holê ya hêza cewherî ya jinê silav dikim, di şexsê Viyan SORAN de, li ber bîranîna yên bi hewldanên bi esîl, bi kedên mezin têkoşîna demokrasî û azadiyê dane û em ji nû ve afirandine bi hurmet bejna xwe ditewînim.

Azadiya jinê, dîreka herî bingehîn a têkoşîna me ya azadiyê ye. Ji bo jin bigihê azadiyê xebatên min heta niha kirine tên zanîn. Li Rojhilata Navîn xebata min a destanî, ya derbarê azadiya jinê de ye. Li gor min azadiya jinê ji xebatên niştiman û rizgariya kedê pir li pêş tê. Ji ber ku jin, cins, netew, çîna destpêkê û bi kûrahî hatiye eciqandin a paşverûtî û koledariyê ye. Lewre jî azadiya jinê têkoşîneke pir mezin li ber çav girtin e.

Em di nav têkoşîneke zehmet lê ew qas jî birûmet de ne. Bêguman em ew qas jî rihet negihîştin van rojan. Bi hêza ku min ji tîbûna mezin a azadiyê girtî min xwe da pirsgirêkê. Min gelek dahûrandin, diyalog û axaftinên bi kûrahî kirin. Em divê rê û rêzana

xwe kûr bikin; em çiqas bi perspektîfa “bi civakê re hevnasîn, ji mêr hesap pirsîn û dîdariya jiyanê” bimeşin wê serketin ew qas bi me re be. Ji bo azad bibin divê jin di Îdeolojiya Rizgariya Jinê de kûr bibin, weke hêzeke îdeolojîk hebin. Li hember mêr hê rêyeke dûdirêj heye divê ku bimeşin, zêde bi mêr baweriya xwe neynin. Wê jin serxwebûna xwe biparêze. Pêwîst e mirov ji azadiya jinê netirse. Rêhevaltiya min bi jinê re wiha ye. Min bi jinan re rêhevaltiyeke bi heybet kir, hevaltiyeke min a pir xurt bi jinê re heye. Ev meseleyeke hêz û baweriyê ye. Keda rêhevalên jin li ser min çêbû, ez ji bo wan wiha bersiv didim. Heqîqeteke herî girîng a ku ez dixwazim ew bizanibin; ew bi qasî ku çarenûsa şer jî aştiyê ji diyar bikin divê xurt bin.

Ez xwe weke karkerê hezkirinê didim nasandin. Ez ji bo we dijîm. Hesretên we egera, hinceta min a jiyanê ye, ez bi we re me. DINYAYEKE AZAD WÊ BÊ BIDESTXISTIN HEYE. JIYANEKE AZAD A BÊ BIDESTXISTIN HEYE. Tu car nekevin nav têkiliyên sivik û bênirx ku wateyê nadin êşan. Hemû têkiliyên we divê ji êşan hatibin dawerivandin, mezin û watedar û bi nirxa hezkirinê bin. Dogmatîk nebin, lê tu car bêrêgez jî nebin.

Min ji bo we hezkirineke pir mezin amade kiribû û xwest pêşkêş bikim. Bi giranî, mezin li ser bisekinin, mûtleq bigihîjinê. Bi baweriya bi hêza xwe ya cewherî, bi sekna xwe ya fikrî û çalakî ya li gor ruhê demê em divê ji pêvajoyê re bibin bersiv.

Bi wê baweriya ku wê bigihên ew jina xurt a rojekê mûtleq mêrê paşverû û zordest bînin rê, ez daxwaz dikim ku hûn ê têkoşîna xwe li gor ruhê demê bilind bikin. Silav û hurmetên xwe pêşkêş dikim.

**31’ê Adara 2006’an**

Bi piranî name ji girtîgehan in. Mesela min ji Aysel Dogan û ji yek du hevalan name girtin. Heval dikarin ji min re name binivîsin.

Ez bi van nameyan kêfxweş dibim. Hûn ê silavên min ji hevalên name dinivîsin re bibêjin. Bi hinceta ku di nameyan de pesnê min didin sansurê datînin ser. Bi hevokekê didin. Pêwîstî bi viya tune ye, bi vî awayî em xwe bi xwe sansur dikin. Pêwîstiya min bi pesindanê tune ye. Heta peyva “birêz” jî dikin pirsgirêk, doz vedikin. Hewce nîn e bibêjin “birêz” jî. Hevalên ku name dinivîsin dikarin weke “Hevalê Öcalan” binivîsin. Bi naverok jî hewcedariya pesindana min nîn e. Heval derbarê mijarên felsefîk, wêjeyî, civakî, xweza û hawirdorê bi berfirehî, kûrahî dikarin binivîsin. Min ev, ji dadgeriya înfazê bi nivîskî pirsî. Li gor bersivê em ê bikaribin li ser van mijaran binivîsin. Heval dikarin di van mijaran de binivîsin. Di vê navberê de, bi vê sedemê ji biçûkan heta mezinan ji her kesên ku ji sala 2000’an ve ji min re name dinivîsin re silav, hezkirin û hurmetên xwe pêşkêş dikim. Ez rojbûna xwe ya 4’ê nîsana 2006’an diyarî hemû jinan û bi taybetî dayikan dikim.

**14’ê Hezîrana 2006’an**

Min berê jî gotibû, ez dem bi dem ji girtîgehan, bi taybetî jî ji hevalên jin nameyan digirim. Di van nameyan de nirxandinên xweş jî hene, yên behsa pirsgirêkan dikin û gilî û gazinan tînin ziman jî hene. Belkî hin hevalên jin difikirin ku temenê wan ê zewac û zarokanînê derbas bûye. Rizgariyê di xwe radestkirina mêrekî reben de dibînin. Tu cudahiya viya tune ye ku xwe bavêjin hembêza şêrekî. Wê bi vî awayî azad bibin û gel azad bikin? Ne hêsan e, şekilgirtineke pênc hezar salî heye. Jiyana azad, berevajiyê viya kirin e. Bila bi rengekî azad, birûmet û xurt bi mêr re têkilî deynin. Min berli ser jinên me nirxandinên pir dirêj kirin. Bila wan bixwînin, li ser wê mijarê xwe pêş bixin. Di mijara jinê de ez gelek serwer im. Marksîzm jî lîberalîzm jî pirsgirêka jinê çawa digirin dest baş dizanim û min rexneya wî jî kiribû. Di pirtûka A. Catharne McKînnon a bi navê “Ber bi Teoriya Dewleteke Femînîst

ve" de jî derbarê destgirtina Marksizm û lîberalîzmê ya pirsgirêka jinê de pirsgirêk û rexne hene. Di vê pirtûkê de jî heman fikrên berê jî li ser lêhûrbûnên min çêbûne û ez fikirîme hene.

Ji rakirina sîstema hevserokatiyê re teqez na. Di hiqûqê de du têgînên weke de facto (fiîlî) û de juere (qanûnî) hene. Ger pir zorê dide ne li ser qanûnan, bila fiîlî (de facto) bê meşandin. Weke min got, dikarin fiîlî bimeşînin. Jinek û mêrek divê dîsa bi rê ve bibin. Ger îla kesek be jî bila jin be. Jinên me viya heq nakin? Pênc hezar sal in sîstema bi desthilatdariya mêr berdewam dike. Derbaskirina viya belkî ne rihet e, lê em di heman demê de têkoşîna azadbûna jinê jî didin.

Nêzikahiya ekolojîk, azadiya jinê, ekonomiya komê, civakê. Ji bo azadiya jinê; azadiya cins a jinê, dîsa afirandina mêrê azad û jina azad. Ji bo aboriya civakê jî ez dikarim viya bibêjim: ez ne di wateya sosyalîzma reel ne jî kapîtalîzmê de digirim dest. Sabanci jî komek e, aboriya gund jî komeke aborî ye.

Bila jin avahiya xwe ya xweser biparêzin, jixwe rêxistinbûna wan a cuda heye, lê divê di bin banê Sîstema Komele de, di nav tevahîbûna wê de tevbigerin, hereket bikin. Ji bo jin, ciwan û hemû beşan, ji dost û hevalan re, ji her kesî re silav û hurmet.

**8'ê Mijdara 2006'an**

Mafên gel ên çandî, civakî û siyasî di çarçoveya krîterên YE de divê bigirin bin ewlehiyê. Mafên çandî, weke mînak; perwerdeya bi zimanê zikmakî di asteke jiyanî de girîng e. Ji ber vê yekê ez dijberî zewacê me jî. Ez naxwazim we û jinê me bigirin, lê ez tu car nafikirim zarokeke min hebe û ez nikaribim bi çanda xwe xwedî bikim. Ev ji min re weke bêrûmetî tê. Hûn ê nikaribin navê xwe bidin zarokê xwe, bi zimanê xwe nikaribin biaxivin. Ger wê nikaribe bi zimanê xwe perwerde bibîne bila qet tune be baştir e. Ji ber vê yekê ez nikarim zewacên wiha, tiştên weke zarokan bifikirin,

nefikirîm jî. Ji ber vê yekê dilê min ji zewacê dixele. Bila jinên me bi min re nexeyîdin. Di vê xalê de, we jî berê xwendibûye, di salên Lîseya Kadastroya Tapûyê de mamosteyekî min ê wêjeyê yê serbaz hebû. Ji dibistana leşkerî dihat û ders dida me. Min di dersa wî de kompozîsyonekê nivîsandibû. Min ev fikrên xwe cara yekê di wê kompozîsyonê de anîbû ziman. Sernavê kompozîsyona min wiha bû; "Tu Zarokê Min ê Tu Car Neyê Dinyayê yî". Mamosteyê min ê wêjeyê reqema deh dabû vê kompozîsyona min. Pir ji min hez dikir. Min her tim ji dersa wî reqema deh digirt. Mirov nikaribe bi zimanê xwe biaxive, nikaribe bi dilê xwe nav li zarokê xwe bike, ev rewşeke çiqas bêrûmetî ye, rewşenbîrên tirk hinek bi empatiyê divê fêm bikin. Dema empatiyê deynin wê fêm bikin ku çiqas zehmet e.

**15'ê Mijdara 2006'an**

Pirsgirêka jinê wisa tenê bi derxistina kovareke femînîst nayê çareserkirin, biserxisin. Pêwîst e mirov zêdetir bixebite. Bîst û çar saetên xwe divê bidin van xebatan.

Behs dikirin ku wê rojnameyeke nû bê derxistin, navê wê dibe ku "Komuna Azad" be. Her hal Yuksel xebatên xwe yên li ser rojnameyê berdewam dike. Bi hezaran heval hene ji girtîgehan derketine. Rojname dikare cî bide hevalên dikarin li ser fikra me binivîsin. Pêwîst e ji van hevalan feyde bê girtin. Hevalên ji koma aştiyê jî dikarin tevkarî, alîkariyê bidin.

**6'ê Berfanbara 2006'an**

Ez dixwazim li ser mijara jinê jî bisekinim, ev mijareke girîng e. Ez dixwazim ji bo hemû jinan, keçan, tevahî mêrên demokrat û dirust wisa bibêjim: Bila rêxistinbûna xwe di çarçoveya me diyar kirî de berdewam bikin. Lêkolîneke di çapanê dinyayê de hatî kirin gotinên min ên derbarê jinê de erê dike. Li Êlihê, li heremê întîxarên jinê hene. Ji bo pêşî li întîxaran bigirin divê bixebitin. Ez ji sedî notê têkiliyên jin û mêran weke destavêtin dibînim. Di

bingeha vana de têkiliyên pir kirêt hene. Ez dijberî eşq û zewacê nîn im. Dibe ku di eşq û zewacê de ajoyên xurt ên bi hêz û qerîze hebin. Ev normal in, em nikarin vana înkar bikin.

Mijara ku ez dijberî wê me; ev çanda destavêtinê ye. Beriya zewacê, heta piştî zewicandinê gelek bûyerên destavêtinê tên jiyankirin. Dema mirov bi aliyê tundiya di nav malê de digire dest, destavêtinên di bin rûpoşa zewacê de tên kirin hîn kirêt in. Keçên ciwan didin mêrekî şêst salî. Li hember vê zordariyê keçik întîxar dike. Zewacên nayên xwestin tên kirin. Heta carna pere didin û jinê distînin, yanê dikirin. Ev, gelek bêexlaqî û kirêtî ye. Ez Hz. Muhammed baştir fêm dikim, pêşniyara dike ku li ser esasa hurmetê nêzî jinê bibin. Ev girîng e. Lê ez hîn aşkera îfade dikim; Di civakên musulman de bûyerên wiha zêdetir tên jiyankirin. Bêexlaqiyên herî mezin di civaka Îran û Erebîstana Siûdî de tên jiyankirin. Ez ji hevalên jin re dibêjim; bila ew bixwe vê têkiliyê diyar bikin, nîqaş bikin. Jin bi feraseta dirust û namûsê dikarin pêşiya van têkiliyên xerab bigirin. Bila ji bo vê hewldanê bidin. Tevî van têkiliyan jî ez şaş dimînim ku hevalên jin çima nakevin nav xebateke têr û tijî.

**13’ê Berfanbara 2006’an**

Kurd, bêyî ku desthilatdariyê bikin hedef divê hedefa civaka demokratîk pêk bînin. Pêşniyara min ji bo kurdan, rêxistinbûnên xwe yên sivîl, siyasal, aborî, çandî, di her qada demokratîk, sivîl de rêxistinbûnên xwe çêbikin. Divê hêviya vana ji dewletê nekin. Pêwîst e em bi hêza xwe ya cewherî vana bi ser bixin. Komeleyên weke yên hawirdorê, komeleyên femînîst û hawirdor, rêxistinbûnên kedê, saziyên piştgiriyê, bi hezaran komelbûn û rêxistinbûn divê bên avakirin, lidarxistin. Bi avakirin û berfirehkirina komeleyên femînîst, hawirdorparêz, bigihên gel wê bikaribin pêşiya kuştinên tore û namûsê bigirin. Civak û jin di vê

mijarê de divê werin serwextkirin. Tenê wê demê dikarin azad bibin.

## *Azadî û wekheviya jinê tenê azadî û wekheviya civakê diyar nake*

Ji bo vê pêwîstiya sazûmaniya teorî, bername, rêxistin û çalekiyê heye

**2007**

**4'ê Çileya 2007'an**

Sedam pir balkêş e, diçe mirinê jî behsa mêraniyê dike. Dema diçe mirinê jî ji celadên xwe re dibêje; "Mer bin!", "Ma qey mêranî mirî ye!". A ev "mêranî"ya ku dema diçû mirinê jî behsa wê dikir, serê wî xwar, gelê wî jî perîşan kir. Sedam, ji bo şerê dawî yê bi Emerîkayê re kir gotibû; "Wê ev şer bibe maka hemû şeran". Ya ku dawiya Sedam anî, israra wî ya di dewleta neteweyî de bû.

Dîlek Oz, di nameya xwe ya şandî de diyar kiriye pirtûka dawî ya li ser 'Latife Hanim' a Îpek Çalişlar xwendiye, li ser vê pirtûkê nirxandinên derbarê pirsgirêka jinê de kiriye û nêrînên min pirsiye. Rewşa Latîfe Hanim trajedî ye. Ya rastî rewşa ku wê demê Latîfe Hanim tê de ye, baş nîşan dide ku heta niha hin pirsgirêkên Tirkiyeyê çawa hatine cemidandin. Latife Xanim bi çanda rojava hatiye xwedîkirin. Li gor Mustafa Kemal kesayeteke demokrat, lîberal e, lê Mustafa Kemal, bi sedema mercên dem û derdora xwe nikaribûye ji daxwazên Letîfe Xanim re bibe bersiv. Kiliç Alî ji bo Latîfe Xanim dibêje "ew pîrek", Mustafa Kemal li hember vê derdikeve û dibêje "ne pîrek, ew xanimefendiyek e". Kîn û nefreta Mustefa Kemal ji bo Latîfe Xanim tune ye. Şerê di navbera wan de siyasî ye. Pirsgirêkên komara 80 salî di şexsê Latîfe Xanim de

hatine cemidandin. Latîfe Xanim naçar maye ku beşekî jiyana xwe di malekê de, bêyî ku kesî bibîne û di tenêtiye de derbas kiriye. Di tevahiya jiyana xwe de tenê jiyan kir, destûr nedanê ji bo nameyan jî bişîne. Ev, rewşeke divê nebûya û nexweş e.

Di têkiliya Mustefa Kemal û Latîfe Xanim de otorîte Mustafa Kemal e. Di têkiliya di navbera min û Kesîre de jî rewşeke berevajî têkiliya di navbera Mustafa Kemal û Latîfe Xanimê de hebû. Yanê di vê têkiliyê de ez azadîxwaz û demokrat bûm, Kesîre jî di pozîsyona Mustafa Kemal de, otorîter bû. Ya rastî malbateke bi kok a Kesîreyê hebû. Ez dibêjim qey têkiliyên mezinên malbatê bi Mustafa Kemal û Înonu re jî çêbûne. Lê min fêm nekir ka çima Kesîre helwesteke wiha nîşan da. Min fêm nekir dixwaze çi bike, rewşeke tarî jî heye. Niha rewşa wê çi ye ez nizanim.

Min her tim xwest bibêjim pirsgirêka jinê çiqas girîng e. Min di vê mijarê de hevalên jin teşwîq kir, her tim pêşiya wan vekir. Ji bo vê têkoşiyam. Min îfade kir ku rêya diçe azadiyê di derbaskirina pirsgirêkên jinan, bi taybetî jî jinên kurd de derbas dibe. Beriya çend hefteyan axaftinên min ên derbarê pirsgirêka jinê de di rojnameyekê de derketine, min karî bixwînim. Ez nizanim bi zanebûn e yan na, lê hinek kêm û şaş hatiye nivîsandin. Di wê hevdîtinê de min behsa kirêtiya çanda destavêtinê kiribû. Hin hevalên jin, dema dixitimin yan dizewicin û vediqetin an jî direvin. Ez niha nikarim ji bo hevalên jin bibêjim “Bizewicin” an jî “Nezewicin”. Feraseta min a azadiyê diyar e, hevalên jin jî tênagihîjin. Ev, meseleyeke pênc hezar salî ye. Pênc hezar sal in jinên me her tim bi rola jinaniyê ya ku dane wan gihane, nikarin ji viya derbas bibin. Her dema ku gihîştin temenekî wê bizewicin, xizmeta mêr bikin an jî bikevin psîkolojiya di mal de mayînê. Nikarin ji vê çerxê derbas bikin, lê ez ê ji wan re viya bibêjim; xebata ji bo têkoşîna azadiyê berdewam bikin. Têkoşîna herî watedar û xweş ev e. Bi pariyekî nan, bi nanozikoyî be jî bijîn, lê tu

car tawîz ji têkoşîna xwe nedin. Ev gotinên min ji bo mêran jî derbasdar e.

Ez pirtûka M. Foucault ya Dîroka Cinseltiyê dixwînim. Hin aliyên ku ez tevlî dibim hene lê fikrên min ên hîn berfirehtir hene. Ajoyên cinsî xwezayî ne, di her mirovî de hene. Ya xetere, cinseltî bibe tiştê, objeyê desthilatiyê. Cinseltiya heyî desthilatdariyek e, mêraniyeke rabûye pêdarê ye. Heta hatiye rewşeke ku mêr hov kiriye. Di encamê de têkiliya cinseltiya heyî, xizmetî civaka mêrê serdest dike. Feraseteke desthilatiyê ya tune dike, qabe û hov dike derxistiye holê. Di bingeha hemûyan de ev feraset heye. Di bin kuştinên namûsê, çanda destavêtinê de ev feraset heye û heta ku ev feraset neguhere ne pirsgirêka demokrasiyê, ne jî ya azadiyê nayê çareserkirin. Di damezirandina komarê de yek ji lingên kêm dimîne jî ev e, pirsgirêka jinê nehatiye çareserkirin, hatiye cemidandin. Feraseta Sedam a dema ku diçe sêdarê jî dibêje “ma qey mêranî mir” ev feraseta hov bûye a mêr e. Em li dijî vê ferasetê ne. Ji bo em vê ferasetê derbas bikin em têkoşiyan.

**10’ê Çileya 2007’an**

Ez pirtûka Foucault a bi navê Dîroka Cinseltiyê dixwînim. Di wê derê de jî tê diyarkirin ku hin fîlozof desthilatdariyê haşa dişibînin fahîşeyê. Carekê ku hîn bûn êdî naxwazin kursiyê, textê berdin. Di nav me de jî yên weke Botan, Osman dînê, miriyê desthilatiyê hebûn. Vana ji min fêm nekirin. Min di wextê de ji wan re gotibû; “Bi van nîqaşên desthilatiyê hûn çawa tên ber min, qey we qet ji min fêm nekir?”

Nameyên hevalên jin jî hebûn, hûn ê ji bo wan jî di çarçoveya ku min hefteya borî diyar kir de binivîsin. Wekî din pirsgirêkên ku hevalên jin dijîn hene? Ya girîng ji bo azadiyê tevbigerin.

**17’ê Çileya 2007’an**

Nameyên ji min re hatine hene. Di van nameyan de jî behsa pirsgirêkên jinên mê dijîn tê kirin. Bi qasî min fêm kir, piştî xalekê, tên li meseleya zewacê asê dibin. Hûn dizanin, bi vanên veqetiyane re yên reviyane jî hebûne. Rev an jî revandinên wiha tên jiyankrin. Ya rastî nêrînên min ên derbarê jinan de tên zanîn. Civakên herî kevn, civakên dayiksalarî ne, li gor min jin di dîrokê de neteweya herî kevn e hatiye dagirkerkirin. Û jin her tim ji aliyê desthilatiyên xizmeta jirêderketina civakan kirine ve hatine bikaranîn. Di parêznameyên xwe de zêdetir li ser van mijaran sekinîbûm. Lêhûrbûnên min li ser vê mijarê pir zêde ne. Lêhûrbûnên min li ser mijarên femînîzm û ekolojiyê ne. Vê dawiyê jî pirtûka Michel Foucault a bi navê Dîroka Cinseltiyê heye, ez wê dixwînim.

**31'ê Çileya 2007'an**

Almanya piştgiriyê dide Çurukkayayan. Bi sedema Silêman gelek rêhevalên me yên jin şehîd ketin û yekîneyeke bi sî kesî îmha bûbû. Tevî ku min bi israr diyar kir şaş e, dîsa jî bû sedem ku hevalên me yên jin bibin bombekarên întîxarî. Min nekarî asteng bikim. Hevaleke jin ji Licê bû. Her hal navê wê Besê bû. Bûbû sedem ku bombe bi xwe ve girê bide û çalakiyê bike. Ev îro jî bi piştgiriya Almanyayê, bi derfetên ku Almanya dide bi kirêtî êrîşî me dikin. Li dijî min gelek pirtûk didin derxistin. Faliyetên vana divê baş bên lêkolînkirin, li ser were sekinandin. Berê jî sê mijarên ez dixwazin behs bikim hene: Olparêzî, cinsiyetparêzî û netewparêzî. Derbarê cinsiyetparêziyê de xwendinên min berê jî hebûn. Min pirtûka M. Foucault a Dîroka Cinseltiyê xwend qedand. Di navbera cinseltî û desthilatiyê de têkiliyeke pir nêz heye. Cinsiyetparêzî cureyekî neteweparêziyê ye û herî kêm bi qasî neteweparêziyê jî xetere ye. Jinê, di roja me de êdî weke tiştika reklaman, parçeyekî goşt pêşkêşî civakê dikin.

**21'ê Sibata 2007'an**

Nêzikahiya min a pirsgirêka jinê tê zanîn. Ji bo ew di wateya felsefî, fikrî û siyasî de azad bibin min kedeke giran da. Ji bo azadbûna wan, min Îdeolojiya Rizgariya Jinê pêş xist. Ez dixwazim bi kurtasî viya bibêjim; derbarê azadbûna jinê de min xwe gelek gihandiye. Di mijara jin û azadiya cinsiyetê de ez li cihekî pir girîng im. Ez dixwazim ji hemû jinan re viya bibêjim: ji bo jin ji bin nîrê pênc hezar salî derkevin divê xebatên girîng bên kirin, xwe gelek pêş ve bibin. Pir bixebitin û pir rêxistin bibin. Derbarê azadiya jinê de pêwîst e cinsiyetparêzî neyê kirin. Cinsiyetparêzî herî kêm bi qasî netewperestî û hin fikrên din ên weke wan xetere ye. Jin û keçên girêdayîna xwe ya bi min re îlan dikin hene. Ger girêdayî min û di vê rêya azadiyê de cidî bin, divê şoreşa siyasî û zîhnî ya jinê pêk bînin. Yanê ez dibêjim; "Azadiya cinsiyetê bi tenê têr nake". Ji wan re bibêjin; ev meseleyeke baweriyê ye, azadiya jinê karekî rihet nîn e. Ger derfeta min hebe, weke berê, ez ê di vê mijarê de fikrên xwe di pirtûkên xwe de bidim. Ez ê her tim tevkarî û alîkariyê ji bo wan bikim. Di 8'ê adarê de, dahûrandinên min berê jî kirine li ber çav bigirin û destnîşankirinên min ên wan çenda behs kiribû yên derbarê çanda destavêtinê de jî li ser zêde bikin û biweşînin. Weke têkoşerekî azadiyê, di mijara malbat û weke nesîl zêdebûna wan û mijarên din de, ez ê di vê merhaleyê de tiştekî nebêjim. Ez zêdetir aliyê fikrî û felsefîk ê vî karî ava dikim. Ez ji bo azadbûna wan têkoşiyam. Pirsgirêka azadbûna jinê pirsgirêkeke pir girîng e. Lê weke min got divê rêxistinbûn û azadiya xwe pêş ve bibin.

**28'ê Sibata 2007'an**

Li ser navê cinsiyetparêziyê bi zorekê jinê dikin hînbûyî. Bi zorê dibin xwediyê jinê û dixwazin wiha bibin desthilatdar. Jinê dikin weke tiştika desthilatiyê. Bi îdeolojiya cinsiyetparêziyê jinê bi tevahî digirin bin zordestiyê.

**31'ê Adara 2007'an**

Kesayetê Osman û rezîlê Botan texrîbatên mezin çêkirin. Bûn leşkerê hinekên din. Hezar kesî birin newisa? Çûndina wan qet ne girîng e, zêdetir, heta dikarin hemû jî biçin. Tek keçeke kurd an jî mêrekî kurd ên dirust û girêdayî min û xetê bimîne bes e. Qet tu ne girîng e, kî dixwaze dikare biçe. Ji bo min têkoşîna azadiyê girîng e. Azadîxwazî û xwesipartina hêza xwe ya cewherî, nebûna leşkerê tu kesî têkoşîna min e. Têkoşîneke wisa bi pere, dolar û pîrekan bê firotin nîn e. Ez şehîdeke me bînim bîra we. Şehîd Bêrîtan. YNK'yî li ser zinarekî derdora Bêrîtan dorpêç dikin, digirin çemberê û dibêjin; "Radest bibe!", wisa bi gotina "radest bibe" jî ne ku dibêjin "em ê te radestî Tirkiyeyê bikin". Jê re dibêjin; "Were, em xuşk û bira ne, em ê îşkence li te nekin, were tenê di nav me de bimîn". Lê Bêrîtan dizane ku birastî jî ev ne wiha ye, miriyê azadiya xwe ye, vê rewşê li rûmeta xwe naynê û xwe ji zinar de davêje erdê. Bêrîtan xwedî azadiyeke bêsînor û xeta Rêbertiyê bû. Ji bo min a girîng şerê xeta Bêrîtan e. Ez nabim leşkerê tu kesî, têkoşîna min têkoşîna azadiyê ye. Armanca vana ew e ku PKK'ê bînin ser xeta Emerîkayê. Ev siyaseta xwînê dikin. Ev rewşeke pir hovane ye.

**9'ê Adara 2007'an**

Tu pirsgirêkeke me bi tirkan re tune ye. Hevkariya demokratîk dibe. Bila berendam jin û mêr bin. Ger ji herêmekê du berendam hebin, dibe yek jin yek jî mêr be. Ger wê sê berendam bin, du mêr, jinek dibe. Êdî ew ê eyar bikin, lê teqez divê jin hebe. Girîng e ku jin hebe, lê divê baldar bin ku li her derê mirovên kêrhatî û bikaribin kar bikin bibin berendam.

**20'ê Hezîrana 2007'an**

Şêwazê min ê têkoşînê, feraseta min diyar e. Zehmet e ku mirov bi yên wisa pirsgirêkên wan ên malbat, heval û jinê hebin re vê dozê bimeşîne. Bila tu kes nebe jina tu kesî an jî mêrê tu kesê. Gelek jê ketî ne, zaefên wan hene. Tu du jinan bidî ba wan her tiştê wan diguherin. Kî du jinan digire ba xwe direve. Jina ku mêr

digire ba xwe jî direve. Ya rastî ev ji pîrekê sed qatî jêrtir in, ji pîrekê sed qatî pîrektir in. Mêrê kurd, sed qatî ji pîrekê pîrektir e. Ev sûcdariyên mezin, dîrokî ne. Ez sûcdariyên sivik, besît nakim. Pîşeya pîrektiyê hûn dizanin pîşeya fahîşetiyê ye. Bila şaş neyê fêmkirin, tê zanîn ku ez bi azweriyeke çawa bi têkoşîna azadiya jinê ve girêdayîme û çawa destekê didim wan. Pênc sed jinên xweşik bidin ba min di xema min de nîn e. Ez ê wan bikşînim fikrên xwe, li gor rê û rêzana têkoşîna xwe bidim xebitandin. Derbarê zaefên xwe de nikarin tiştekî herî biçûk ji min bigirin, lê jin divê ji bo azadî û rûmeta xwe têbikoşin, bi viya bawer bin. Wê demê jiyan xweş dibe, wê demê jin kêfxweş dibe, wê demê jin xweşik dibe.

**4'ê Tîrmeha 2007'an**

Ji bo jinan jî ez dikarim viya dikar bikim: fikirên min ên derbarê têkoşîn û azadbûna jinê de tên zanîn. Girêdayîna min a bi têkoşîna wan re berdewam dike. Ez her tim ji bo têkoşîna azadiya jinê difikirim. Ji berendamên serbixwe, komeke jin bên hilbijartin baş dibe. Her hal wê bên hilbijartin. Yên dikevin siyasetê ez ji bo wan dibêjim. Yên dixwazin bikevin siyasetê min ji wan re gotibû; ez dubare dikim: Ger hûn bikevin vî karî, hûn ê hemû aqil û dilê xwe bidinê û bikevinê.

**22'yê Tebaxa 2007'an**

Ji bo jinan jî gotinên min hene: Ez şervanekî azadiya jinê me, di vê mijarê de gelek radîkal im. Ji bo min jin gelek girîng e. Di asta xwedawendiyê de min nirx da jinê. Dahûrandinên min ên derbarê jinê de tên zanîn. Parlementerên me yên jin jî hene, çi dikeve ser milê wan divê bikin. Bila bi pirsgirêkên jinê re eleqeder bibin, tabî divê bibin parlementer jî. Tabî divê min rast fam bikin û rast pêk bînin. Û ya herî girîng divê bixebitin.

Bi bîrdoziya xweda-qralan ya herî kêm 3 hezar salan re tekoşîn kirin ne hesane; kêrhate û wêrekiya pir mezin dixwaze

## 2008

### 14’ê Sibata 2008’an

Di asta ku têkoşîna kurd a legal hatiyê de xitimandin filan nayê jiyankirin. Pirsgirêk kesayetên vana ne. Kesayet tune ye. Bila kesayet hebe, kesek jî bes e, ji min re kesek jî bes e. Piştî ku kesayet hebû sê çar kes jî dikarin vî karî bimeşînin, bînin cihekî baş. Pirsgirêk pirsgirêka kesayet û azadiyê ye, pirsgirêka li ser azadiyê nelêhûrbûn e. Ev ji bo jinan jî wiha ye. Demeke din mirov dikare pirsgirêka jinê berfirehtir bigire dest.

Di civaka me de ji sedî not, not û pênc zewac rojane çanda destavêtinê ye. Marks dibêje “ol afyon e”, ez jî dibêjim “cinseltî afyon e”. Wa hinek ji wan, Osman, li ber xwe neda, ji bo jinekê dest ji têkoşîna xwe berda. Şemdîn Sakik jî wisa. Wan çaxan, dema me bi fermandarên xwe re vê mijarê nîqaş dikir Halîl Ataç ji gotinên Mao tenê yek jê, binê hevoka “Mêr bê jin nabe” xêz kir û mijarê girt dest. Min jî wê demê fêm kir ku tiştek ji viya (H.Ataç) dernakeve. Niha jî li ku derê ye ez nizanim. Min vê mijarê bi keçan re gelek nîqaş kir. Heta min ew girtin ba xwe, bi mehan bi wan re vê mijarê nîqaş kir. Piştre rezîlê Şemdîn viya şaş şîrove kir. Çil sal berê bavê min li gund bûyereke li ser Ataturk, derxistina Ataturk a ji Antalyayê qal kir. Piştre dema min ev di pirtûkekê de xwend min ev bûyera ku bavê min qal kir baştir fêm kir. Ji bo feraseta modernîst a ronakbîrî, di wextê de Ataturk jî li Antalyayê bi komek keçik re civîn çêdike. Yên wê derê bi awayekî din Ataturk şîrove kirin. Burokratên wê derê hema di nîvî de civînan birîn û bi lez û bez Ataturk dişînin Enqereyê. Ev mijareke pir zehmet e. Ataturk nikare ji bin derkeve. Heta azadbûn nebe tu tiştek nabe. Ji viya re dibêjin eşq.

Bila şaş neyê fêmkirin, ez eşqê biçûk nabînim. Jê pêve eşq tiştekî mezin e, ne ew qas rihet e. Li Rojhilata Navîn çîrokên Kerem

û Eslî, Ferhad û Şîrîn li holê ne. Ferhad çil salan çiya kun dike, dîsa jî nagihîje eşqê. Ger eşq tiştekî rihet bûya wê di serdema navîn de bihata serxistin. Jê pêve niha eşq zehmet-tir e. Medyayê eşqê hin girantir kir.

Ez ji keçan re viya dibêjim; "Hûn azadiyê hildibijêrin, an çanda destavêtinê?" Ez ji keçan re dibêjim; "Hûn mêjiyê xwe bidin ser mêrekî hûn nikarin azad bibin". Heman tiştî ez ji bo mêran jî dibêjim: "Hûn nikaribin xwe ji jinekê rizgar bikin hûn nikarin azad bibin, tu tiştekî bi dest bixin, bi ser bikevin. Heta ku mêjiyê we xwe li azadiyê kilît neke hûn nikarin viya pêk bînin."

Silavên, hezkirinên xwe yên taybet ji jinan re pêşkêş dikim.

**27'ê Sibata 2008'an**

Bi boneya 8'ê adarê ez dixwazim peyama xwe bidim. Ji ber şert û mercan ez dikarim parçe parçe li ser bisekinim. Ya rastî pirsgirêka jinê pirsgirêkeke desthilatdariyê ye. Bi fînansa kapîtal jinan dixapînin. Yekdestdarî bi vî rengî dinyayê bi rê ve dibin.

Fînansa kapîtal dixwaze her tiştî di bin destê xwe de bigire. Dibe ku ev gotina min ji we re pir ecêb jî bê, lê heta hûn xwe rast nas nekin hûn nikarin têbikoşin. Heta hûn nikarin vê desthilatiyê rast nas bikin û fêm bikin, hûn ê bikevin rewşa Osmanê tasfiyekar. Heta wê we bi kar bînin, hûn ê fêm nekin ka hûn çawa hatine bikaranîn jî. Xwestin min jî pênase bikin. Ji ber ku fînansa kapîtal nikarî venêrînê li ser min bike ez li vê derê me. Xeta me ya azadîxwaz û xeta hevkaran di nav têkoşînekê de ne.

Ji vê derê dest pê bikim û behsa pirsgirêka jinê jî bikim. Wê bixwazin we bi pere û jinan bixapînin. Dixwazin bi vî rengî xeta xwe bidin rûniştandin. Di vê maneyê de fînansa kapîtal pir xerab jinê bi kar tîne. Bi tevahî reklam li ser jinê hatine avakirin. Mantiqa desthilatiya fînansa kapîtal li ser "Yan hûn ê tevlî vê desthilatiyê bibin an jî bimirin" hatiye avakirin. Hilbijêrkeke din nas nake. Cinsiyetparêziya jinê weke amûra vê desthilatdariyê bi kar tînin.

Min berê jî gotibû. Faşîzma herî kevn, herî êrîşkar, nêzikahiya mêr a li hember jinê ye. Ji ber wê yekê ez dibêjim, ji ber ku divê ji min rast têbigihîjin. Nêzikahiya min a jinê bi tevahî li ser hîmê azadîxwaziyê ye. Ev, bi qasî ku ji bo gel wiha ye, ji bo jinê jî wiha ye, heta ji bo mêr jî wiha ye. pêwîst e mirov xwe baş nas bike û pênase bike. Azadî nebe nabe, ev mijareke nayê nîqaşkirin e jî, lê azadî rewşeke mêjî û ruhî ye. Însan, bi hestên xwe divê xwe nas bike, li ser fikrên xwe hakim be û dixwaze çi bijî divê pênase bike. Azadî ev e. Min her tim ji jinan re vê digot. Ji ber wê yekê, ger dibêjin azadiya jinê, bila li ser vî esasî nêzî min bibin. Ger ku hez bikin bila wiha hez bikin, an jî beredayî xwe newestînin. Ger wê werin bila li ser van esasan werin. Ji bo nêzikahiya min a jinan pir êrîşî min kirin. Rezîlê Şemdîn digot ez li Şamê bi jinan re wisa dijîm. Min bi jinê re li ser esasê azadiyê jiyan kir, ez ê bijîm.

Va hûn mînaka Osman dibînin. Ji wan re gotin; "Em ê pere û jin bidin we". Dolar xistin bêrîkên wan, hînî pereyan kirin. Min wan çendan di rojnameyê de xwend, Osman carê bi carkê dibêje; "Jinê ka wan zarokan bîne em bi hev re fotrafekî bikişînin" Ev, ya rastî peyameke îdeolojîk e. Cihê vala viya nakin, dibêjin "ji bo jiyanê ha ji te re cî" filan. Ev, a rastî xetek e. Wekî ku hûn dibînin, wan hevkaran girtine gel xwe, li me jî vana kirin. Lê çi dibe ew dizane, min li Şamê ji keçikan re jî digot. Min digot; her tim li ser hîmê azadiyê bijîn, wiha nêzî mêr bibin. Di vê mijarê de min rexne dikin, ez jî mêrek im, xwe ji min jî biparêzin. Xwe ji vê têkiliyê, ji vê mêraniyê biparêzin. Min di rojnameyê de xwend; jineke doxtor ji bo xwestiye hevserê xwe yê leşker berde bi dozdeh guleyan hatiye kuştin. Ha fînansa kapîtal ji bo jinê viya dibêje; "yan tu yê ji sedî sed tevlî desthilatiya min bibî, yan jî tu yê ji sedî sed bimirî".

Min wan çendan behsa çanda destavêtinê kiribû. Di roja me de ji sedî not û pêncê zewacan destavêtin e. Jin her roj bi desavêtinê re rû bi rû dimînin. Di nav çandeke destavêtinê ya wiha de, ne ruh

ne jî mêjiyê jinekê saxlem dimîne; ne feraseta wê ya xweşikiyê dimîne ne hezkirin û eşqa wê.

Fînansa kapîtal redkirina mirovahiyê ye. Fînansa kapîtal di ser cinsiyetparêziya jinê de bûye serwerê civakê. Meseleyeke pênc hezar salî ye û li hember viya berxwedaneke bi heybet a jinê heye. Lê divê mirov baş fêm bike ka mirov ê çawa bijî, li ser vî esasî pêwîst e mirov xwe baş nas bike. Bila li ser esasê azadîxwaziyê nêzî min jî bibin.

Min bi jinê re bi tevahî li ser azadiyê têkilî danî. Bi qasî ji bo jinê, ji bo gel û mêr jî divê xeta azadîxwaz esas be. Bi vana kapîtalîzm desthilatiya xwe pêk tîne. Bi viya li ser jinê, li ser civakê dibe desthilatdar. Va ye min gotibû “sê S”. Fûtbol, tiştê jêre dibêjin huner, keçên reklamvan, tiştê jêre magazîn dibêjin! Her kes bûye fûtbolkolîk, bi fûtbolê radibin û radizên. Li ser navê hunermendiyê her roj gelek mirov derdixin. Kî bi kî re ye ne diyar e, bi wî tiştê jêre mankenî, magazîn dibêjin viya dikin, ji viya re jî dibêjin huner. Ev, ne hunera rast e. Her roj gelek tiştên nelirê dikin, navê hezkirin û eşqê lê dikin. Di wan de mirovahî, ruh nemaye. Min wan rojan jî got vaye “roja eşqê”, “roja evîndaran” îlan kirine. Bi fînansa kapîtal mirovan tînin vî halî.

Di têkiliya Mustafa Kemal a bi jinan re de, heta têkiliya Latîfe lêgerîna azadiyek, xweşikiyek hebû. Bavê min jî ji min re vedigot, wê demê leşker bûye. Dema Mustafa Kemal çûye Antalyayê di civîneke bi keçan re civat kiriye, ji helbest û wêjeyê axivîne. Gel rabûye ser piya, gotine; “Mustafa Kemal dest avêt keçên me!”. Ji ber vê yekê Mustefa Kemal ji neçarî bi lez û bez ji Antalyayê derketiye. Bavê min dema ez biçûk bûm ji min re vê çîrokê vegotibû. Çîroka ku min piştre ji pirtûkan xwend û çîroka bavê min vegotibû mîna hev bû. Derbarê azadiya jinê de min jî gelek sûcdar kirin, lê me karî ji bo wan qadên azad pêşkêş bikin.

Fînansa kapîtal, ji bo jinê bigire bin venêrîna xwe cinsiyetparêziya wê bi kar tîne: “Wê çawa aşiq bibe, çawa bijî, çawa bi hev şa bibe” hemûyan dike tek tîp. Di ser jinê re desthilatiya civakê dike hedef. Xweserî û cudahiya te nas nake. Dibêje; “Ez çawa diyar bikim tu yê wisa bî, ji sedî sed di destê min de bimînî.” Di neteweparêzî û olparêziyê de jî li ser civakê tek tîpiyê ferz kir. Di dewleta neteweyî de nasnameyeke çawa bixwaze, wê ferz dike.

Bi boneya 8’ê adarê ez ji jinan û tevahiya gelê me re silavên xwe dişînim.

**12’ê Adara 2008’an**

Wê kurdan bi nanozikoyî bi xwe û patronan ve girê bidin. Çawa jinê anîbin rewşeke ku muhtacî mêr be, jin wiha hatibin pîrek-kirin, dixwazin bi vî rengî kurdan jî bi xwe ve girê bidin. Bi kurdan didin hînkirin ka wê çawa tevbigerin. Weke “tu yê wiha bikî, wisa li xwe bikî, wisa bikî, wisa bizewicî”. Vaye rewşa ku Osman ketiyê li holê ye. Carêcarkê fotraf didin kişandin dibêjin “tu yê wisa bikî”. Bi vî rengî Osman û Botan jî qut kirin, bi vana re hezar kesî jî qut kirin.

**21’ê Adara 2008’an**

8’ê adarê çawa derbas bû? Min nekarî wan guhdar bikim, tevlîbûn çawa bû, zêde bû, peyama derket pêş çi bû, peyama min hat dayîn? Ez dibêm niha tevlîbûn baş bûye, herhal bi çoş derbas bûye. Silavên min ji jinan re bibêjin. Bi jinan re hevdîtin çêdibe, di vê mijarê de gotinên min ji wan re ragihînin. Pirsgirêka azadiya jinê divê baş bê fêmkirin. Di vê mijarê de divê jin baş bixebitin, ji min baş fêm bikin.

Li hember kapîtala fînans mirov dikare bi feraseta antî-yekdestdarî rêxistin bibe. Jin jî dikarin di nav vê rêxistinbûnê de cî bigirin, pêwîst e cî bigirin. Collîngwood ji bo jinan dibêje “Jin: Neteweya Mêtingeh” Rast e, tespîta ku min kiribû kiriye. Di pirtûka

Sîstema Dinyayê de jî hin nîşane hene, hin tespît hene. Azadiya jinê gelek girîng e, heta jin azad nebe, civak azad nabe.

**2'yê Nîsana 2008'an**

Ji bo jinan jî wisa dibêjim; pênc hezar sal in jin hatiye kolekirin. Her ku derbazî pergala hiyerarşîk a cîwarbûyî bûne jin di rewşeke kole de ye. Berê li gel Sumeran jinan fahîşetî dikirin, di wê demê de fahîşetî jî weke pîşeyeke girîng dihat dîtin. Ji pênc hezar salî ve jî jin bi tevahî hatin kolekirin, azadiya wan ji dest wan girtin. Min pirtûka Jin, Neteweya Dagirkirî xwestibû. Di vê pirtûka xwe de nivîskar tiştên nêzî fikrên min dibêje, ji bo jinan dibêje "neteweya mêtingeh". Ez tam wisa nabêjim; ez dibêjim; "jin; mêtingeha destpêkê û dawî" Derbarê femînîzmê de jî fikra min ev e. M. Foucault jî mijara jinê lêkolîn dike, lê nikaribûye bi kûrahî lêkolîn bike. Li Tirkiyeyê derdorên Amargî dibêjin em femînist in, lê pir seresere nêz dibin, mijarê bi kûrahiya dîrokî dest nagirin. Hûn dizanin Amargî peyveke bi koka xwe Sumerî ye.

Zewac, tiştekî, bûyereke tirsnak e! Jin, pênc hezar sal in bi çanda destavêtinê dijîn. Dest davêjin wan, şev û roj bi destdirêjiyê re rû bi rû dimînin. Min jî demekê ceribandineke zewacê jiyan kir. Herî zêde min deh sal dikarî li ber xwe bidim. Fatma got, Osman ji nû ve, zewiciye, simbêlên xwe filan boyax kiriye, di dawetê de govend gerandiye. Rewşa ku ketiyê a ev e. Di vê mijarê de hin pirsgirêkên Mehmet jî hebûne. Dibe ku bi van bûyerên kirêt me ji hêzê de bixînin, ez ji vana gelek dûr im. Her tim min xwest ji van bûyeran dûr bimînim.

**16'ê Nîsana 2008'an**

Derbarê jinê û çanda destavêtinê de gotinên min ên berê bi vê bûyera dawî, bi bûka aştiyê Pîppa rast derketin ne wisa? Bûkaniya spî li xwe kiribû newisa? Min berê jî gotibû; "Ne bûkanî ya rastî kefen li xwe kiriye". Ev bûyera hatî jiyankirin jî bi sembolîk min rast derxist. Ev tenê bûyerek e, her roj du qat li viya bûyer tên

jiyankirin û her roj du qat destavêtin tê jiyankirin. Bi vê mebestê ez Pîppa bi bîr tînim û vê axaftina xwe ji bo wê dikim.

Ji girtîgehan nameyên ji min re tên hene. Ji ber ku di hin nameyan de "Rêber", "Rêberê kurd" derbas dibe yan nadin yan jî bi sansur didin. Yên di girtîgehan de di hin mijaran de nameyên xweş dinivîsin, lêhûrbûna wan li ser hin mijaran baş in. Xweş e ku girtîgeh wiha kûr dibin. Bila ev xebatên xwe berdewam bikin. Carcaran nameyên Turkan Îpek tên ji min re, ez dibêm qey di girtîgeha Ûşakê de dimîne. Li Ewrûpayê dimîne, çanda wê derê jî dizane. Dikare van her du çandan di nav hev de bigire dest û vê bûyera bûka aştiyê bike roman. Di nameyên ji min re tên de behsa hezkirina xwe ya ji min re dikin. Ez wisa tenê hezkirinê girîng nabînim, ev pêş ve nabe. Hê ji biçûkahiya xwe ve ez li dijî vî şêwazê hezkirinê bûm. Vî şêwazê hezkirinê min qebûl nekir. Tenê hezkirin, hezkirina fêmkirin tê de nîn be qerizeyî (dozîn, içgüdü) ye. Dibêjin "hezkirina dayikê", ev hezkirin jî ji qerîzeyan tê. Ez hezkirina dayikê girîng dibînim, lê hezkirin divê tenê ji qerîzeyê neyê. Heywan jî bi qerîzeyê ji hev hez dikin. Çivîkek jî xwedî qerîzeya dayiktiyê ye, bi qerîzeyî ji çêlikên xwe hez dike.

Hezkirin pêwîst e bi fêmkirin be, ger xwe bispêre hezkirinê watedar e. Ez jî dibêjim hezkirina watedar. Hûn ji min fêm dikin, ger ji fikrên min fêm dikin ev ji bo min watedar e. Hezkirina min ji fêmkirina fikrên min derbas dibe. Ger hûn ji min fêm dikin, hewl didin fêm bikin, têdigihîjin wê ev pir watedar be.

Hezkirin divê têkildarî fêmkirinê be, fêmkirin çi ye? Ev jî dikeve felsefeyê. Felsefe çawa tê kirin, çawa tê fêrkirin, ji bo vê jî pêwîst e sosyolojî pir bê xwendin, mirov dîroka her tiştî bizanibe. Hewce ye sosyolojî jî bi perspektîfa dîrokî, felsefe jî bi perspektîfa dîrokî bê xwendin. Divê mirov her tiştî di şibakeya,dîrokê de bizanibe. Mirov dîrokê pir baş bizanibe dikare roja me fêm bike. Hezkirina têkildarî rêhevaltiyê, fêmkirinê watedar e. Ger jin bikaribin viya bi ser bixin,

wê demê weke jin jî, weke xwedawend jî, weke hêmana eşqê jî, weke mirov jî dikare were hezkirin. Di mîtolojiyê de li Anatolyê Kîbele, li Mezopotamyayê Înanna, Îştar, Star jinên xwedawend temsîl dikin.

Ev gotinên min îro ji bo jinan gotin weke peyam dikarin biweşînin. Li ser navê min, tevî axaftinên min ên berê, peyamek dibe bê şandin. Ez ji wan têdigihîjim, di pirtûkên xwe yên berê de min behs kir. Ez ê nivîsandina vê mijarê dîsa berdewam bikim. Ez dizanim ku min dişopînin, bila bi xwe bawer bin, dikarin xwe bes bibînin. Pêwîst e mirov ji mêran jî pir tiştan hêvî neke. Her kesên ku nikaribûye xwe ji kesayet û têkiliyên feodal paqij bike, rizgar bike – ev ez jî bim- nêzî wan nebin, ji van kesan dûr bisekinin. Ger mêrekî xwe ji van kesayet û têkiliyên feodal paqij kiriye, têkildarî fêmkirina we, rêhevaltiya we xwe pêş ve biribe hûn dikarin wî mêrî qebûl bikin, jê hez bikin. Hin kes ji vê hezkirinê re dibêjin hezkirina pêxember, hin kes dibêjin hezkirina Xweda.

Di pêşketina aştiyê de dikarin rol bigirin. Li Kayapinarê parkeke jinan vekirine heye. Ji wê parkê derkevin rê û dikarin dest pê bikin. Ji bo jinan bila Akademiya Siyaseta Demokratîk a Jina Azad ava bikin. Bi rêya vê akademiyê hişmendiya jinê pêş ve bibin û divê bi dehan jin perwerde bikin. Ilimparêzî (Zanistîparêzî), olparêzî, cinsiyetparêzî û neteweparêzî; ez van her çaran jî xetere dibînim, bila ji vana dûr bisekinin. Ne li ser esasên cinsparêziyê, li ser esasên azadiyê gelek tiştên ku wê bikin hene, ez silavên xwe ji hemûyan re pêşkêş dikim, serkeftinê dixwazim.

### 23'yê Nîsana 2008'an

Jin wê li Amedê Konferansa Navneteweyî ya Rêveberiyên Xwecihî û Jinê li dar dixin. Ev tiştên girîng in, lê lihevcivîn, axaftin têr nake. Heta ku pratîk nebe, jin neyên perwerdekirin,

serwextkirin ev zêde maneyek xwe tune ne. Ez nabêjim “Bila ev neyên kirin”. Lê ya girîng lêhûrbûna wan li ser azadiyê be û azad bibin. Min berê jî ji bo Akademiyê gotibû. Li Akademiyê dikarin bi dehan jin perwerde bikin, jin werin serwextkirin. Hevalên ji girtîgehan derketine dikarin bi perwerdeyên jinan re eleqedar bibin. Ev, bi rêya parka li Kayapinarê dikarin bên pêşxistin. Li vê parkê bi xwarinên wê çêbikin, bi hevgirtin û bexşan dikarin pirsgirêkên aborî jî çareser bikin.

Nameyên ji girtîgehan ji min re hatibûn hebûn. Dihat fêmkirin ku jîr in, lê tenê bi gotina “ez hez dikim” nabe, basît, sivik dimîne. Ez hêrs dibim, ez dibêm qey niha derketine, çima bi perwerdeya jinan re eleqedar nabin. Jin, divê girîngiyê bidin çalakiyên çand û hunerê, xwe pêş ve bibin, li her qadê spor bikin, tîmên sporên ava bikin, bi bedenî xwe xurt bikin. Pêşketîna wan a fizîkî û ruhî girîng e.

**30’ê Nîsana 2008’an**

Derbarê jinê de min gotibû; divê jin ji bo siyaseta demokratîk bixebitin. Di Akademiya min berê ji bo jinan pêşniyar kiribû de dikarin jinan perwerde bikin, xwe bigihînin. Bi heman rengî di akademiyên din de jî pêwîst e bi hezaran mirov bên gihandin. Çima hê nikarin akademiyê ava bikin?

**21’ê Gulana 2008’an**

Di pirtûka Jin; Mêtingeha Dawî de jî derbarê pirsgirêka jinê de raveyên nêzî rastiyê hene, lê asta parêznameyên min wan derbas dike. Vegotina nivîskarên van pirtûkan entelektuelî ye. Cudahiya min a ji vana jî; ez li Rojhilata Navîn mam, pratîkê dizanim, dema ez parêznameyên xwe dinivîsim jî hem bi asta teorîk hem jî pratîk, her duyan kir yek û nivîsand. Ji ber vê yekê ez bixwe bawer im. Di vê mijarê de bi îdîa me. Min xwest di parêznameyên xwe de pirsgirêka jinê bigirim dest. Di pirtûka bi navê Jin; Mêtigeha Dawî de tiştên nêzî yên min gotine tên îfadekirin, lê min hîn bi kûrahî

girt dest. Min hewl da vebêjim ku civak jî weke jinan tên eciqandin û mêtingehkirin. Yanê di van parêznameyên xwe de min xwest dahûrînim ku civak tên pîrek-kirin.

Di rojên pêş me de ez dest bi beşa sêyemîn a parêznema xwe ya bi navê "Azadî" bikim. Ez ê hewl bidim di vê beşê de azadiyê vebêjim. Bi taybetî jî di roja me de, em di demeke wisa de ne ku her diçe jiyan bêwate dibe. Ji bo bêwateyiya jiyanê derbas bikin girîngiya azadiyê, kilîtbûna di azadiyê de ez ê vebêjim. Bi taybetî jî jin, ji bo bikaribin jiyana bêwate ya dijîn derbas bikin jiyaneke bi îdîa ya rewşa têde ne derbas bike hedef bigirin û xwe di azadiyê de kilît bikin.

Xebata akademiyê girîng e. Di vê akademiyê de ji spor heta siyasetê, ji hiqûqê heta felsefeyê, xebatên atolyeyê, xebatên çand û hunerê jî têde dikarin her cure xebatên xwe bikin. Dîsa ev xebata akademiyê divê hemû beşan bigire nav xwe. Weke mînak xwendevaneke zanîngehê jî, kebaniyeke, jineke li malê jî dikare di van xebatan de cihê xwe bigire. Demekê Enstîtuyên Gundan hebûn. Dixwestin xebatên heman mîna vana bikin, lê akademiya ku ez pêşniyar dikim, ji enstîtuyan jî derbas dike. Nav ne girîng e, dikare akademî jî, enstîtu jî bê gotin. Malbat, li derdora jinê çêdibe. Jin, afirîner in. Bi yên ku diafirînin dikarin pirsgirêkên xwe yên aborî çareser bikin. Weke mînak zeviyek kirê bikin, dikarin çandiniya organîk bikin.

Her wiha ji çareserkirina pirsgirêka bêkariyê re wê tevkariya wan çêbibe. Xebata jinê heyecanê dide min. Jin dikarin bixwe bawer bin. Lêhûrbûna wan li ser azadiyê bibe tu tiştekî ku wê bi ser nexin tune ye. Li ser vî esasî ez biryara wan a kongreyê pîroz dikim, serkeftinê dixwazim.

**18'ê Hezîrana 2008'an**

Ji bo jinan min Akademiya Siyaset û Çandê ya Demokratîk pêşniyar kiribû. Ji bo ciwanan jî, ji bo yên din jî min pêşniyar kiribû. Ev hemû divê demek beriya demekê derbasî jiyanê bikin.

Tê diyarkirin ku li Başûrê Kurdistanê tundiya li ser jinê zêde bûye. Xuya ye ku li wê derê zêdebûnek di tevgera jinê de heye, berxwedanek heye.

**2'yê Tîrmeha 2008'an**

Lêhûrbûna min li ser parêznameyê pir zêde ye. Ez di normalê de zêde nivîsên xwe naecibînim, hinek guman ji nivîsên xwe dikim, lê ev parêznameya min êpê baş e. Min nivîsên xwe cardin xwend, nêrînên êpê balkêş hene, ez jî şaş mam. Min pir eciband. Hin tiştan ji nîqaşê re vekin. Min behsa mijara jinê kir. Mijara jinê girîng e, ez pir girîngiyê didim jinê. Li gor min jin, netewe û nîjada dawîn e hatiye mêtingehkirin. Ez vê mijarê pir vedikim.

Di aliyê jiyana sosyalîst de jin û zilam tenê bi awayekî gerdûnî, kollektîf çêkirina jiyana azad re, wê bikaribin bi awayê yekane jî şansê jiyana rast û xweşik bidest bixin

**2009**

**27'ê Adara 2009'an**

Ez jî dibêjim ku ger hûn azad bibin wê kar û xwarin li dû were. Azadiya siyasî girîng e. Ew civaka têgihîştin û azadiya wî ya siyasî nebe civakeke kole ye. Ger azadî û têgihîştina we ya siyasî û exlaqî tune be hûn di rewşeke koleyî de ne. Azadî û têgihîştina we ya siyasî û exlaqî tune be hûn ê xwe, civaka xwe, malbata xwe, keça xwe çawa biparêzin? Feraseta namûsê, tenê li ser cinsiyeta jinê bi feraseteke çelexwarî hatiye avakirin. Feraseta min a namûsê tê zanîn.

Civak, ji bo rizgariyê pêwîst e bibe civakeke exlaqî û polîtîk. Di civakekê de ku têgihîştina siyasî, exlaq, kevneşop û adet nebe hûn

nikarin xwe, civaka xwe, malbat û keça xwe biparêzin. Ger ev nebin ew civak qediyaye. Min di parêznameyên xwe de bi rengekî pir berfireh vana rave kir. Parêznameyên min hatin weşandin? Divê werin weşandin û her kes bixwîne.

**1'ê Nîsana 2009'an**

Li ser navê min, ji bo şaredarên jin, hûn dikarin peyamekê bi rûpelekê binivîsin. Bi awayekî xweşik nêrînên min ên derbarê jinê de jî tê de werin diyarkirin. Jin li ser mijarên "Bajar çawa tên avakirin, çawa tên demokratîk-kirin, rêvebirin? Li ser zarok, keç, bêkarî û pirsgirêkên din çareseriyên çawa tên afirandin?" divê pir xebat bên kirin. Pêwîst e li ser vana bi girîngî were sekinandin.

Kapîtalîzmê jinê kiriye kole. Keda wê, fikra wê, bedena wê, her tiştê wê dagir dike. jin jî zêde vana fêm nakin, li hember dernakevin. Ji bo mirov vana fêm bike mirov li rojnameyên rojekê binihêre bes e. Tu li rojnameyên rojekê binihêrî tu yê gelek destavêtin, mêtingehî, bi qasî dinyayekê pirsgirêk bibînî.

Dema ez di rojnameyê de jinan dibînim tenê dibişirim û derbas dibim. Kapîtalîzmê jinê jî dorpêç kiriye. Ev dorpêçkirin ji Sumeran ve, hê ji pênc hezar sal berê ve weke kevneşopiyekê diguhere û berdewam dike. Di destana derbarê jinê de jî ev pir aşkere ye. Şerê jin û mêr tîne ziman. Min pirtûkên Xwedayê Xasûk ê Sumeran Enkî û Înanayê jî xwend. Jin jî dikarin pirtûka Mûazzez Îlmiye Çig û vê pirtûkê bixwînin. Xwedawenda Ûrûkê Înanna ji Enkiyê Kralê Erîdûyê re dibêje; "We 104 vedîtin û hunera me ji me dizîn, me ji vana bêpar hiştin." Û destan wiha berdewam dike, wê bixwînin. Di dema Babîl de jî şer dikin. Di vê derê de jin û mêr pevdiçin. Tabî di dema Babîl de jin bi tevahî serweriya xwe winda kiriye. Jin dikarin mîna xwedawendekê hereket bikin.

Hûn dizanin perestgehên jinan ên Sumeran hebûn. Jin ev perestgeh ava dikirin û ev cihên wan ên pîroz bûn. Destkeftiyeke wan a girîng bû. Jinan di van perestgehan de perwerdeyên xwe

berdewam dikirin, her cure perwerdeya xwe didîtin, huner û xweşikahiya xwe jî pêşan dikirin. Heta mêr dihatin li wan temaşe dikirin. Piştre mêran ev der veguherandin kerxaneyan. Piştî wê dîrokê jî jin weke xwedawend diketin perestgehan û weke fahîşe derdiketin. Hemû hêjahiyên wê ji dest hatin girtin.

Mûsa tiştekî neda jinê. Li ba Îsa hûn rewşa Dayika Meyremê dizanin. Rewşa Hz. Mûhemmed û Ayşe li holê ye. piştî ku Hz. Ayşe bi kûrahî desthilatiya mêr fêm dike dibêje; "Li şûna ku ez weke jin hatim dinyayê xwezî mîna kevirek hatibûma dinyayê". Kapîtalîzm jî tu tiştekî nû nedaye jinê. Bi her aliyê wê zêdetir jinê dorpêç kiriye. Fatmagul Berktay hinek viya fêm kiriye, di pirtûka Cinsiyeta Dîrokê de, dikarin bixwinîn.

CHP ji bo çarşefê pêşniyar dike, tam rezaletek e. Jinê dixin bin çarşefê. Pêwîstiya jinê bi azadbûnê heye. Desthilatdariya li ser jinê rabe, jin serbest were hiştin a girîng ew e. Mustafa Kemal hinek viya fêm kiriye, di wê demê de hinek pêşiya jinê vekiriye.

Jin, bi ruh û tevgereke xwedawendwarî dikarin xwe azad bikin. Çawa ku ol, bi baweriyekê ji hin tiştan bawer dibe û dike, jin jî ji bo azadiya xwe dikarin weke xwedawendekê tevbigerin. Belê belê. Weke olekê. Çawa ku ol baweriyek be, jin jî dikarin azadiya xwe mîna baweriyekê, mîna olekê pêk bînin, ji viya bawer bin, ji bo vê bixebitin. Jinên ji bo şaredartiyê hatine hilbijartin hene. Ev jin divê hewdaneke pir taybet bidin. Bajaran bi ruhekî nû înşa bikin. Bajar çawa tên avakirin, çawa tên demokratîk-kirin, çawa tên xweşik-kirin, ji ev qas bêkarî û xizanî, feqîriyê re çawa çare bê dîtin, di van mijaran de divê pir hewldan bidin. Dibe ku malbat nikaribin zarokên keçik xwedî bikin, bigihînin. Ji bo perwerde û pêşveçûna zarokên keçik cihên taybet dikarin vekin. Pêwîst e bikaribin zarokên keçik ên feqîr perwerde bikin. Hûn dizanin xwedawendtî desthilatdarî nîn e. Hin bajaran dikarin weke bajarên mînak înşa bikin. Mesela Nisêrbînê weke bajarê mînak dikarin înşa bikin. Cizîr

mîna bajarê mînak dikarin înşa bikin. Cizîr bajarekî xweş e, pir girîng e. Jin dikarin vê derê weke bajarekî mezin û xweş înşa bikin.

Bi vî awayî wê jin azad bibe, wê zêdetir xwe xweşiktir bike, karê xwe xweş bike, bibe xwedî pîşe, aboriyê îdare bike, zarokê xwe baş xwedî bike. Azadbûna jinan, azadbûna civakê ye. Azadbûna jinê azadbûna zarokan, a zarokên keçik e. Ger jin azad bibe wê ev hemû pêşkevin û azad bibin.

Jin divê ruh û bedena xwe, serwextbûna xwe, bi hesûdiya xwedawendekê biparêze.

Bi vê ferasetê dikarin bajaran ji nû ve înşa bikin.

Çepgirên dinyayê jî nikarîn ji pirsgirêka jinê re çareseriyê bînin. Heta li Rojhilata Navîn, di mijara azadiya jinê de kevneşopiyeke ji dîrokê tê ya hîn azadîxwaz, mîraseke hîn kûr heye. Em dibêjin em xwe bispêrin vê kevneşopiya xwe.

Dema ez vana dibêjim ez nabêjim bila eşq tune be. Eşq bûyereke girîng e. Ez ji tecrûbeya xwe jî dizanim. Lê qanûnên eşqê hene. Di vê derê de ya girîng desthilatdariya li ser jinê rabe, tune be. Eşq ne tenê cinseltî ye. cinseltî ji bo eşqê dibe ku hebe, dibe ku qet tune be jî. Di vê derê de ya girîng li ser jinê desthilatdarî neyê danîn, bi hev re, bi wekhevî, li gel hev hereket kirin e. Di serdema navîn de li Rojhilata Navîn, di destana Ferhad û Şîrîn de jî şertekî Şîrîn ji bo Ferhat heye, dibêje: “Heta tu desthilatdariya li Îranê li ser gel ranekî tu nikarî bi min re bibî, nikarî bigihêyî min” Şîrîn, di vê derê de fêm kiriye ku ji bo azadiyê pêwîst e desthilatdarî were şikandin, wisa tîne ziman. Tê gotin ku Şîrîn keçeke Ermen e, koka wê ne girîng e, gotina ku gotiye girîng e. Ji bo jinan niha bingeha têkoşînê jî heye.

Kapîtalîzm, pênc sed sal in ji jinê heta hawirdorê, heta her derê texrîbateke mezin çêkir. Bû sedem ku milyarek mirov telef bibin. Xala ku divê hemû sosyalîst fêm bikin ev e;  KAPÎTALÎZM CIVAKÎ NABE, KAPÎTALÎZM MIROVÎ NABE. Divê her kes viya wiha fêm bike.

**15'ê Nîsana 2009'an**

Nivîsandin ji bo min hêsan e. Ez bixwazim ez ê di demeke kin de binivîsim, lê ez difikirim ku eleqeya wan lawaz e. Ji Akademiyê re eleqeya wan ev qas lawaz be nivîsandina min wê bibe hewldaneke vala. Her sê cildên destpêkê fikra bingehîn dide. Ji bo niha bes e. Ez ne bawer im ku li Tirkiyeyê jî têra xwe were fêmkirin. Tiştek, rewşeke vana nîqaş bike, têbigihîje tune ye. Rewş wiha be ez binivîsim wê heyf be, weke ku ez ê îxanetê li rastiyê bikim.

**6'ê Gulana 2009'an**

Bûyera Mêrdînê, ji aliyekî ve bûyera destavêtina jinê ye. Di çapemeniyê de behsa destavêtineke berê hatiye kirin, behsa xapandina keçekê jî tê kirin. Ez bang li jinan dikim; jin bi hişmendiya xwe ya cewherî û bi îradeya xwe ya xurt dikarin xwe biparêzin. Ez, ji heft saliya xwe ve ye bi pirsgirêka jinê re eleqedar dibim. Heta ji bo min gotin; "miriyê jinê"! Ez bi wan jinên tevlî refên me bûn bi wan re eleqedar bûm, heta min ji wan re got ev têkoşîn zehmet e, zor e, "ger hûn nikarin tevlî nebin". Bi jinên bi min re meşiyan, bi wan re eleqedar bûm, bi wan re topê lîst, avjeniyê kir. Min her tim ji jinan re vegot ku şikandina çanda desthilatdariya mêr a pênc hezar salan ne hêsan e, têkoşîneke kûr pêwîst dike. Ger ez nebûma, hêza min a bandorê nebûya, min jinan serwext nekira li wê derê jî dibe ku destavêtin derketina. Min heta derekê ew parastin. Lê divê herî zêde ew bikaribin xwedî li xwe derkevin, xwe biparêzin.

Piştî ku ez hatim vê derê yên mîna Nîzametîn û Osman gotin eşq û meşk jinan, hevdu revandin û dest avêtin wan, "bîjî, pîçên wan" jî çêbûn. Jina ku viya kiriye orispî ye, mêr be rezîl e, bêşeref e. Ew rebenek e, dilê min ji wan dixele. Ya rastî dilê min bi wan diêşe. Destheqeke vana jî tune ye. Iraqî jî nikarin li wan binihêrin. Namûs, bi tu awayî cinseltî nîn e. Namûs, hişmendiya cewherî û îradeya xurt e. Li xwe, ruh û bedena xwe xwedî derkevin.

Di têkiliya eşqa kapîtalîst de ked tune ye, hezkirina rastî, eşq tune ye. Hezkirin, eşq ked dixwaze. Ferhad û Şîrîn ji bo vê mînak in. Bûyereke li wê derê, li Qendîlê pêk hatiye. Bûyereke dîrokî ye. Ferhat, ji bo bigihê Şîrînê, ji bo eşqa xwe hezar û yek ked dide, eziyet dikşîne, çiyayan kun dike. Heta ji bo eşqa wî pêwîst bû serwerî û desthilatiya şahê Îranê hilweşanda. Dema ku viya bi ser nexist, nikaribû desthilatiya Îranê hilweşîna xwe ji çiyayan ve avêt xwarê. Eşqa rastîn ev e. Hezkirin û eşqeke ku ji bo gelê xwe û welatê xwe hewldan û ked têde tune be tu wateyekê îfade nake. Min di parêznameyên xwe de çanda mêrê desthilatdar bi berfirehî vekiribû.

Ger hişmendiya cewherî pêş nekeve û îrade xurt nebe nikarin ji desavêtina çanda desthilatdar a mêr rizgar bibin. Malên taybet, kerxane ferq nakin, hemû malên desavêtinê ne. Ez bang li jinan dikim; bila serwextbûna xwe ya cewherî pêş ve bibin û ji bo azadiya xwe bixebitin. Di mijara hilweşandina çanda mêrê desthilatdar de em qismî bi ser ketin. Va bûn şaredar jî, parlementer jî, hêvîdar im wê bi ser bikevin. Ji bo vê min behsa karkirina şaredartiya demokratîk kiribû. Ez dizanim hê jî tam fêm nekirine, înşalah wê bi ser bikevin.

**22'yê Gulana 2009'an**

Her kes wê parastina rewa bike. Min têgîna parastina cewherî ji bo vê pêş xist. Min behs kiribû ku divê her kom, her kes, jin, bi taybet jin xwe biparêzin. Min gotibû ku divê parastina xwe ya cewherî pêşve bibin. Her kes bi zanebûn û îradeya xwe divê bizanibe xwe biparêze. Ji bo jinan jî min berê gotibû; "Divê bizanibin xwe biparêzin". Balkêş e, yên ku divê parastinê bikin jî ez wan diparêzim. Her kom, her kes li qada ku lê ye wê parastina xwe bike.

**10'ê Hezîrana 2009'an**

Ez dixwazim ji bo hevalên jin ên di girtîgeha Midyadê de du pêşniyar bikim. Ya yekemîn; Destana Mardûk-Tîamat hebû, bila Destana Babîl lêkolîn bikin, lêhûrbûnê li ser bikin. Ya duyem jî; pêşniyar dikim bila xwedawendbûnê nîqaş bikin.

**17'ê Hezîrana 2009'an**

Hûn dizanin hûn dixwazin jiyaneke çawa bijîn? Hûn dizanin ji bo hûn ji vê jiyana genî ya heyî xilas bibin divê hûn çi bikin? Hûn dizanin ku qirkirina çandî di dîrokê de tê çi maneyê? Ma hûn dizanin qirkirina çandî ji qirkirina fizîkî xeteretir e? Hûn dizanin mirov wê bi qirkirina çandî re çawa têbikoşe? Dostê we kî ye, dijminê we kî ye hûn dizanin, nas dikin? Qanûn û destûra bingehîn a demokratîk a ji bo civaka we, ji bo gelê we pêwîst e divê çawa be hûn dizanin? Di vê mijarê de hûn dikarin bixebitin? Hûn dizanin ku destûra bingehîn a demokratîk wê bi kîjan rêbazan were amadekirin? Mafê we yên civakî wê bi kîjan rêbazan werin bidestxistin hûn dizanin? Hûn dikarin tek zarokek welatparêz, dirust, xwedî bikin, bigihînin? Hûn dikarin zarokek xwe jî bi zimanê dayikê bigihînin? Ger hûn vana hemûyan nizanibin, nikaribin çareseriyan biafirînin, ez ê jî bibêjim ku ev nizanin, nikarin bikin û ez ser xêz bikim, pûte pê nedim, negirim ber çav, weke ku nagirim. Te tune dihesibînin, ziman û çanda te tune. Tu tiştê te tune lê dizanin zarok çêbikin! Behsa eşq û hezkirinê dikin! Lê nikarin zimanê dayikê hînî tek zarokek xwe jî bikin, tek zarokek xwe jî nikarin baş bigihînin.

Ji bo welat, ziman û çanda wan eşq, heyecan, helwdan tune ye, ji bo vê têkoşîn tune ye. Ez Cihûyan pir rexne dikim, lê aliyên wan ên ez hez dikim jî hene. Weke mînak dema felaketek derbarê wan de dibe xwe davêjin heriyê, ser û çavê xwe, her aliyê xwe di heriyê de dihêlin, her aliyî wan reş dibe, dinyayê radikin ser piyan. Bi vî rengî wê bûyerê ji bîr nakin û heta tola xwe hilneynin di bîra xwe de dihêlin. Ger eşq û hezkirin hebe divê ev ji bo welat û gel be.

Civakeke çawa dixwazin? Hunereke çawa, çand, jiyaneke çawa dixwazin? Li ser vê divê xebatên pir mezin hebin.

**1'ê Tîrmeha 2009'an**

Ji şaredarên jin û ciwanên hestiyar re bibêjin bila pir bixebitin. Di civakê de jin di rewşa tişt, mal de ye. Di civakê de wiha tê fêmkirin. Ji bo mêr jin, pênc hezar sal in weke tişteke desavêtinê ye. Mala taybet û kerxane ferq nake, ev wiha ye. Divê jin zêdetir bixebitin. Ez ê ji bo wan desteka xwe dewam bikim. Ji bo jinan ez derfeta jiyaneke nû pêşkêş dikim, bila bixebitin.

**5'ê Tebaxa 2009'an**

Ez guhdar dikim, dinihêrim; tê gotin maf û daxwaziyên çandî. Hûn dibêjin "Em çareser bikin", lê hûn dibêjin; "bêyî ku muxatab bigirin em bixwe çareser bikin". Hûn ê bi kê re çareser bikin? Hûn dibêjin; "Ez ê bixwe pirsgirêkê çareser bikim". Heta hûn vê pirsgirêkê muxatab negirin hûn nikarin çareser bikin. Ji viya re tê gotin "bi texmînî ketina gerdekê, zîfafê". Gotineke kevn e. Kurd viya qebûl nakin. Min berê li ser hev gotibû. Berê dema ku wê bi keçeke 15 salî re bizewicîna mêr digot; "ez ê jinekê ji xwe re bistînim". Digot qey wê jinê wisa kêfxweş bike. Hûn nikarin jinekê wisa kêfxweş bikin, zewaceke wiha nabe. Tu ji jinekê re dibêjî "ez ê ji te re qesran bistînim, te baş bidim jiyankirin" lê nirx nadiyê. Weke zewacên berê dihatin kirin mîna "ha ji te re ev qas zêr, di beramberî ev qas pere de bibe ya min". Bi zorê pîrek-kirin ev e.

Ger kurd viya qebûl bikin ez ê bibêjim; "Hûn hemû pîrek in". Ger hûn çareser nekin ez ê we hemûyan pîrek îlan bikim. Tu eleqeya vana bi zewaca modern re tune ye. Di zewaca modern de li beramberî hev hevnasîn, lihevkirin heye. Em ê gotin neynin ser hebûn û rûmeta xwe. Em ê dest ji rûmet û hebûna xwe bernedin. Ev wisa bilindkirina astê nîn e, parçekirin û parvekirina welat jî nîn e. Öcalan heta nefesa xwe ya dawî bide wê gotin neyne ser rûmet

û hebûna xwe. Hûn ê viya wisa qebûl bikin. Yan jî wisa bibêjin; “Ez viya nas nakim, wiya nabînim” nabe. Em tu tiştekî ku wê rûmeta vî gelî xera bike, sembol û nirxên wî biçûk bike qebûl nakin. Ez qebûl nakim. Bila tu kes hêviya viya ji min nekin. Ez nayêm vê lîstokê. Çi dikin ew dizanin, dixwazin bila deh milyon kurd bikujin. Em ê bi qasî misqalekê tawîzê ji rûmeta xwe, ji van nirxan nedin.

**14’ê Tebaxa 2009’an**

Min jiyana heyî jiyana li kuçê, li derve her tim tirsnak dît. Ez her tim ji vê jiyana heyî reviyam, ez şêst salî me hê jî direvim. Yê min jî demên berê xiyalên min ên mîna ez bibim pîlot, bifirim fezayê hebûn. Lê min dest ji van hemû xiyalên xwe berda, ketim dû azadiyê.

Hûn jî, derbarê dema berê, jiyana kevn de çi hebe hûn ê terk bikin. Ger wêrekî, hêz û zanîna we hebe hûn ê utopyayên nû yên azadiyê, awayê jiyana nû ava bikin. Jîrekiya xwe ya hestiyar, jîrekiya xwe ya analîtîk pêşve bibin. Hûn ê jîrekiya xwe ya hestiyar û jîrekiya analîtîk bi hev re bi kar bînin, bi awayê destekê bide hev û dewlemend bike hûn ê bi kar bînin.

Her kes, her tişt, pêwîst e ji serî heta binî biguhere. Hûn ciwan divê vê guherînê baş têbigihîjin, jiyanên xwe li gor vê biguherînin. Utopyayên xwe yên berê hûn ê deynin aliyekî.

Berê min jî xiyalên mezin çêdikir, min dixwest ez bibim pîlot, derkevim fezayê. Piştre min fêm kir ku ev xiyalên zarokane ne, min fêm kir ku em divê bi vê rastiyê re jiyan bikin. Bi vê dema nû re hûn jî ji nû ve şekil bidin xiyalên xwe, jiyana xwe.

Min berê jî gelek behsa mijara jinê kir. Ji bo min mijara jinê jiyanî ye. Ez bi şeklê jin-mêr-zarok mijara jinê nanirxînim. Bûye jina viya, bûye jina wiya, bûya jina kê, ez wisa nanihêrim. Pirsgirêka jinê pirsgirêkeke hê ji dîrokeke pênc hezar salî tê. Pênc hezar sal in jin hatiye fetisandin, bê nefes hatiye hiştin. Li Amedê parka jinê heye. Ev park, weke Akademiya Azadiya Jinê dikare were

veguherandin. Em ji jinê netirsin. Bila jin azad bibe, pêşve biçe. Jin, jiyanê diafirîne, xweşik dike.

Nexweşîna Gulîzar Akin xedar e? Li ku radikeve? Çend kesên wiha nexweşên giran hene? Ez ji wan re viya dibêjim: Bila xurt bin. Jiyaneke bi rûmet dan, wê mirina wan jî bi rûmet be. Pêwîst e mirov ji mirinê netirse. Yê ku jiyaneke bi rûmet bijî wê mirina wê/î jî bi rûmet be.

**26'ê Tebaxa 2009'an**

Dibistana Siyasetê ya Jinê li ku vebû, li parkê an li avahiyeke cuda ye? Akademiya ku ez behs dikim ne ev e. Na, na ne wiha ye, akademiya ku ez behs dikim wê akademiyeke komple be. Li wê derê jin ji sporê bigire heta lixwekirinê, aboriyê her tiştî fêr bibe, bike. Wê parkeke vê kompleksê jî hebe. Min ev berê jî anîbû ziman. Ev girîng e. Ez ji bo wan serkeftinê dixwazim. Xebatên din ên akademiyê dest pê kirin? Bila pir bixebitin û cidî bin.

**2'yê Êlûna 2009'an**

Cihê wî ye ez dikarim di mijara jinê de vana bibêjim:

Pirsgirêka jinê, encama çanda destavêtinê ya pênc hezar salî ye. Li vê derê ez hê jî her ku vê mijarê lêkolîn dikim, dixwînim saw li min çêdibe. Jin hê jî vê pirsgirêka xwe fêm nekirine, çareser nekirine. Divê jin pirsgirêka xwe fêm bikin, çareser bikin. Hûn ê di ferqa cinsê xwe de bin, xwe nas bikin. Ez dibêjim jina azad, ew weke azadiya cinselî berevajî, çelexwarî dikin, her tişt li derdora cinseltiyê digirin dest. Li Ewrûpayê bedena jinê pir zêde derdixin pêş, sor dikin, jinê dikin meta. Awirên we cuda, ji porê xwe bigirin heta neynûkên we hûn ê çawa şekil bidin xwe hûn nizanin. Ji ber vê yekê min ji bo Akademiya Jinê ya li Amedê daxuyaniyan da. Gihandina zarokên keçik girîng e. Heta malbatên wan nikarin zarokên keçik xwedî bikin. Hûn ê vana bigihînin. Va tê zanîn, di malbatan de tiştên weke ensest, di têkiliyan de encamên difetisîne

diafirîne. Li hember van hemûyan divê tedbîr bên girtin. Jinek dizewice, piştî du mehan şeklê wê diguhere û piştre dixwaze bi makyajan xwe temîr bike.

Jin divê parastina xwe ya cewherî pêş ve bibin. Li vê derê ez xwe bi ruhî diparêzim. Ger parastina min a cewherî nebûya, min wiha nekira, deh sal in bi psîkolojîkî ez ev qas xurt nedibûm. Yan jî li vê derê kevir be jî di ber xwe nade. Ez jinê bi felsefîkî digirim dest. Weke parçeyeke xweşikahiyên xwezayê, weke estetîkek digirim dest. Jin watedar e. Hegel, destpêkê xwest felsefeya xwe li ser têkiliyên jin û mêr bi bingeh bike, ava bike. Lê ji bo ku di viya de bi ser neket îcar di ser têkiliya kole û efendî re felsefeya xwe înşa dike. Ez jî felsefeya xwe li ser mêrê xasûk û xurt û jinê înşa dikim. Jina herî xweşik, herî saf li dijî mêrê xasûk û xurt di nav çend mehan de van taybetiyên xwe winda dike. Di Yewnanî de peyvek heye "nomos", di maneya aqil û rêzik de. Di tirkî de weke namûs tê bikaranîn. Di feraseta min a namûsê de jina bi namûs, ew jina ku xwe azad dike û rêzikên xwe ew bixwe diyar dike û rêzikên xwe ferz dike û dide jiyankirin e. Jina bi mêr ve girêdayî, rêzikên mêr wê diyar dike û di malê de tê girtin, jina bi namûs nîn e. Di Sumeran de jinên herî xweşik û bi esil di perestgeh û Zîgûratan de bi yên bi esil re jiyan dikirin. Jinên din jî bi awayekî hîn ketî dizewicîn, di malê de hatibûn girtin. Ya rastî piştre perestgeh jî hatin jirêderxistin.

Ez têkiliya bi jinê re dişibînim neweya ji amûreke muzîkê derdikeve. Bila şaş neyê fêmkirin di vê derê de bi gotina amûrê ez behsa amûrkirina jinê nakim, behsa berdewamiyê dikim. Tiştê ez dixwazim vebêjim, ger hewldaneke rast û li ser fêmkirinê hebe wê ji bo her du aliyan jî têkiliyeke têra emrekî bike, xweşikahiyên cuda di nav xwe de dihewîne û her tim teze dibe hebe. Tabî di vê derê de mêr jî girîng e. Mêr jî ger bixwazin vê xweşikiyê bijîn divê bikaribin li ser van esasan bi jinê re bigihên hev, yan na berevajî wê çanda destavêtinê her roj cinseltiya bi zorê û xwe dispêre

pêkutî û koletiyê derkeve holê. Va ye hûn dibînin, li ser navê eşq û hezkirinê serê keçên ciwan jê dikin. Jinên ku li ser van daxuyaniyan min dişopînin û bi îdîa ne dikarin lêhûrbûnê li ser bikin. Tabî di encamê de ev fikrên min in, ez li meselê wiha dinihêrim. Li ser vî esasî hemû jinan silav dikim.

**16'ê Êlûna 2009'an**

Di vê pergala kapîtalîst de ya ku herî zêde bêkar tê hiştin, di malê de tê girtin jin e. Jin mehkûmî jiyana nav çar dîwaran hatiye kirin. Rewşa kurdan jî weke rewşa jinan e. Rewşa wan dişibe hev. Ji ber vê yekê ez li ser vê mijarê pir disekinim. Lêhûrbûnên min di dema dawî de li ser e lewra dibêjim. Ez ji xwe dipirsim, ez çima nikarim bi jinekê re bikim. Ji heşt saliya xwe ve ez jinê nas dikim. Feraseta namûsê ya tê zanîn hê di van salan de li ser min ferz kirin. Ez nikarim bîst û çar saetan jî bi jineke neazad re bimînin.

Jin hatiye kolekirin, li holê çanda destavêtinê ya pênc hezar salan heye. Heta hûn vê çanda destavêtinê nebînin hûn nikarin xwe fêm bikin. Ez behsa kerxaneyên fermî nakim, ez behsa destavêtina li malên taybet, normal tê kirin jî nakim, ez behsa çanda destavêtinê dikim. Pêwîst e hûn vana pir baş fêm bikin. Lê divê viya jî bizanin, mêrê herî zêde dibêje ez ez im jî wê di nav bîst û çar saetan de ava jinê derxe. Ez ji her aliyî ve azadiya bêsînor a jinê diparêzim. Derbarê jiyana xwe de divê bikaribin biryara xwe bidin.

Tu yê jinê perwerde bikî, serbest bihêlî. Jin divê xwe azad bikin û perwerde bikin. Tenê dikarin wiha bi mêr re bigihîjin hev. Hûn ê viya jî bibînin. Hûn mêr jî xwe di vê mijarê de bibînin. Her roj li ser navê namûsê, li ser navê hezkirinê jin tên kuştin. Vaye li Amedê, jixwe hatiye kolekirin, jineke di vê rewşê de li ser navê namûsê dide ber lêdanê, dibêje "nizanim tu çûyî vê dera, te li wiya nihêrt" û teq dikuje. Ya rastî berevajî, kî li jina wê anîne vî halî, hatî kolekirin bide, bikuje, bênamûsiya herî mezin ev e. Bênamûsiyeke

ji vê mezintir tune ye. Vana li Akademiyên jinê nîqaş bikin. Heta hûn bi vana nizanibin hûn nikarin tu tişktekî fêm bikin. Min azadiya jinan, di pirtûka xwe ya Sosyolojiya Azadiyê de girt dest, divê lêkolîn bikin.

Li akademiyên siyaseta demokratîk, akademiyên siyasetê yên jinê jî dibe ku ev bên nîqaşkirin, pêwîst e lêhûrbûn li ser hebe. Ev xebateke qanûnî ye.

**30’yê Êlûna 2009’an**

Em dixwazin tevgera jinê hîn polîtîk û mezin bibe. Lê tu kes di ser partiyan re nîn e. Kes ji kesî jî mezintir nîn e. Jixwe mirovên serwext şaşiyên bi vî rengî nakin. Di vê mijarê de kurt û cewherî ez vana dibêjim.

**9’ê Cotmeha 2009’an**

Ez dixwazim li ser Bedlîsê testîpek bikim. Ya rastî Bedlîs ne tenê bajar, weke heremek e; Wan dikevê nakevê mijara nîqaşê ye. Mirov Tetwanê li ser Wan an Bilîsê bihesibîne? Lê Xelat heye, Bedlîs qadek, herêmek e. Jinên Bedlîsê hinek cuda ne. Ew rewşa jinên elewî yên Dersimî ku şiyar, serwext –li gorî gelemperiya jinên kurd dibêjim- ji bo jinên Bedlîsê jî wisa ye. Ez hinek wê heremê dizanim. Sekna jinên wan cuda ye.

Ez dixwazim meseleya jinê hinek din nîqaş bikim. Min di parêznameyên xwe de nîqaş kir, lê ez pir hêrs dibim. Behsa di mal de mayînê dikin. Min berê jî got. Ez dixwazim dîsa wiha îfade bikim. Ez ê têgîna bêdawî bi kar bînim, lê ji bo ez werim fêmkirin ez dixwazim bêdawîtiyê wiha bi sînor bikim. Çandeke bi desthilatdariya mêr a bi pênc hezar salî ku jinê girtin bin serweriyê hat afirandin. Ez ji viya re dibêjim çanda destavêtinê. Ez nafikirim ku jin ji vê çanda destavêtinê re serî daniye, xwestiye stû xwar bike. Lê li hember viya derketin, li derveyî vê çandî jiyankirin ne ew qas hêsan e. Viya parçekirin, li derveyî viya, bi mêr re têkilî danîn.

Ez ji bo mêr jî dibêjim; çanda destavêtinê ya pênc hezar salî fêmkirin, bi hiş û îradeyeke azad, ger vana hemûyan derbas bikin û bi jinê re têkilî deynin, ji bo jinan jî bi mêr re wisa têkilî danîn. Yan jî wisa di mal de mayîn filan nîn e. Jin di nav partiyê de jî, vaye hûn dibêjin "Ketine meclîsê", ev îradeya azadiyê veguherandina çalakiyê, di nav çalakîbûnê de azadbûnê pêwîst dike. Ez daxwaz dikim viya bi ser bixin.

Ez ê têgîneke nû nîqaş bikim, derbarê vê desthilatdariya mêr de. Hin nivîskar jî nîqaş kirine. Jean Baudlaîr jî fikrên heman nivîsandiye. Tiştên pir nêzî yên min dibêje. Bi taybetî di mijara desthilatdariya mêr de. Kolekirina jinê pir baş teswîr kiriye. Ew jî tespît dike ku kolekirina jinê li ser van axan dest pê kiriye, lê dibêje xala ku ev koletî hatiyê, di şaristaniya Ewrûpa de digihîje lûtkeyê. Ez jî heman tiştî dibêjim. Ev nivîskar Fransiz e, dibêjin ya niha "azadiya ku jin li Fransayê jiyan dikin". Ev koletî bi qasî koletiya ku jinek li Rojhilata Navîn jiyan dike giran e. Ya li Fransayê belkî hinek din tevlihev e, di nav gelek tişt de veşartine, lê desthilatdariya li ser jina Rojhilata Navîn zêdetir saf e, xwe dide der. Teswîra viya baş kiriye, lê nikare dahûrîne. Ew bixwe jî dibêje, ez dixwazim siyaseta viya bikim. Ew tenê sosyologek e, lê ez gihîştim heman encaman û heta qirikê di nav siyasetê de me. Jean Baudlaîr, di dawiya vê lêkolîna xwe de ji bo jinan weke derketinekê, pir reşbîn nêz dibe, belkî mafdar; eşqa bêdawî pêşniyar dike. Dibêje jin ji nav têkiliya vê desthilatiyê dikare bi eşqa bêdawî derkeve. Lê bi têgîneke ev qas naîf, bi eqşê filan ji nav vê meseleyê derketin nabe. Ez dibêjim ne eşqa bêdawî "hevberdana bêdawî". Bi bêdawîbûnê, ya rastî ez dikarim bi desthilatdariya nêr a pênc hezar salan vê bêdawîtiyê sînor bikim. Li hember viya pêşniyar dikim jin vê desthilatiyê bêdawî berde. Bila siyaseta xwe ava bikin, ji bo vê divê aboriyên xwe çêbikin. Divê jin aboriya xwe ava bike, min gotibû akademiyên siyasetê.

Ji bo jin azadiya xwe saz bike, hişekî siyasî û çalakvaniyeke siyasî hewce dike. Divê viya biafirînin. Azadiya jinê an jî têkiliya jin û mêr, wisa bi eşqê romantîk an jî eşqê bêdawî an jî bi azadiya cinsê nayê bidestxistin. Ger em ê bibêjin eşqa bêdawî, romantîk, ez behsa têkiliyên eşqê yên di roja me de tên jiyankirin nakim. Jixwe ev tiştê jêre dibêjin eşq, têgîneke li Îngîltereyê, di sedsalên 17-18'an de di romanên klasîk de hatiye vegotin. Ez behsa eşqa romantîk nakim. Eger wê bi eşqa bêdawî bijîn pêwîst e azadiyê fêm bikin. Yan jî ez behsa azweriya cinsî jî nakim. Ger cinseltî hebe jî divê ev, li ser bingeha eşqa bêdawî bê jiyankirin. Ez dibêjim destpêkê jin desthilatdariya nêr heta dawî berde, dibêjim azadiya bêdawî. Ez dixwazim li ser vî esasî ji nameyên ku hevalên jin ji min re nivîsandine re bibim bersiv. Ne tenê li Bakirkoy, Midyad an jî Bedlîsê, li gelek deran hevalên jin di girtîgehan de hene. Ez ji hemûyan re silavên xwe dibêjim. Bila lêhûrbûnên wan li ser azadiya jinê be.

**28'ê Cotmeha 2009'an**

Ez rewşa gelan dişibînim rewşa jinan. Pîrekbûn li ser gelê kurd tê ferzkirin. Girîngiya ku ez didim jinan û azadiya jinan li holê ye. Ez her tim behsa çanda desavêtinê ya pênc hezar salî dikim. Jin baştir fêm dikin ka bi çanda destavêtine re jiyankirin çi ye. Îrade û kesayeta jinê pênc hezar sal in hatine tunekirin. Jin bixwaze jî nikare hebûna xwe nîşan bide. Jin, ji aliyê civakî, psîkolojîk, aborî, siyasî, çandî, bi her aliyî hatiye dorpêçkirin. Mêrekî herî baş jî bidin ba jinekê –ez xwe jî li derveyî viya nagirim- wê di bîst û çar saetan de ava jinê derxe. Vaye viya li ser gelê kurd jî ferz dikin. Min mijara jinê di parêznameya xwe de hîn bi kîtekît vegot. Ez ne li dijî eşq û hezkirinê me, lê li ser esasên azadiyê be, kesayet û îradeya xwe biparêze. Bi vê sedemê ez silavên xwe yên taybet ji jinan re dişînim.

**18’ê Berfanbara 2009’an**

Ji bo KJB’ê serkeftinê dixwazim. Xebatên amadekirina Destûra Bingehîn a Jinê, xebata pirtûka ‘Jina Azad Kî Ye, Çawa Dijî’ û xebata ‘Konferansa Jina Kurd a Neteweyî’ ya wê ji çar parçeyan jin tevlî bibin dikarin bikin. Ji bo pirsgirêka jinê min got çanda destavêtinê ya pênc hezar salî. Çawa ku dibêjin “ji bo mirov ji Marks fêm bike pêwîst e mirov Hegel fêm bike”, ji bo mirov bibe şervanekî baş a azadiya jinê jî pêwîst e mirov çanda destavêtinê ya pênc hezar salî yê desthilatdar fêm bike. Diyalektîka Hegel a kole û efendî, li ba min weke diyalektîka mêrê serwer û zordest hatiye îfadekirin. Divê mirov vê têkiliyê baş bibîne. Hegel li ser bingeha diyalektîka kole û efendî digire dest, lê em li ser nakokiyeke pênc hezar salan a jin û mêrê zordest xebitîn û me vê pirsgirêkê dahûrand û xwe heta îro anî.

Min berê jî gotibû; “hevberdana bêdawî, eşqa bêdawî”. Bi çi hevberdan? Ev berdana ji çanda desthilatdar a pênc hezar salan e. Jin divê ji vê pîsîtiya pênc hezar salan rizgar bibin. Dîsa ez bangewaziyeke çawa li eşqê dikim? Bangewaziya min li eşqê wiha ye; eşqa ji bo jiyaneke azad û demokratîk e. Jin jî dema temenê wan gihîşt 30-40’î, bila netirsin nebêjin “wey em di mal de man”, pêwîst nake bitirsin. Bila her kes viya fêm bike ku heta jin azad nebe tu kes, civak azad nabin. Di vê mijarê de ji parêznameyên min, ji nêrînên ku min berê diyar kirine feyde bigirin. Ez ji hemûyan re silavên xwe dişînim, di xebatên wan de serkeftinê dixwazim.

**30’yê Berfanbara 2009’an**

Demokratîk-kirina çanda Rojhilata Navîn, di parêznameya min de derbarê viya de detay hene. Ji bo hûn lîstokên wiha vala derxin, bikaribin siyasetê bikin pêwîst e hûn vana fêm bikin. Ji bo vê yekê min akademiyên siyasetê pêşniyar kiribû, lê pêk nehat, we nekarî pêk bînin. Teqez divê ev bên kirin. Viya li gelek deran, heta li çar parçeyan, li Kurdistana Îran, Irak, Sûrî û Tirkiyeyê, heta li

Ewrûpayê, ji bo jinan min gotibû akademiyên azadiyê, pêwîst e hûn vana pêk bînin. AKP jî van gotinên me girtin û gelek akademiyên siyasetê vekirin. Lê ji bo hûn vana hemûyan nîqaş bikin, li gor parêznameyên min fêm bikin û germa germ siyasetê bikin min akademiyên siyasetê pêşniyar kiribû. Di vê navberê de divê hûn bizanibin hemû saziyên demokratîk bi awayekî bi bandor û xurt bi kar bînin.

Tespîteke Enver Ozkartal li ser têgîna “hevberdana bêdawî” heye. Ez difikirim ku hevalên jin jî viya fêm dikin. Ez difikirim ku di vî warî de hêzeke manewî derxistine holê. Qesta min ji “hevberdana bêdawî”, berdana çanda desthilatdar a mêr a pênc hezar salî ye. Ev desthilatiya pênc hezar salî ya li ser jinê ez weke çanda destavêtinê dibînim. Jin vê çandê berde bêguman wê azadiya wê bîne. Azadiya jinê, bingeha azadî û demokratbûna civakê ye jî. Jinê ji çîn û netewê jî wêdetir, min weke neteweya, beşa destpêkê hatiye eciqandin bi nav dikim.

Bêguman azadî û wekheviya jinê, tek rê ye ku wê biçe civaka wekhev. Ger em dibêjin wekheviya civakê, divê em viya pêk bînin. Ji têgîna eşqa bêdawî jî qesta min, eşqa azadiyê ne di wateya madî de, lê di wateya manewî de hêzeke mezin derxistina holê ye. Hûn nikarin ji viya destkeftiyeke madî yan jî kêfxweşiyê bi dest bixin, lê ji hevberdana bêdawî, weke mirov, weke jin hûn dikarin azadî û xweşikiya xwe –em dibêjin ya Helenbûn, xwedawendbûn, va Îştar, Înanna- bi dest bixin. Hûn ê bi manewî bi dest bixin. Rêxistinbûna jinan xweser e newisa, kî dertê pêş? Lê baş in.

Ez bawer dikim ku jin ne tenê di wateya siyasî de, di wateya îdeolojîk û manewî de jî wê kûr bibin, kûr bûne. Ez difikirim ku di sala 2010’an de, li ser esasên bêdawî çanda desthiltiya mêr berdan wê azadiya xwe bilind bikin. Min akademiyên jinê, akademiyên azadiyê pêşniyar kiribû. Tiştên min berê ji bo jinê gotibûn û

parêznameyên min jî tevlî bikin weke peyameke 2010’an dikarin biweşînin.

Koletiya jinê heger koletiya herî kûrbe, şoreşa jinê dibe şoreşa azadî û wekheviya herî kûr.  Şoreşa jinê hem di aliyê Teorî de hem jî di aliyê çalekiyê de hewceyî derketinên bingehîne

**2010**

**8’ê Çileya 2010’an**

Ez dixwazim derbarê jinê de jî çend tiştan bibêjim. Azadiya jinê bingeha, esasa xebatên min e. Li dinyayê û Rojhilata Navîn jin hêzeke motor e. Di sohbeta me ya sêşemê de jî em bi hevalên hatin vê derê re li ser vê mijarê axivîn. Ez bawer im li derve meseleya jinê tam nehatiye fêmkirin, herhal sûîîstîmal (bedkarî) tê kirin. Dahûrandinên min ên derbarê jinê de pêwîst e rast werin fêmkirin, divê rast were jiyanîkirin. Jin divê xwe pêş ve bibin. Li ser vî esasî ez hemû jinan silav dikim.

**20’ê Çileya 2010’an**

Di feraset û têkiliyên min de jiyaneke li ser fêmdariyê, fêmkirinê heye. Em divê jiyaneke xwe dispêre fêmkirinê biafirînin. Ew mirova/ê fêm dike mirova/ê azad e. Mirova/ê azad jî dibe xweşik dibe, mirova/ê xweşik e. Mirovên xweşik dibin jî ji jiyanê zewq digirin. Mirovê bi xweşikbûnê azad bûye dibe xwediyê jiyaneke watedar. Min berê jî got, ger ez neyêm fêmkirin ez ê her kesî hişk rexne bikim.

**27’ê Çileya 2010’an**

Min di çapemeniyê de xwend, ev bûyera revandin û kuştina keçên kurd çi ye? Di piştperdê de çi heye, ev derketin holê? Ne mafyaya wesleyan e, ger wisa bûya wê wesleyên wan bigirtina û

wisa bavêtina, lê cesedên wan dibînin. Ev balkêş e, di demên dawî de ev li Kurdistanê pir çêbû. Berê jî çêbûbûn; Îdir, Nisêrbîn... Di pişt viya de tiştek heye, tiştekî weke rêxistinê heye gelo, pêwîst e ev derkeve holê. Xerab dilîzin. Encamên viya wê xerab bibin. Divê li ser bê sekinandin. Keçên kurd ên 13-14 salî direvînin. Çi dibe, çi diqewime, pêwîst e bê zanîn

Di mijara jinê de ez dixwazim viya dîsa bibêjim ku, awayê têkilîdanîna min û jinê cuda ye. Azweriya di navbera du kesan de çi dibe ew dizane, tu kesî nagihîne tu derekê, tenê dibe hiyerarşî, helwesta patrîarkal (bavkanî), pêkutî û çanda desavêtinê. Di navbera jin û mêr de ez bawer dikim tenê li ser esasên felsefîk dîdarî dikare bibe. Hefteya borî, Zîzek –hûn dizanin, felsefevan e- ji bo anketeke Tarafê ya bîst pirsan bersivek dide. Dipirsin dibêjin ji bo we xweşikî çi ye, dibêje “bi jineke ji min xweşiktir re nîqaşkirina felsefeyê”. Balkêş e, lê ez jî heman wiha fikirîbûm. Dîdariya min jî bi jinê re –tabî ew nikarin fêm bikin lê- li ser vî esasî ye. Ji bilî dîdariya felsefîk bi jinê re hemû dîdariyên din dîdariyên rast nîn in. Cihê wê hemû zewac û têkiliyên li derveyî dîdariya felsefî bigihinê têkiliya hiyerarşîk, patrîarkal e. Di dawiyê de têkiliyên wiha têkiliyê ber bi qedandinê ve dibin. Li derveyî dîdariya felsefîk tu dîdarî viya xelas nake.

Ji bo hemû hevalên di demên dawî de hatine girtin ez di şexsê Ebrû de dixwazim bi taybetî viya bibêjim: Mirov di girtîgehê de bi tenê bimîne nayê wê maneyê ku mirov bêbandor bimîne. Kes bi serê xwe jî bimîne dikare di girtîgehê de xwe biparêze, pêş ve bibe. Li derve jî li hundir jî ger kes lêhûrbûneke pir baş bike û xwe baş plan bike ez bawer dikim ku wê gelek tişt derbas bike û xurt bibe. Ez daxwaz dikim ku li ser vê esasê xwe pêş ve bibin. Silavên xwe dibêjim.

**12’ê Sibata 2010’an**

Ez ji bo tevahiya Kongreya Civaka Demokratîk dibêjim, divê mantiqa bingehîn ev be; pratîkbûn, xebatên pratîk kirin û bi vî rengî ji pirsgirêkan re çareseriyê dîtin. Vaye min ji nûçeyan bihîst, li Semsûrê keçikeke bi navê Medînê bi saxî binax kirine, ev tiştekî bi xof û saw e. Ya rastî ya hatî binaxkirin ne tenê ew e, di şexsê wê de tevahî jin hatine binaxkirin, em hemû hatine binaxkirin. Li gor feraseta Îslamiyetê jî ev wiha ye, kuştina kesekî tê maneya kuştina her kesî. Gelek pirsgirêkên civakî yên weke vê hene divê werin çareserkirin, bi vana re eleqedarî pêwîst e.

Nameyên ji girtîgeha Midyadê hatine hene. Dikarin Girtîgeha Midyadê bi rengekî komunê bikin cureyekî manastira jina azad.

**24’ê Sibata 2010’an**

Di mijara jinê de belkî ez heta 8’ê adarê biaxivim. Ger hefteya pêşiya me hevdîtin çênebe gotinên min ên îro weke peyam dikarin bidin. Di têkiliya jin û mêr de –nivîskarek jî diyar dike- dibêje jin radestî mêr dibe yan mêr radestî jinê dibe? Ev dikare were nîqaşkirin, bi ya min di roja me de her du jî radestî hevdu bûne. Pêwîst e têkiliya jin û mêr rast were fêmkirin. Bi jinekê re li ser kîjan esasî bên ba hev girîng e. Ez bixwe jî her roj vê mijarê difikirim. Ez hatim vî temenê xwe, hê jî difikirim “Mirov dikare bi jinekê re li ser kîjan esasan bigihê hev, em bi jinekê re werin ba hev em ê çi biaxivin, bi wê re kîjan mijaran biaxivin.”

Slovaj Zîzek dibêje; “Tiştê herî zêde ez pê heyecan digirim bi jineke ji min jîrtir re axaftina felsefeyê ye.” Li ser esasek diyar bi jinê re têkilî û diyalog danîn divê. Bi nêzikahiyeke rast, yanê di mijara hatina ba hev a jin û mêrekî de, ez ji viya re dibêjim zimanê pêkhatina gerdûnê. Yanê dibêjim şêwaza pêkhatina gerdûnê. Ez wiha li têkiliya jin û mêr dinihêrim. Ger ev şêwazê têkiliyê, li ser esasê vê azadiyê bê bidestxistin, wê demê dikare bigihîje Nîrvanayê.

Azîme Işik di nameya ji min re nivîsandiye de dibêje; “Ez li ser van mijaran kûr bûm, ez dibêjim En-el Hak.” Ez nirx didim viya. Ez li ser esasê hurmetê nêzî jinê dibim. Li gor ku jin ev qas min dişopînin, wisa ye ku di min de hin aliyan keşif kirine. Ez pir nirx didim jinê. Divê jin, azadiya xwe biparêze. Ez hêjahiyê didim viya. Jin divê bikaribe her cure azadiya xwe pêş ve bibe, di vê mijarê de bikaribe xwe gihaştî bike. Ez dixwazim ji bo vê mînak bidim. Di 415’ê P.Z. de jineke bi navê Hypatîa ji Îskenderiyeyê ji ber fikrên xwe, ji aliyê Xiristiyanên destpêkê ve mehkûmî mirinê dikin. Ji jinikê re dibêjin ku; “Tu li dijberî qanûnên me derketî”. Li hemberî tundiya wan jinik bi felsefeyê bersiv dide. Ew çiqas êrîş dikin jin bi felsefeyê xwe diparêze, felsefeya xwe datîne holê. Ji ciwanên derdora xwe re jî dibêje; “Hûn li ser esasên feydegirtinê, cinseltiya çor nêzî min dibin, ez nikarim viya qebûl bikim.” Piştre bi keviran jinikê lînç dikin û dikujin.

Vaye jin ji bo azadiya xwe divê xwe wiha biparêze. Li Semsûrê keçikê bi saxî binax kirine, bi saxî! Axa ku avêtine serê hê sax bûye heta qirika wê, heta nav dilê wê tije bûye. Ya rastî a hatiye binaxkirin jin e, jinantî ye, hemû mirovahî ye. Kesek binax bikin û milyon kes werin biaxkirin di navberê de tu cudahî tune ye. Di wê demê de jî di vê demê de jî dogmaya olî xetere ye. Dikarin bîranîna vê keçikê, jiyana wê bikin roman. Yên di girtîgeha Semsûrê de dikarin li ser viya bisekinin, Gulîzar Akin dikare viya bike roman. Ez ji bo vê dibêjim “Jin divê xwe pir baş bigihînin.” Mesela hevalên di Girtîgeha Midyadê de dikarin xwe weke ‘Dibistana Felsefeyê ya Manî’ îlan bikin. Dikarin lêhûrbûn li serê bikin. Yên Girtîgeha Amedê jî dikarin ji xwe re bibêjin ‘Dibistana Felsefeyê ya Amedê’. Bikaribin bikevin nav xebatên wiha.

**3’yê Adara 2010’an**

Ez akademiyên siyaseta demokrat girîng dibînim. Ger ev akademî hebûna, ciwanên di van deran de digihên wê jiyanê

bidana civakê. Belkî hûn fêm nakin, mirov xwedî serwextbûneke demokratîk be, di nav komunên demokratîk de bijî, demokrasiyê qebûl bike, di her qada jiyanê de nirxê mirov zêde dibe, zêdetir bi jiyanê ve girê dide. Li Semsûrê zarokeke keçik bi saxî binax kirin. Li gelek deveran jî întîxarên jinan çêbûn, çêdibin. Çareseriya viya siyaseta demokratîk e, di civakê de hişê demokratîk avakirin e.

Li Êlîhê berê gelek întîxar çêdibûn, di demên dawî de ev kêm bûn. Sedema viya li Êlihê siyaseta demokratîk pêş ket, nîqaşên demokratîk zêde bûn, bilind bûn. Di civakê de çanda demokratîk her ku berbelav bibe wê zêdetir bi jiyanê ve girê bide.

Di felsefeya min a siyasetê de, encama herî rast a ku min bi cêribandinên xwe yên ev qas sal derxistin; bi awayê komunên demokratîk rêxistinbûn û van komunan di her beşê civakê de belavkirin. Di parêznameyên xwe de, di beşa Sosyolojiya Azadiyê de bi berfirehî li ser van mijaran sekinîm, ji vana feyde bigirin.

Min di parêznameyên xwe de modêla çareseriyê jî bi berfirehî vekir. "Xelasiya ji moderniteya kapîtalst, mirov çawa bigihîjê şaristaniya demokratîk" li ser vana xebitîm. Cewhera felsefeya min a siyasetê komunvaniya demokratîk e. Ez viya her wekî dişibînim eşîret, qebîle û terîqetên demên kevn, lê zîhniyeta komunên demokatîk ji vana cuda ye. Komunên demokratîk cureyek eşîreta modern, qebîleya modern, terîqeta modern û malbata modern in. Awayê modern û pêşketî ya van hemûyan e. Weke mînak pêwîst e parêzerên min jî di nav komunê de bijîn. Divê ferdparêz nebin, destekê bidin hev. Xwe ji feraseta ferdparêz, lîberal a kapîtalîzmê biparêzin. Bi vê ferasetê ve xwe bernedin. Ji bo di xebatên xwe de serkeftî bin, divê bi awayê komunên demokratîk xwe birêxistin bikin û bixebitin.

8'ê adarê li hemû jinan pîroz dikim, silav û hurmetên xwe pêşkêş dikim. Peyama min a derbarê 8'ê adara îsal de, li gel a tirkî pêwîst e rûpelek jî kurdî bê amadekirin. Peyama min a kurdî

dikarin li Amedê bixwînin, li her aliyî biweşînin. Peyama min a derbarê 8'ê adarê de ji nêrînên min ên berê, ji parêznameyên min, bi taybetî ji tespîtên min ên li ser jinê yên di cilda Sosyolojiya Azadiyê de û ji gotinên min ên vê hefteyê têkil hev bikin, amade bikin.

Bi vê sedemê li ser 8'ê adarê ez dikarim vana diyar bikim: Dema heta Sumeran, di pêvajoya pênc hezar salan de demeke dayiksalarî hat jiyankirin. Di Sumeran de ev dema dayiksalarî cihê xwe ji dema bavkanî an jî patrîarka re hişt. Di vê demê de di Sumeran de îlana dema bavkanî hat kirin. Dema pênc hezar salî ya ji Sumeran heta niha jî dema bavkanî ye. Heta roja me pênc hezar sal dayiksalarî, pênc hezar sal bavkanî hat jiyankirin. Di feraseta me de ne tam dayiksalarî ne jî tam baviksalarî heye. Feraseta me; bihevrebûneke her duyan digihîne hev, li ser felsefeyê û bi bingeheke felsefeyê ye.

Belê, jin û mêr divê li gel hev bijîn, dikarin bijîn. Lê bila ev şaş neyê fêmkirin, di vê derê de qesta min azadiya cinsî nîn e, ez vê jî erê nakim. Qesta min, divê bihevrebûna jin û mêr bi felsefeyê bê hevîrkirin û bihevrebûneke ku bingeheke wê ya felsefîk hebe. Bihevrebûna jin û mêr tenê wiha dikarin watedar bikin. Rewşeke berevajî, weke ku di kapîtalîzma wehşî de tê dîtin wê bibe cinseltiya çor, qaba. Encama vê cinseltiya jinê ya kapîtalîzma wehşî felaket e, kirêt û qirêj e. Têkiliyeke li ser cinseltiyeke qabe, hundirê wî vala, felsefeya wî tune ye divê nebe. Dema ez dibêjim azadiya jinê, jina serwext û bi îrade ye. Fikrên min ên li ser jinê pir cuda ne, pir nû ne. Di pirtûka xwe ya Sosyolojiya Azadiyê de min vê mijarê pir berfireh girt dest, dikarin jê feyde bigirin. Heta ku têkoşîna azadiya jinê neyê serxistin, têkoşîna sosyalîzmê, têkoşîna demokrasî û azadiyê nagihîjê serkeftinê.

Dîsa li ser mijara jinê ez dixwazim behsa Berlusconî bikim. Ev tespîtên min dibe di Rojnameya Manîfestoya Bajar de li ser navê min bê weşandin. Dîsa ji parêznameyên min feyde bigirin û nivîsa

min a li ser meha adarê ji ‘Manîfestoya Bajêr’ re amade bikin. Berlusconî hûn dizanin bi nêzikahiya ji jinê re pir derket pêş, li Îtalyayê pir tê nîqaşkirin. Tespîteke Berlusconî hebû, ez dixwazim balê bikşînim ser viya. Berlusconî dibêje; “Ji ber ku ez tiştên hemû Îtalyan di xeyalên xwe de dijîn dijîm, ji ber wê yekê hedef têm nîşandan.” Berlusconî ji aliyê xwe ve tespîteke rast kiriye. Berlusconî hûn dizanin temsîlkarekî sîstema kapîtalîst e. Ji ber wê yekê ez ji vê derê ji bo sosyalîstên Îtalyan bang dikim. Dikarin bibêjin; “Ocalan Bang li Sosyalîstên Îtalyan Dike”. Ji bo sosyalîstên Îtalyan banga min e: Hûn mecbûr in bihevrebûneke jin û mêr li ser bingehên felsefîk a ji serboriyên Berlusconî û di xeyalên gelê îtalyan de bibihure, biafirînin. Ev, erkeke sosyalîstên îtalyan e. Yanê divê feraseteke jin û mêr a ji feraseta jin û mêr a ku îtalyan di xeyalên xwe de dijîn û serboriyên, jiyankirinên Berlusconî re alternatîf biafirînin. Li hember feraseta kapîtalîzma wehşî ya li ser jinê ya kirêt, qabe, feraseteke, jin û mêr a watedar, bingeheke wê ya felsefîk hebe pêş bixin. Ger ev feraset, yanê feraseta rast a jin û mêr a cins neyê pêşxistin, têkoşîna sosyalîzmê, demokrasî û azadiyê nagihîje serkeftinê, wê bêwate bibe û têkoşîna sosyalîst nîvî bimîne. Bi vê sedemê ez ji bo hemû gelê îtalyan silav, hezkirin û hurmetên xwe dişînim.

**12’ê Adara 2010’an**

PAJK’ê diyar kirine ku hedef digirin ku bi sedema 8’ê adarê Kûrûltaya Jinê ya Dinyayê li dar bixin. Dibe, lê pêwîst e pêşî pirsgirêkên xwe çareser bikin, xwe bigihînin. Ne weke ‘Destûra Bingehîn a Jinê’, dikarin weke ‘Peymana Civakî ya Jinê’ îfade bikin. Divê wiha be, ‘Peymana Civakî ya Jinê’, hat fêmkirin? Ji bo hevalên jin silavên xwe yên taybet dişînim, di xebatên wan de serkeftinê dixwazim. Derbarê jinê de daxuyaniya min a 1992 an 1998’an hatî weşandin, bi dîmen e?

Rewşa jinê li Îranê çawan e, dardekirinan dikin newisa? Yên tên kirin ne siyasî ne herhal, newisa? Lê ji hevalên me yên cezayê dardekirinê li wan birîne û hê jî li hêviyê ne hene newisa? Ez ji van hevalan re pir silavên xwe dişînim. Ji bo wan sebrê dixwazim. Divê li ber xwe bidin. Îran divê dardekirinan neke, ger bike wê pirsgirêk hîn kûr bibe. Di nav hevalên li Îranê girtî de hevala bi navê Zeynep Celaliyan heye. Ji bo wê silavên taybet dişînim, bila xwedî li wê derkevin.

**17'ê Adara 2010'an**

Zîhniyeta AKP'ê gelek xetere ye. Ne tenê ji bo kurdan, AKP ji bo jinan jî xetereyeke mezin e. Dibe ku jinê bînin rewşeke wisa ku li pariyên azadiya niha dibînin jî bigerin. Terîqeta Menzîl li Semsûrê bi bandor e, li vê derê zarokeke keçik bi saxî tê binaxkirin, ev ji recmê jî xetertir e. Vaye zîhniyeta AKP'ê ev e. Dema bi sazî binax dikin tu hêdî hêdî axê dadiqurtînî û dimirî, lê di recmê de qet nebe dikarî nefes bigirî. Dîsa her roj di rojnameyan de nûçeyên derbarê tundiya li ser jinê hene. Mêrik vaye li nav kuçê gotiye "te ji min hez nekir" û jinê kuştiye, li derekê din guh jêkiriye, poz, difn jêkiriye. Ev hemû xuyabûnên, rûdanên vê zîhniyetê ne. Ha ji ber vê yekê ez dibêjim; li ser bingeha felsefeyê nêz bibin, xebatên felsefîk bikin, nîqaş bikin, xwe birêxistin bikin. Tenê bi vî awayî hûn dikarin vê zîhniyetê, vana bidin sekinandin. Yan na encama ku hûn ê bigihînê ev e, hûn ê azadiyên bisînor ên niha jî winda bikin.

Ya rastî ez ê berê li ser bisekinîma. Min dixwest ji bo hevalê ciwan ê xwe şewitand, ji Meletê Ebû Muslum Dogan hin tiştan bibêjim. Min berê kurdîtiya Meletî rexne kiribû, hişk jî rexne kiribû, lê dixwazim di şexsê vî hevalê ciwan û Zeynep Kinacî de nirxandineke nû bikim. Ev, rûmeta kurdîtiya Meletî ne. Ez bixwe jî li hember van hevalan xwe şikestî û pir berpirsiyar hîs dikim. Min berê dengê Zeynep Kinaci jî guhdar kiribû. Bi ya min ji bo van hevalan divê li Meletî abîdeyekê çêbikin. Ger li hebûna Xweda û

Xwedawendan digerin, divê di van şexsiyetan de bigerin. Kurdên Meletî divê ji şexsiyeta van hevalan re perestin bike, bîranîna van hevalan bide jiyankirin.

**7'ê Nîsana 2010'an**

Em bên ser mijara jinê; di vê mijarê de ez gelek axivîm. Ez dikarim viya bibêjim: ya rastî jiyana min a 61 salî bi têkoşîna bi feraseta namûsê ya sexte ku li ser jinê ferz kirine re derbas bû. Ji gund derketina min jî bi viya ve girêdayî bû. Lêhûrbûna min li ser vê mijarê pir çêbû. Ez bawer dikim ku min zanîna azadiya jinê bixwe derxist holê. Kurteyeke din a jiyana min a 61 salan jî ev e. Min berê jî behs kir. Li Semsûrê jin bi saxî tê binaxkirin, dîsa tiştên tînin serê zarokên keçik ên biçûk li holê ye. Jin, bi qasî ku rêxistinên xwe li dar bixin, keçikên biçûk jî têde, divê bi perwerdeya hemû jinan re eleqedar bibin. Min berê behsa Akademiyên Jinê yên Azad kiribû. Divê vê sivik û hêsan negirin. Ji hunerê heta sporê, ji tendirustiyê heta çandê, heta modayê, di her qadê de divê perwerdeyeke zêde hebe.

Wan rojan, min nûçeyek xwendibû, ji bo vekirina firoşgeheke (maxaza) li Êlihê modeleke jin ji Ûkraynayê anîbûn. Kenê min bi vê hat. Halbûkî cihê ku moda lê derketiye, Mezopotamyaya ku Êlih jî têde ye. Ya girîng mirov viya derxe holê. Di her qadê de, ji hunerê heta werzîşê, ji tendirustiyê heta çandê, heta modayê divê perwerdeyeke zêde hebe, ev di cil û bergên wan de xuya bike.

Ez di jinê de girîngiya takekesiyê red nakim. Tabîkî takekesî girîng e. Lê heta ku civakîbûn nebe, takekesîtî bi serê xwe tu wateyek îfade nake. Xwestin feraseteke wiha di nav PKK'ê de jî bi cî bikin. Ew zewacên sivik ku revokên me kirin û bihevrebûnên wan li gor min qedandina jinê ye. Ez ji bo zewacên wiha sivik nabêjim bihevrebûn, bi îfadeya herî sivik dibêjim hevdu qedandin! Ev vegotinên min, ji parêznameyên min ên berê jî feyde bigirin û

weke peyam dikarin ragihînin. Ji wan re serkeftinê dixwazim, silavên xwe dişînim.

**21'ê Nîsana 2010'an**

Her hal wê van rojan Konferansa Jinê were çêkirin. Ji bo konferansa wê bê lidarxistin dikarin peyameke min ragihînin. Di peyama min de heta niha yên min diyar kirine weke kurte dikarin berhev bikin û bidin. Bi vî rengî peyamek dikarin bidin. Dîsa bi vê sedemê ez dixwazim ji bo jinan viya bibêjim. Di jinan de zanabûna jinê êpê pêş ket, heta astekê hat. Ez dîsa baweriya xwe ya bi serkeftina têkoşîna azadiya jinê diyar dikim. Têkoşîna azadiya jinê wê bi ser bikeve. Baweriya min bi viya tam e. Têkoşîna azadiya jinê wê hêz bide têkoşîna azadiyê ya giştî. Bi vê sedemê ez jinan silav dikim. Ji bo jinên li Îzmîrê silavên xwe dişînim.

Hevaleke bi navê Viyan bedena xwe dabû ber êgir. Her hal hevaleke ji Başûrê Kurdistanê ye. Dema ku sê meh agahî ji min nayê girtin, xwe dişewitîne, bedena xwe dide êgir. Ez dibêjim qey hevaleke di asta navendî de bûye. Bi vê sedemê ez hevala Viyan jî bi hurmet bi bîr tînim. Min dîsa di hefteyên berê de jî diyar kir; bi hurmet li Meletiyê Evrîm Alataş, Zeynep û Muslum bi bîr tînim. Bi vê sedemê hevalên ku jiyana xwe ji dest dane bi hurmet bi bîr tînim.

**30'yê Nîsana 2010'an**

Di şexsê van zarokên kurd de dest davêjin xuşk û birayên we, hevserên we û dayikên we hemûyan. Bila şaş neyê fêmkirin, dema ez dibêjim hûn, ez şexsî, takekesî nakim. Ez di warê rûmeta civakî, berpirsiyariya civakî de viya dibêjim. Va min berê jî got: Muslum Dogan li Meletyê hê neketibû 18 saliya xwe –bi vê sedemê ez Nûda Karker jî bi bîr tînim- lê ji bo rûmeta gelê xwe biparêze derketineke çiqas wêrek kir. Ez vana dizanim. Lê divê qiyametê rakin.

Waliyê Sêrtê gotiye; “Zarok heta ku kevir davêjin bila fihûşê bikin”. Ha, temam va mesele hat fêmkirin. Ev gotina walî gotineke derkeve manşetan e. Pir aşkera ye ku ev polîtîkayeke dewletê ye. Yek ji taktîkên şerê taybet e ku dewlet bi salan e pêk tîne. Dixwazin bi van bûyeran çanda kurd û kurdewariyê biçûk bixin. Gelê me di warê namûsê de hesas e. Dixwazin bi vê hesasiyeta wan bilîzin. Ji bo berxwedana kurd bişkînin, çanda kurd biçûk bixînin di medyayê de viya baş dikin. Ev, tiştekî sîstematîk e, hûn viya fêm nakin. Jixwe bi qasî ku min di bûyerê de jî şopand, alîkarê gerînende, hin leşker û polês jî cî digirin. Hikûmet dixwaze ser bigire, lê divê ev bê teşhîrkirin, bûyer derkeve holê.

Kî tevlî Konferansa Neteweyî ya Jina Kurd bûn? Beşdarî baş e, xweş e. Pêşniyara konferansa pêş li Başûr bê lidarxistin jî di cî de ye.

**12’ê Gulana 2010’an**

Derbarê bûyera destavêtinê ya Sêrtê de îdîanameya bi 19 rûpelan her hal hatiye aşkerekirin. Min gotibû ku ev polîtîkayeke dewletê ye. Piştî hilbijartinan dewlet dixwaze ji kurdan tolê helîne, bi vî rengî tola xwe hiltîne. Dibêje ez ê her cure qirkirin û destavêtinê li ser te pêk bînim. Viya bi zanebûn dikin. Dibêje “Nêzikahiya min ji bo kurdan ev e”. Çeteyek girêdayî dewletê heye ya viya dikin ew e. Li Sêrtê erebên paşverû hene, eşîreteke vana jî heye, ez dibêm qey navê wan eşîreta Şêxo ye, bi qasî pênc hezar cerdewanên wan hene. Perwarî jî wisa. Li Ruhayê jî polîtîkayên li ser zarokan tên pêkanîn hene. Ev çete li ser xeta ji Sêrtê heta Ruhayê, ji Mêrdînê heta Çewlikê, Colemêrgê, Agiriyê faliyetên xwe berdewam dike. Behsa bi tevahî pênc sed kesan tê kirin. Vaye destavêtina Baykal li jor dike bi destê van çeteyan dewlet li vê derê dike. Ya li Sêrtê tê kirin heman ya ku Baykal li jor dike ew e. Ev tirsnak e, bi rûmeta kurdan lîstin e. Nayê qebûlkirin. Tiştê divê kurd ji viya fêm bikin ev e: ev piştî hilbijartinê pêk hatin newisa? Bi

viya dixwaze ji kurdan re wiha bibêje; “Hûn çi jî bikin, şaredariyê bi dest bixin jî, di hilbijartinê de bi ser bikevin jî hûn nikarin ji destavêtina me xilas bibin.” Divê ev wiha bê fêmkirin. Min li jor jî got, hem ji bo PKK’ê dibêjim, hem ji bo BDP’ê dibêjim. BDP nikare çanda desavêtinekê jî derxe holê. Ev ji rebeniyê wêdetir tiştek din nîn e.

Modernîteya demokratîk alternatîfek e, sîstema fikra alternatîf e. Di kovarê de divê cî bidin hevalên girtîgehan jî. Xwe baş gihandine, her yek bûye weke fîlozofek. Di mijara jinê de jî divê nîqaş hebe. Dema kovar vê mijarê girt dest divê bi tevgera jinê re jî hevdîtin bikin. Ew jî divê nîqaş bikin, ji kovarê re jî binivîsin. Di kovarê de zêde zêde bê nivîsandin û nîqaşkirin.

**26’ê Gulana 2010’an**

Ez ji bo kampanyaya Tevgera Jina Azad û Demokratîk daye destpêkirin serkeftinê dixwazim. Ger dema min hebe ez ê behsa vê mijarê jî bikim.

Dema milîsên Şêx Saîd dikevin Amedê bûyerên desavêtina jinan bi rengekî zanebûn tê zêdekirin û li ser navê vana hatiye hesibandin. Ji ber fen û fûtê, gelê Amedê desteka xwe kişandiye. Girtina min jî ji bo ji qirkirina fizîkî re derdoreke guncaw çêbikin sorkirinek bû, lê min vê lîstokê dît û vala derxist. Bi heman awayî bûyerên destavêtinê yên li Sêrtê jî sorkirinek bû. Gelê me zana ye, nehatiye lîstokê. Ger gel hatibûya vê provokasyonê wê bi xwînê hatibûya bêdengkirin, çewisandin. Ji ber vê yekê ez dîsa dibêjim, ev bûyerên desavêtinê bi dewletê ve girêdayî ye. Parçeyekî şerê psîkolojîk, parçeyekî şerê taybet in.

**9’ê Hezîrana 2010’an**

Wê şibandineke qabe be lê ez rewşa heyî dişibînim têkiliya zewacê. Têkiliya zewaceke wisa ku her gotina mêr pêk tê, ji sibe heta êvarî lê dide, lê dengê jinê dernakeve. Feydeya zewaceke

wiha ji bo mêr jî tune ye, mêr jî ji rê derdixe, di malekê de jin her roj lêdanê bixwe aramî jî nabe. Yan tu yê li dijî vê zewacê nerazîbûn nîşan bidî, serî bitewînî yan jî tu qebûl nekî tu yê divêtiya wî bikî.

Ez tevgera jinê silav dikim, bila min meraq nekin, tevî hemû zoriyan ez ê tendirustiya xwe biparêzim, di xebatên wan de serkeftinê dixwazim.

**16'ê Hezîrana 2010'an**

Derbarê jinan de pêşketinek heye? Belê asta jinan baş dixuyê, lê divê hê pir rê bigirin. Lê ne ku jinên me yên pir hêja tune ne. Meseleya em vê çanda destavêtinê derbas bikin baş qefaltine, lê herhal hinek şênber û teng nêz dibin. Ne pêwîst e wisa mîna femînîstan teng û seresere nêz bibin. Hewayeke wisa çêdibe wekî ku ev bûyera destavêtina Sêrtê ya derket çapemeniyê, bûyerên wiha şênber, berçav protesto dikin. Lê ev çanda destavêtinê ji hezar salan ve ye, her ku bavkaniyê jinê dîl girtiye dest pê kiriye û heta roja me hatiye. Jinên me divê bi vê zîhniyetê re têbikoşin. Ji nirxandinên min ên li ser meseleya jinê yên berê, ji daxuyaniyên min ên têkildarî çanda desavêtinê feyde bigirin û dikarin pirtûkek amade bikin. Navê vê pirtûkê jî wiha dibe: "**Ji Perestgehê Heta Kerxaneyê Pirsgirêka Jinê**". Kerxaneya vê derê jî dibe. Di encamê de dertê heman rêyê.

Ev mesele tenê bi kerxaneyê bisînor nîn e. Yek jî aliyê viya yê li "malên taybet" berdewam dike heye. Mala taybet, mala giştî ferq nake. Ez behsa desavêtina li malên jirêzê pêk tê dikim. Hûn dibêjin qey di van malan de her tişt bi îradeya azad a jinê, bi hilbijartina wê pêk tê? Na, di tu mijarî de mafê jinê yê biryar dayînê tune ye. Mêr her tiştî diyar dike, her tişt dilê wî çawa bixwaze wisa pêk tê. Binihêrin, bila şaş neyê fêmkirin ez li dijî saziya malbatê nîn im. Ger bi awayekî pir bi rêgez be û her du alî birastî bi xwe bawer bin belkî

bibe. Ez carna difikirim, ez li derve bim ez ê bikaribim têkiliyeke wiha bimeşînim?

Li gor min têkiliya, bihevrebûna jin û mêr, divê her wekî mîna hunerek be. Ger wiha bibe watedar dibe. Lê di şertên îro de jina herî zêde bi xwe bawer, bi kîjan mêrî re dibe ew dizane, dixwazî bila mêrê herî îdeal be, piştî ku bi hev re bûn, di nav 24 saetan de êdî dikeve bin nîrê, pêkutiya mêr. Ji ber ku sîstem wiha hatiye avakirin. Min vê gotinê berê jî gotibû. Heta vî temenê xwe ez ji van têkiliyan her tim reviyam, hê jî direvim. Derbarê vê mijarê de pirtûkên din jî hene hatine nivîsandin, fikrên din hene, min xwendin. Va hin pirtûkên Fatmagul Berktay hene li ser vê mijarê hatine nivîsandin, dikarin ji wan feyde bigirin. Sîstem jinê bi tevahî kiriye weke dîlan. Li tu derî jin di wateya rastî de tune ye. Di jiyana kar de tune ye, di rêveberiyê de tune ye û hwd. Lê ya rastî jin bi xwezayî xwedî van kêrhatinan e.

Di dema Neolîtîkê de ya diza, xwedî dikir jin bû, çanda xwarinê berhema wan e. Wan jiyanê heyî dikirin. Bi xwezayî xwedî van kêrhatinan in. Di parêznameyên xwe de ez her tim behsa çanda xwedawendê dikim, lê divê ev jî şaş neyê fêmkirin. Dema ez dibêjim xwedawend behsa pîroziyeke di wateya ol de nakim. Bêguman jin pîroz e, lê dema ez behsa vê çanda xwedawendê dikim ez behsa rewşa civakî ya wê demê ya jinê dikim. Xwe çawa diparêze ez behsa wê dikim. Ji xwedawendiyê çawa daxistine ji bo were fêmkirin serî li dîrokê didim û behsa çanda xwedawendê dikim. Di meseleya jinê de sê nêrînên cuda hene: 1- Nêzikahiya hestiyarî, 2- Nêzikahiya xeyalî, 3- Nêzikahiya fikrî û felsefî. Vaye Nazik Hîkmet ew û hin nivîskarên din, helbestkar, wêjevan xeyalî û hestiyarî nêzî meseleya jinê dibin. Heta ji me jî bi taybetî hin hevalên di girtîgehan de xeyalî nêz dibin. Lê nêzikahiya me ne xeyalî, rasteqînî, fikr, û felsefîk e. Ev çanda destavêtinê ya pênc

hezar salan a mêrê deshilat tenê dikare bi nêzikahiyeke wiha fikrî û felsefîk bê derbaskirin. Nêzikahiyên hestiyar û xeyalî xelas nakin.

Moderníteya kapîtalîst jinê kiriye weke amûreke seksê. Di bin navê modayê de sûs dikin, dixemilînin, di bin navê lê tê de ya rastî jinê bazar dikin. Her wekî bi çavê makîneya seksê li jinê tê nihêrtin. Mêr anîne rewşeke wisa ku tenê bi çavê seksê li jinê dinihêre. Bîst û çar saet viya difikirin û bi vî çavî li jinê jî dinihêrin. Erkeke herî girîng a dane jinê ev e; qerîzeya seksê ya bêsînor a mêr bi cî bîne. Lê di heywanan de jî ne wiha ye, di heywanan de asteke, pergaleke viya heye. Nêr û mê tenê di demên diyar de, li ser esasê pêwîstiya beramber hev cot dibin. Moderníteya kapîtalîst ji bo ser rastiya jinê bigire, her tim aliyê wê yê fizîkî, cinseltî derdixe pêş, di bin navê modayê de bazar dike û wê dixapîne. Lê di cewher de, ya rastî jinê dike kole. Sîstem û mêr biryar didin wê çi li xwe bike, porê xwe çawa jêbike, çawa bêhn bide, heta kîloya wê.

Têgînên eşq û hezkirinê jî çelexwarî dike. Lê eşq û hezkirin an jî bihevrebûn ger bi qebûla îradeyeke beramber hev, bi hurmeta ji îradeya jinê re û xwezaya wê re, li gor cewhera wê be watedar dibe. Berevajî "eşq-hezkirina" bi feraseta çanda destavêtina destilatdar tê jiyankirin jinê diqedîne. Vaye nêrîna Erdogan a li ser jinê li holê ye, nêzikahiyeke faşîzan, nijadperest-neteweperest e. Feraseta vana ya Îslamiyetê jî dixwaze ew bixwe ji serî heta binî jinê dîzayn bike. Her tiştên wê; wê çi li xwe bike, heta cil û bergên wê ew diyar dikin. Roleke pir bisînor didinê. Li gor mêr teşe didin jinê. Erdogan îradeya jinê tune dihesibîne, dibêje; "herî kêm sê zarok". Tu nikarî biryara viya bidî, ev meseleyeke tenê jin bixwe dikare biryarê bide, ji ber ku ya herî zêde ji viya bandor bibe jin bixwe ye. Hurmeta ji xwezaya jinê re, biryara di vê mijarê de ji jinê re hiştinê pêwîst dike. Hele jî jin pir zarok bîne, di her qadê de, civakî, aborî, siyasî bi tevahî ji jiyanê qut dibe, tune dibe. Bila şaş neyê fêmkirin, ez li dijî malbat û zarok nîn im. Lê zayîna zarokekî

hem fizîkî hem psîkolojîk pir zehmetî dide jinê. Xwedîkirina zarokek jî jinê dihincirîne, ji hêzê dixîne, di malê de digire, diqedîne. Bi zanîna vê, jin divê xwe nexe vê rewşê, xwe biparêze û ji bo azadiya xwe, xwe birêxistin bike û têkoşîna xwe bimeşîne.

Erdogan di axaftina civîna koma xwe ya dawî de pir hişk BDP û me sûcdar dike. Ha di vê derê de çanda destavêtinê û zorê heye. BDP bixwe jî tam fêm nekir ka Erdogan çima tiştekî wiha kir. Bersiva pêwîst e BDP bida Erdogan wiha bûya;  "Belê, dibe ku ez partiyeke, komeke biçûk bim, di nav we de jî kurd hene, kurdên destekê didin te hene, lê pênc milyon kurdên destekê didin min, dixwazin bi îradeya xwe, bi awayekî azad hebin hene." Erdogan–belkî di vê derê de îfadekirina wî nexweş be, lê kurdan weke "pîrek" dibîne. Me vê têgîna "pîrek" vê sibê bi hevalan re jî nîqaş kir. Mirov di vê şibandinê de bikar bîne wê pir di cî de be, lê rewş ev e. Erdogan bi vî çavî li kurdan dinihêre. Bi zîhniyeteke çanda destavêtinê ya bavkanî ya bi hezar salan teşe girtiye dixwaze bi zorekê bi kurdan re têkilî deyne. Di têkiliyeke zewacê de jî têkiliya bi zorê nabe. Di têkiliyeke zewacê de mêr dikare bi hevsera xwe re bi zorê têkilî deyne? Ji bo vê divê alî beramber hev razî bin, ev kar bi îradeya azad dibe. BDP divê wiha bigota; kurdên li ba te cî digirin, bi îradeya xwe ya azad destekê didin te hene tu çawa dixwazî dikarî bi wan re têkilî deynî, çi bixwazî bikî, ji ber ku ew bi dilê xwe, bi îradeya xwe bi te re dibin. Lê ger tu dixwazî bi me re têkilî deynî, divê tu riza me bigirî. Berevajî ger tu têkiliya bi zorê ferz bikî wê hevberdan bikeve rojevê. Pêwîst e mirov ji birêz Erdogan bipirse, tu bi hevsera xwe, Emîne Erdogan re bêyî ku dilê wê hebe dikarî bikevî têkiliyê? Nikarî! Berevajî wê hevberdan bikeve rojevê. Di civakan de jî ev wiha ye, ev kar bi bihevrebûnên dildarî dibe, bi zorê nabe. Ev kar bi dildarî dibin, bi zorê nabin. Bihevrebûna dildarî yan jî veqetîna dildarî. Vaye mînaka Çekoslovakya li holê ye. Îro jî va Belçîka viya nîqaş dike. Ger

lihevkirin nebe civak dikarin ji hev veqetin, lê daxwaziya me veqetîn nîn e. Me ev jî bi caran got; em alîgirê bihevrebûneke azad, wekhev û dildarî ne.

**14'ê Tîrmeha 2010'an**

Hûn dizanin, derket çapemeniyê jî, du sed kesên darizandina wan berdewam dike hene. Keçeke Mêrdînê heye dest avêtinê. Ez ji wê re, gelek lêborîna xwe dixwazim, dibêjim mexdûreya Mêrdînî, ji ber ku bûyer li Mêrdînê pêk hatiye. Ew bixwe dibêje ku, ez ji bo pere qezenc bikim, dewlemend bibim min çavê xwe girtin. Bi vî awayî dewlemendî nabe. Niha rewşa Rêxistinên Civaka Sivîl a ku vê daxuyaniyê dan jî ev e. Ew odeyên bazirganiyê, ew karsaz plan dikin ku wiha dewlemend bibin, rewşa wan weke rewşa mexdûreya Mêrdînî ye. Pêşî pêwîst e hûn desavêtinê bidin sekinandin. Ez nabêjim dewlemend nebin, hûn dikarin dewlemend bibin, lê pêşî destavêtinê bidin sekinandin. Heta ev pirsgirêk çareser nebe ne parêzer dikare parêzeriya xwe bike, ne bijîşk dikare bijîşkiya xwe bike, ne jî karsaz dikare karsaziya xwe bike.

**28'ê Tîrmeha 2010'an**

Kurd alîgirê jiyana bi hev re ne, alîgirê veqetînê nîn in. Heta em Mîsak-i Mîlliya kevn jî tevlî dikin û çareseriyê dixwazin. Lê daxwaziya jiyana bi hev re bi serê xwe wateyek îfade nake, divê ev beramberî hev be, hiqûqa wî hebe, divêtiyên wî bînin cî. Madem em ê bi hev re bijîn, divê ev bihevrebûn bi awayekî qanûnî be û îfadeyeke wî ya qanûnî hebe. Em ji mînaka jinê jî derkevin rê; di zewacê de jin her roj lêdanê bixwe, bi heqaretê re rû bi rû bimîne ya wê bireve ya jî vê rewşê qebûl neke, berde. Rewşa kurdan jî wiha ye. Ger tu kurdan înkar bikî, tu mafekî wan nedî, kurd jî xwedî wî mafî ne ku divêtiya viya bikin.

**18'ê Tebaxa 2010'an**

Tabî li hember çanda destavêtinê bi tenê xebat meşandin têr nake. Dema mirovli dijî çanda destavêtinê têdikoşe divê mirov bi her awayî bigihê û têbikoşe. Ev xebat divê bên berfirehkirin û bi sazî bibin. Berevajî vê mîtîngên tên kirin ji qerabalixeke vala wêdetir naçin. Pêwîst e jin azad bibe. Ev, pirsgirêkeke ji dîrokê tê. Ne divê jin bibe koleya mêr, ne jî bibe koleya jinê. Dema destavêtin tê gotin ez tenê bi wateya cinseltiyê, behsa destavêtinê nakim. Di vê derê de dorpêçkirineke pir kûr, bi piralî heye. Nûçeyek hebû, derketibû çapemeniyê, ji Mêrdînê. Ez ji viya re dibêjim mexdûreya Mêrdînî. Li wê derê sed kesî dest avêtine zarokeke keçik. Heman tişt li gundekî Mêrdînê jî pêk hatibû. Ya rastî ev tenê ne li wê derê, li her aliyî bi sedan mînakên vê hene. Ev feraseta çandî li her derî derdikeve holê. Li Îranê jî jinên cezayê recmê li wan dibirin hene. Tabî ez tenê behsa çanda destavêtinê jî nakim, ez qesta wan destavêtinên klasîk ên di çapemeniyê de derdikevin nakim. Ez behsa destavêtina hem çandî, hem aborî, hem civakî di her qada jiyanê de dikim. Yanê jin divê di her qada jiyanê de bikaribin rêxistinên xwe yên xweser biafirînin. Min behsa akademiyên siyasetê kiribû, li van deran dikarin bisazî bibin. Li Amedê û li her derî jin pêwîst e vana baş nîqaş bikin.

Zewac, têkiliyên jin û mêr, mijarên pir kûr in, ne hêsan in. Di têkiliya jin û mêr de divê jin diyarker be. Hem dorpêçkirina civakî ya li ser jinê hem jî dorpêçkirina mêr, pirsgirêkeke ji dîrokê tê. Di vê derê de jin azadiya xwe winda kiriye. Zewac jî niha weke amûreke li ser jinê hikum bike tê pêkanîn.

Têkiliya jin û mêr weke bîreke bêbinî ye, pir kûr e. Ji vê derê dibe ku her tişt derkeve. Yan hûn ê hevdu biqedînin, yan jî bibin fîlozof. Yek ji mînakên xweş ên viya hûn dizanin fîlozof Sokrates e. Jixwe ew bixwe jî dibêje; zewacê ez kirim fîlozof. Hûn jî yan vê têkiliyê baş fêm bikin bibin fîlozof, yan jî hûn ê hevdu biqedînin. Tespîta Zîzek jî di vê mijarê de gelek girîng e. Wan jî rast fêm

kirine. Ez zewacê mehkûm nakim. Lê ez diyar dikim ku ev têkilî pir zehmet in, divê li ser esasê azadiyê bin. Tercîha jinê di zewacê de divê esas bê girtin. Jin, divê diyarker be. Jin pêwîstî û daxwaziyên xwe rast diyar bike û di vê mijarê de bikaribe hêza biryargirtinê nîşan bide. Derbarê her qadê jiyanê de nîqaşên xwe yên xweser bikin, van biryaran bigirin û divê van biryaran pêk bînin.

**1'ê Êlûna 2010'an**

Ez Samandagi wan deran baş dizanim, hevalên min ji wan deran hebûn, mirovên baş bûn. Ji Samandagê du hevalên me yên jin hebûn, mirovên wêrek bûn. Yek hat windakirin, a din jî li Colemergê êrîşa întîxarî kir. Ev her du heval jî divê werin lêkolînkirin, navê wan hîn bibin, wiha fotrafên wan ên mezin daleqînin, bîranîna wan bikin. Weke min got, yek hat windakirin; vê hevalê anîn hatin, çi kirin, çawa kirin ez nizanim. Min careke din ji vê hevalê agahî negirt. Ya din jî her hal di pêvajoya girtina min de, li Gever-Colemêrgê çalakiya întîxarê pêk tîne. Tabî bîranîna van her du hevalan pir girîng e, bila aqûbeta wan lêkolîn bikin, nasnameyên wan tespît bikin. Nav û fotrafên wan derxin holê û bîranîna wan bi heybet bên kirin. Bi vê sedemê ez van her du hevalan bi bîr tînim. Di roja me de jî ev cure kuştinên veşarî-sergirtî tên kirin. Destavêtinên li Perwariya Sêrtê, destavêtinên li Şirnexê, dîsa ez nizanim tê bîra we, ew bûyera li Mereşê çar xuşk bi destê hev girtibûn xwe avêtibûn avê –ev weke întîxar di çapemeniyê de derketibû, lê ne întîxar bû- dîsa li Kûlûya Konyayê mirina çar xuşk û birayî, ev malbat kurd bûn? Em ji çi tirsiyabin tê serê me. Pir zêde nakeve serê mirov ku çar zarok bi armanca lîstokê ketibin wê derê.

**8'ê Êlûna 2010'an**

Ez a ji ber vê êşê, ji ber ku viya dizanim li dijî zewacê me, li dijî zarokanînê me jî. Va ji ber vê yekê dilê min ji van hemû zewacan dixele. Dibe ku jin dilê xwe bihêlin, lê ger em ê nikaribin zimanê

xwe yê zikmakî jî hînî zarokên xwe bikin, radestî vê sîstemê bibin, wê tu maneya vana nebe. Ez careke din dibêjim, çima nayê fêmkirin? Ev mijar ji bo me mijareke herî jiyanî ye. Zimanê zikmakî û çanda wan dema zarok mezin dibin divê bi wan werin qebûlkirin. Di vî warî de ez dîsa ji bo wî zarokê bi navê Zindan û malbata wî silavên xwe dişînim. Bila ew jî bi vî awayî nêzî bûyerê bibin. Qirkirina çandî naşibe qirkirinên din, a herî xetere ye. Ji qirkirina fizîkî jî hîn xetertir e, lê hûn fêm nakin, mirov dirizîne, ji mirovahiya wê/î derdixe, kesayeteke bê rûmet derdixe holê. Heta qirkirina çandî mirov tîne rewşeke wisa ku, dema tu dikevî ferqa wê jî êdî tu di rewşeke wisa de yî ku tu nikarî tiştekî bikî. Ev qirkirina çandî, ji qirika me, ji stûyê me ve weke zincîrek, weke benek me qefaltiye, kole dike. Zarok, di stûyê wan de bi vê zincîrê mezin dibin, malbat jî ji bo vê bişkênin naxebitin, tevkariyê pêşkêşî viya dikin. Dema ez vana dibêjim bila wisa neyê fêmkirin ku ez li dijî tirkî û hînbûna tirkî me. Em tirkî jî hîn dibin, nerazîbûnek me li hember wê tune ye. Heta binihêrin ez li vê derê bi tirkî diaxivim, lê ev hemû nayê wê maneyê ku me dest ji vê têkoşînê berdaye.

**17'ê Êlûna 2010'an**

Min berê di mijara jin û dayikan de jî behs kiribû, meseleya mirîşkê mînak dabû. Ger zarokên me ji zimanê xwe bên qutkirin û bidin ber qirkirina çandî, em divê zarokên xwe ji destê dewletê bikşînin, wê çaxê bila ji destê dewletê bigirin. Bila bibêjin "Em ê rê nedin vê qirkirina çandî". Pêwîst bike bila bi tevahî dibistanan boykot bikin, perwerdeya xwe ew bixwe bikin. Heta mal, divê her malekê bikin dibistanek, li malan perwerdeya ziman bidn. Selahatîn Demîrtaş di vê mijarê de daxuyaniyek da got; "Ez jî zarokên xwe naşînim dibistanê". Di vê mijarê de pêşniyareke min jî ji bo wî heye. Tevî vê neşandina dibistanê, perwerdeya ziman a zarokên xwe, bêyî ku ji dewletê hêvî bike mamosteyeke tirkî yek jî kurdî bigire û bi vê rêbazê zimanê xwe fêrî zarokên xwe bike. Viya

pêk bîne û ji raya giştî re jî îlan bike; li hundir û derve, di çapemeniya dinyayê de, di hemû çapemeniyê de ev derkeve. Ev derketin bi sembolîkî gelek girîng e. Ev, pêşniyareke min e.

Di vê mijara zimanê zikmakî de divê Neteweyên Yekbûyî, Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê (DMME) rakin ser piyan. Serlêdan bên kirin û doz werin vekirin. Bi hinceta "Zarokên me bi qirkirina çandî re rû bi rû dimînin, nikarin bi zimanê xwe yê dayikê perwerdeya xwe bibînin". Di van mijaran de pêwîst e ji bo NY û DMME'yê bi hezaran serlêdan bikin, doz vekin. Divê bikaribin di her astê de mafên xwe biparêzin. Polîtîkayên ku Tirkiye li ser zarokên kurd pêk tîne li dijî Peymanên Mafên Zarokan ên NY ne jî. Di van peymanan de derbarê vê de sererastkirin hene, pênaseya qirkirina çandî heye. Hemû dinya di vê mijarê de divê rakin ser piyan. Dîsa gelê me yê li Ewrûpayê jî di mijara ziman de pêwîst e hestiyar bin. Ne wisa be wê rewşa zarokên kurd ji ya zarokên ermen xerabtir bibe. Dibistanên ku zarokên kurd têdê dixwînin wê zêdetir bişaftin bikin û texrîb bikin.

**27'ê Êlûna 2010'an**

Derbarê azadiya jinê de gelek nirxandinên min çêbûn, hewldanên min jî tên zanîn. Ez xebatên jinê dişopînim, asta wan baş dibînim. Gotinên min ên li ser çanda desavêtinê pêwîst e şaş neyê fêmkirin, rast were fêmkirin. Dema ez dibêjim çanda desavêtinê, bi awayê jin bi tevahî bêîrade tê kirin digirim dest. Silavên xwe dişînim, serkeftinê dixwazim.

**13'ê Cotmeha 2010'an**

Ji bo Konferansa Neteweyî ya Jina Kurd Hewldaneke Jina Kurd hatiya avakirin. Beşdarî çawa bû? Di dema komploya çaremîn an jî dema komploya kesk de ez dixwazim vana diyar bikim. Aliyê jinê yê vê demê heye. Di vê demê de herî zêde parastina cewherî ya jinê girîng e. Ez rasterast bi feraseta namûsê nêz nabim, behsa jin ji aliyê mêjî, ruhî û bedenî ve xwe biparêze dikim. Binê daxuyaniya

Erdogan ya “Sê zarok çêkin” ne vala ye. Vaye şaredarê Rîzê dibêje ku “Ji kurdan jinan bînin”. Ev wisa vegotineke sivik nîn e. Şaredarê Rîzeyê wisa bi serê xwe vana nabêje, di bin agahiya Tayyîp Erdogan de van axaftinan dike. Ev parçeyên planeke diyar a komployê ne.

Bi qasî ku ez dizanim keçeke 12-13 salî ji Agiriyê çûye wê derê ji bo findiqan berhev bike, yekî Rîzeyî nas dike. Ev di çapemeniyê de weke “eşq”a mezin tê nîşandan. Ev eşqeke çawan e! Qet eşqa keçeke 12-13 salî dibe! Keçikeke ji bo xebatê, berhevkirina findiqan diçe wê derê, di şertên pir xerab de dixebite, pêwîstiya wê bi derfetên madî heye, ji bo di şertên baştir de bijî naçarî tercîheke wiha bûye. Malbat jî viya erê dike. Aliyê din jî tevî ku qet pêwîstiya wan tune ye, li herêma wan keçikên hîn zêde perwerdekirî hene viya tercîh dikin! Ya rastî ev eşq an jî zewaceke normal nîn e; koletiyek e, kiryareke koletiyê ye. Wê keçikê bigire weke kole bide xebitandin. Ez ji bo vê keçikê pênaseya “mexdûreya ji Agiriyê” bikar tînim. Li Agiriyê ez dibêm qey zewacên wiha berbelav in.

Belê li Agirî û Mûşê jî berbelav e. Hinek li Ruha û Amedê jî çêdibe. Weke mînak dema ji Ruhayê jin dibin Behra Reş di rê de, li Meletî qeza çêbûye. Ev polîtîkayeke bi zanebûn a dema komploya kesk e. Vaye ji heremê jinên kurd dibin û bi vî rengî di ser malbatan re têkilî tê pêşxistin. Mesela li Amedê keça malbata Kepo dabûn yekî ji Behra Reş. 13 hezar nifûsa vê malbatê heye. Di ser van malbatan re, bi vî awayî armanc dikin ku qirkirineke çandî pêş bixin. Nebêjin qey bi keçên kurd re zewaceke normal tê kirin, bi tevahî ji bo kolekirina wan, ji bo wan di xizmeta xwe de bidin bikaranîn e.

Ya rastî keçên wan ên derdora wan, ji keçên kurd zêdetir xwendine û zêdetir li gor feraseta wan in, lê ne ji derdora xwe, bi zanebûn keçên kurd tên hilbijartin! Bi vî awayî hezar keçên kurd bibin Behra Reş, Qeyseriyê, tê maneya bi hezar malbatên kurd re

têkilî datînin; van hezar malbatên kurd ji civaka wan qut dikin û dixin bin kontrola xwe. Li Agiriyê ji TOKÎ'yê (xaniyênkomî) xaniyek dane keçika di vê mijarê de bûye yekemîn. Lê bi awayekî pir bi plan reklama viya kirin.

Li Mêrdînê keçika dest avêtinê, mexdûr bûye hebû. Di bûyera yekemîn de keçika ku destavêtinê piştre gotiye "Ji bo pere qezenc bikim ez viya dewam dikim". Dadger jî ji ber ku bi hinceta ku bi riza ye cezayên sûcdaran daxist! Parêzera jin a bi doza vêya re eleqedar dibû navê wê Reyhan bû ez dibêm qey. Dikare pirtûkeke jiyana wê vedibêje binivîse, ne tenê ev, bila lêhûrbûna wan li ser mijarên wiha bin. Li Êlihê jî bûyerên destavêtinê yên tên zanîn hene. Li dibistanên leylî (dibistanên şev jî lê dimînin) jî bûyerên bi vî rengî berbelav in, bi plan in, pêwîst e mirov li ser vana pir baldar be. Weke van mînakan bi hezaran mînak hene. Bûyerên li Sêrtê hatin jiyankirin hene. Dest davêjin zarokên temenê wan biçûk û dikujin.

Dibêjim dest davêjin zaroka 4 salî ya serokê BDP'a Kirşehîrê û piştre dikujin. Heyf! Di civakekê de jin bi qirkirina çandî re rû bi rû mabe ew civak qediyaye, tiştek ji wê civakê dernakeve. Dîsa di civakekê de ger dest davêjin zarokên keçik û li derekê bi sedan mirov tevlî viya dibe ew civak qediyaye.

Saziyên jinan çi dikin? Nîvî jê di xizmeta sîstemê de ne. Saziyên jinan, divê keçikan perwerde bikin, serwext bikin. Saziyên jinan divê kongreyekê li dar bixin. Rêveberiyeke daîmî ya vê kongreyê teqez divê hebe, şev û roj bêsekin divê bixebitin. Bûyerên destavêtinê yên li Êlihê, Sêrtê, Mêrdînê, bûyerên ez behs dikim hene. Ev hemû encamên polîtîkayên vê demê ne. Yanê kurd, di nav pencê qirkirineke çandî ya pir mezin de ne. Ez ji bo yên me jî viya dibêjim, pêşniyar dikim: Teoriya Hevjiyana Azad. Ez vê têgînê bi kar tînim. Min vê mijarê di parêznameya xwe de jî diyar kir. Ez hemû zewacan lanet nakim, mehkûm nakim. Zewacek tenê li ser

esasên azadiyê divê hevgirtî be. Ger zewac di vê wateyê de hevgirtî be wê watedar be. Ne wisa be zewaca rojekê jî wê hevsenga we, dinyaya we serûbin bike. Hûn jî divê şev û roj di vê mijarê de bixebitin.

Gelek dosyayên wiha ji bo parêzeran tên, ji vana jî derkevin rê dikarin xebatên girîng derxin holê. Di vê mijarê de ez ji kurdan re viya dibêjim, bila girîngiyê bidin perwerdeya keçikên xwe, divê keçên xwe biparêzin. Perwerdeya xwe bidin zarokên xwe, keçikên xwe, ji bo vê divê cihê perwerdeyê vebikin. Xwedî li zarokên xwe derkevin. Ez dixwazim ji van hemû vegotinên xwe bigihêm vê derê. Kurd, di nav pencê plana qirkirineke pir mezin de ne. Heta min navê parêznameya xwe ya nû danî “Di Nav Pencê Qirkirina Çandî de Kurd”. Hûn di nav pencê qirkirina çandî de ne.

**1’ê Mijdara 2010’an**

Nêzî 10 hezar kesî tevlî Kongreya Jinê ya BDP’ê bûne, pêkhateya beşdaran çawa bûn? Bi giştî ji bilî dayikan, jinên entelektuel hebûn, tevlîbûna dayikan girîng e, lê divê aliyê entelektuel piştguh neyê kirin. Ez ê behsa meseleya jinê bikim. Jixwe min berê behs kiribû, dem bi dem ez behsa vê mijarê dikim. Di parêznameya xwe ya nû hazirkirî de ez li ser vê mijarê jî disekinim. Min berê gotibû daxuyaniya vî şaredarê Rîzeyê ya “hêwî” ne rasthatinek e. Paşerojeke viya ya dîrokî heye, ev tiştên gelek kûr in. Jinên kurd bibin Behra Reş –Qeyserî- herêma Anatolya Navîn, zewacan pêk bînin û destekê bidin van hewdanan, bûyerên sivik, jirêzê nîn in. Nîşaneya hewldana bişaftineke bi kok, kûr e. Ev polîtîkayek e. Di ser jinê re polîtîkayeke, pêkanîneneke bi sîstem a bişaftinê heye. Ez vê mijarê bi hevalên, xortên vê derê re jî nîqaş dikim. Di tevahiya dîrokê de, pênc hezar sal in jin di malê de hatiye hepskirin, jiyaneke ji mirinê xerabtir, sosret berdewam dike. Întîxar ji ber vê yekê pêk tên. Şertên jiyanê yên wisa li ser jinê hatine ferzkirin ku bimire baştir e, ev şertên jiyanê ji mirinê wêdetir

xerabtir in. Ji ber vê yekê jin ew qas tengav dibn ku, çareseriyê di xwekuştinê de dibînin. Ev xwekuştinên li Êlihê, li heremê, ez dibêm qey ev bûyer li Başûr zêdetir dibin, behsa bi sedan xwekuştinên jinan dikin. Dibe ku beşek ji vana kuştin bin. Lê di encamê de ev bûyer nîşan didin ku jin di nav tengasiyeke çawa de ne. Weke tek çareseriyê mirinê dibînin.

Ne pêwîst e jinên me bikevin nav fikarên "wê pêşeroja me çi bibe". Ji wan şertên ku têde ne an jî ji şertên di pêşerojê de wê di nav de bên hepiskirin xerabtir çi dibe? Jinên me divê êdî fikarên wisa biçûk deynin aliyekî. Ez dizanim, dem bi dem ev cure fikarên beşek hevalên jin ên di nav refên me de jî çêdibûn. Jin, divê xebatên xwe yên xweser derxin holê û bi vî rengî xwe azad bikin. Pêwîst e zanabûna xwe ya cewherî, rêxistinbûna xwe ya cewherî xurt biafirînin.

Tevî hemû hewldana ku em bi salan e nîşan didin bi qasî serê derziyê jî rê negirtin. Di vê maneyê de divê jin bixebitin, jinûve afirandina mêr divê pêk bînin. Divê nebin dîlê çanda destavêtinê. Ev a ku ez behs dikim destavêtina tenê di maneya fizîkî de nîn e, ez behsa çanda destavêtinê ya bi hezaran salan e berdewam dike dikim. Li Amedê divê cî, navendeke jinan hebe, bikaribin xebatên xwe ji vê derê bi başî bimeşînin. Û bigihên jinên nav gel û wan ronî bikin. Silavên xwe ji hemûyan re dibêjim.

**6'ê Berfanbara 2010'an**

Fikrên min ên derbarê mijara azadiya jinê de jî tên zanîn. Jin jî rêxistinbûna xwe ya cewherî hîn xurt bikin û bikaribin hêz û destekê bidin têkoşîna me ya demokratîk. Guherîn û veguherîna jinê, guherîn û veguherîna civakê ye. Vaye dibêjin Jin, Jiyan. Em di nav demeke ku me vê pêvajoyê daye destpêkirin de ne. Her kes, hemû jin divê bi vê zanebûnê nêzî xebatan û pêvajoyê bibin.

Ez silavên xwe ji jinên girtîgeha Mêrdîn û Amedê re û hevalên din re dişînim. Pêşniyara min ji bo jinan bila zêde zêde bixwînin. Di mijara zanîna cins a demokratîk de xwe ronî bikin.

**15'ê Berfanbara 2010'an**

Li Amedê civîneke bi mijara "Tundiya li ser jinan û têkoşîna bi tundiyê re" hatiye lidarxistin. Ez ji jinan re dibêjim, navendên wan hene, bila xwe xurt bikin. Dema me nema, ji ber wê yekê ez ê zêde behs nekim, lê jin, di dema xwedawendan de navenda jiyanê bû, niha jî di rewşa navenda lîtavê, avzêmê de ne. Ji ber vê yekê têkoşîna jinê girîng e, divê jin bibe navenda jiyana, çareseriya demokratîk û hêza digihîne hevdu.

Azadî û wekheviya jin ne tenê azadî û wekheviya civakê diyar dike. Jibona wê pêwîstiya sazgeriyên teorî, bername, rêxistin û çalakî heye

**2011**

**7'ê Çileya 2011'an**

Derbarê meseleya jinê de min pir nivîsand, tê zanîn ka em çawa li vê meseleyê dinihêrin. Di parêznameyên xwe de jî min cihekî girîng da vê mijarê. Pirsgirêka jinê bingeha hemû pirsgirêkan e, çareserkirina meseleya azadiya jinê tê maneya bi giştî çareserkirina têkoşîna azadiya civakî. Dema ez dibêjim jin bi feraseteke cinsparêz nabêjim. Min wan çendan pirtûkeke nivîskareke Emerîkayî xwend. Nivîskareke jin, femînîsta fîlozof, femînîst a Emerîkî Jûlîet. Ez jî tevlî tespîtên vê nivîskarê dibim, objektîf nivîsandiye.

Ew, veqetîna femînîzma biyolojîk û femînîzma çandî dike. Tabî aliyê siyasî yê meseleyê jî heye. Gelek girîng e ku jin di têkoşîna siyasî de cî bigire. Xebata jinê di vê xalê de hîn girîng dibe. Jina azad bûye, ne bi tenê, mêr jî tevlî bike û divê li hember desthilatdarî û zihniyeta mêr a serwer bi hev re têbikoşe. Êdî divê ev çanda destavêtinê ya bi hezar salan e berdewam dike bidawî bê kirin. Çanda destavêtinê were derbaskirin û divê jina azad bê afirandin. Bila şaş neyê fêmkirin, ez li dijî zewacê jî nîn im, lê zewacên ne wekhev in, di şertên serweriya mêr de wê hevdu bibin qedandinê. Ya rastî feraseta îro ya jinanî û mêranî feraseteke hatiye çêkirin e.

Nasnameyên jin û mêr ên em dizanin piştre hatine çêkirin, nasnameyên hatine înşakirin in. Jin, li gor vê nasnameya hatiye çêkirin bi hezar salan e tê mêtigehkirin. Nikare berdêla keda xwe bigire. Weke mînak ev ferasetên olî yên weke Hîzbulah, jinê digirin, ji civakê qut dikin. Em turbanê deynin aliyekî, ev çarşev e bûrka ye çi ye, di nav wê de digirin, ji serî heta binî girtî ye, rûyên wan jî nayê dîtin. Feraseta azadiyê wiha dibe? Mirov dikare jinê bi vî awayî bi azadiyê rave bike? Di Îslamiyeta rastîn de jî tiştekî wiha tune ye. Tu eleqeya vana jî bi zîhniyeta Îslamiyetê re tune ye.

Wan rojan nûçeyeke balkêş bala min kişand: Ez dibêm qey li gundekî Mêrdînê pêk hatiye. Li gundekî Mêrdînê mêr, ji Fasê jinan bûk tînin weke hêwî. Ev jin hinek jê bi çend zimanan dizanin, di nav wan de yên mamoste hene. Ji mêrên çend jinên wî û deh dozdeh zarokên wî hene re weke hêwî tên. Rewşeke balkêş.

Di nûçeya min xwend de bi vî rengî behsa heftê-heştê zewacan tê kirin. Fas di bin bandora ereban de ye, lê serweriyeke cihûyan jî heye. Û ev hemû tiştên diqewimin, tên jiyankirin dibe ku bi plan bin. Bi vî awayî jinan bi kar tînin. Hem jî siyonîzm bi vî rengî dest davêje Mêrdînê. Berê li Ruhayê jî bi heman awayî, weke mînak şaredarê berê yê Heranê, ez ne şaş bim bi jinekê ji Enqereyê re

dizewice, weke hêwî tîne ser çar jinên xwe. Piştre ev jin dibe parlementera AKP'ê. Ev, nîşaneyeke din e ka jin çawa tê bikaranîn. Dîsa tê gotin ku Îsraîlî ji Ûrfayê bi hezaran donim erd dikirin.

Vaye karê paqijkirina eraziyên bi mayîn jî dabûn fîrmayên Îsraîlî. Bi vî awayî ji Filistînê jî ax stendin û hwd. piştre bi cî bûn û dewleta xwe ava kirin. Dewletên ereb dengê xwe nekirin. Bi taybetî ez dîsa diyar bikim, bila şaş neyê fêmkirin, ez ne antî Semîtîst im. Yê cihûyan jî mafê wan heye weke hemû gelan li Rojhilata Navîn aştiyane bijîn. Heta dikarin werin li heremê ax bistînin û bijîn, lê divê viya bi aşkerayî bikin, niyeteke wan a din, ajandayên wan ên veşarî nebe. Bi heman awayî, bi gelê ereb re jî tu pirsgirêka me tune ye, gelek dost, hevalên me yên ereb hene, ez naxwazim şaş werim fêmkirin. Ez bi salan li Şamê mam, lê dewletên ereb, weke mînak Siûdî bi sermayeya xwe destekê dide Îsraîlê, dengê xwe dernaxin.

Moderníteya kapîtalîst bi çar rêbazan; neteweperestî, cinsperestî, olparestî û zanistperestî ser vana dinixumîne, gelan dîl digire. Neteweperestî vaye rêbazeke ku fînansa gerdûnî bi kar tîne, em ê nekevin vê xefikê. Ji ber vê yekê em dijberê neteweperestiyê ne, di paradîgmaya me de neteweperestî tune ye.

Bi heman rengî rêbaza din a ku tê bikaranîn cinsperestî ye. Jin, bi hezaran sal in bi vê rêbazê di malê de tê hepiskirin, mêtingehkirin. Em vê jî red dikin. Dîsa olperestî, rêbazeke din e ku tê bikaranîn, vaye li herêmê ya li dijî me tê kirin ev e.

**2'yê Sibata 2011'an**

Min berê mînaka mexdûreya Mêrdînî dabû, Reyhan Yalçindag li wê dozê dinihêre. Reyhan dibêje ku destpêkê vê dozê di çarçoveya pîşeya parêzeriyê de girtiye. Piştre dinihêre ku du sed kesî dest avêtine keçikê û tu kes ji vana ceza li wan nehatiye birîn, piştî sê

çar mehan hemû derketine derve, kes nehatine girtin. Reyhan vedibêje ku ji vê rewşê çiqas bandor bûye. Di vê mijarê de darizîn tune, dewlet tune, cendirme tune, yanê tu tiştek tune ku vê keçikê biparêze. Tiştê li vê jinê hatine kirin ya rastî tiştekî li jina kurd hatiye kirin. Ev, polîtîkayek e ku li derên din jî hatine pêkanîn.

Tê bîra min, ez diçûm lîseyê, salên 1966-67'an bû. Cara destpêkê kasetekî Aram ketibû destê min. Dema min destpêkê li wî guhdar kir, min gotibû "her bijî, a ev e ha". Zanabûna min a destpêkê dema min li Aram guhdar kir çêbû. Çi besteya wî, çi gotinên wî û hestên ku dida, ez gelek bandor kiribûm. Û di maneya rastîn de min kurdîniyê bi saya muzîkekê nas kir. Dîsa piştî salan, sala ku televîzyona me destpêkê vebûbû. Ez bi telefonê tevlî bûbûm. Aram wê demê strana "delal delal" ya bi du bendan digot. Ev stran çîroka Derwêşê Evdî û Edûlê vedibêje. Vê çîrokê kiribû beste. Ev çîrok, parçeyekî pir biçûk a hemû çîrokê îfade dikir. Aram ev anîbû ziman, belkî tam nedida, lê dîsa jî pir bandor çêkiribû. Mirov digihand dîrokê. Di çîroke de du sed-sê sed sal beriya niha tê vegotin. Dema Osmaniyan e, di wê demê de di wateya îro de sînor tune ne, yanê çîroka eşqeke di nav herêma ku Sûrî û Iraqê jî digire nav xwe de tê jiyankirin, lê di cewherê xwe de dîrokekê dide. Derwêşê Evdî, kurdekî êzdî yê ji Şengalê ye. Bi qasî ku ez dizanim koka Ahmet Turk heta Êzidiyan, Wêranşarê diçe.

Dema tu berhemeke muzîkê jî guhdar dikî tiştekî aydî dîroka kurd hîn dibî. Digihîjî heqîqeta wî. Wê demê ew stran jî ew qas bandorker û hînker dibe ku, tu dikevî ferqa heqîqeta xwe. Mirov tenê bi zanistê nikare bigihîje heqîqeta xwe, bi huner û muzîkê jî tu dikarî bigihîjî heqîqeta xwe. Çîroka Êzdiyekî, çîroka Dewrêşê Evdî jî dikare te bi heqîqeta te, bi nasnameya te re bigihîne hev. Cihê wî ye ez bibêjim; yên orjîna xwe ya kurdîtiyê bi awayê herî saf dijîn, îfade dikin bi dorê kurdên Êzdî, kurdên Elewî û kurdên Sunî yên deştî ne. Temsîliyeta nasnameyê ya kurdên Êzdî di serê de tê. Tê

zanîn, yên herî zêde bi pêkutiyê re rû bi rû dimînin jî ew in, hatin koçberkirin.

Tabî pirsgirêka jinê girîng e. Dîroka şaristaniya çînîdar a pênc hezar salan tenê rola zarokanîn û şîr dayînê, daye jinê, jin ji viya pêk tê. Wa Erdogan dibêje ya “sê zarokan bînin”. Li hember vê ferasetê hûn têdikoşin. Hûn jî dikarin temsîliyeta jina nûjen a Rojhilata Navîn bikin. Pêkanîna vê temsîliyetê pir girîng û hêja ye. Jina ku xwe aniye vê astê jî wê bê hezkirin, bi wê jinê re jiyaneke watedar were jiyankirin. Di vî warî de hûn dikarin pêşengiyê ji jinên Rojhilata Navîn re bikin, jinan bandor bikin. Di vê mijarê de we pêşketinên girîng pêk anîn, hûn di nav van karan de ne, natirsin jî. Hûn divê van xebatan bigihînin merhaleyên hîn pêş.

**6’ê Nîsana 2011’an**

Modernîteya kapîtalîst torên (têkiliyên) civakî yên civakê parçe dike. Li dijî vana, li dijî van xetereyan pêwîst e zanîna dîrokê pêş bikeve. Diyardeya civakîbûyînê divê baş bê zanîn. Vaye Erxenê Çemê Qotê Ber; civakîbûna destpêkê ya jinê hûn dizanin li vê derê dest pê dike, ev der dergûşên neolîtîkê ne. Civakîbûna destpêkê ji vê derê dest pê kir û li her derê belav bû. Heta profesorekî Îngilîz ji bo Çemê Qotê Ber dibêje “Mirov ji vê derê li dîrokê binihêre muhteşem e!” Yên me di ferqa vê rastiya dîrokî de nîn in, sereseretiyek, nezaniyek heye. Tabî ev rewşeke xemgînî ye. Heta ku zanîna dîrokî nebe ev xebat wê kêm bimînin.

YJA-Star jî di daxuyaniya ku daye de diyar kirine ku wê sala 2011’an bibe sala azadiyê û têkoşîna xwe wê li ser van esasan bilind bikin. Di operasyonên dawî de windahiyên jinan bixwe jî bûne. Li Şirnex û Çewlikê jî windahiyên wan hene her hal.

Ez azadiya jinê weke azadiya civakî dibînim. Li ser vî esasî divê xebatên xwe pêş ve bibin. Ez bi van fikran silavên xwe ji wan re dişînim.

**13’ê Nîsana 2011’an**

Heta ez bimirim ji bo têkoşîna mafdar a gelê kurd ez ê li ber xwe bidim. Yên wê bi min re bimeşin divê viya wiha bizanibin û li gor vê bi min re bimeşin. Yan jî ger bixwazin, dikarin di rêya ku dizanin de biçin. Lê ger bi vê dozê bawerî anîbin, dixwazin hin tiştan bikin, li dû min werin divê *jiyaneke bi rêgez* berdewam bikin. Heman tişt ji bo parêzerên min jî wisa ye. Min berê jî gotibû, jiyana zewacê jî ger bikaribin li ser bingeheke baş bidin rûniştandin wê watedar be, bi têkoşînê re were meşandin, lê ez dizanim ev gelek zehmet e. Bi giştî dema jiyana malbatê dest pê dike dora pêşekiyan diguhere. Û piraniya mirovan ji ber vê sedemê her yek bi aliyekî ve diteriqin. Ji ber ku ev sîstema kapîtalîst li gor vê şekil girtiye, tije xefik e. Ji ber vê yekê jî piraniya zewacan sexte ne. Min ji bo van hemû pirsgirêkan bibînim û derbas bikim modernîteya demokratîk pêş xist û pêşniyar kir. Ji bo mirovên me ji awayê jiyana qirêj a kapîtalîzmê rizgar bikim min ev pêşniyar anîn. Belkî ji ber ku di nav de ne nayê ferqkirin, lê ev şêwazê jiyana kapîtalîst jinê jî, ciwanan jî, jiyanê bi tevahî diqedîne.

**4'ê Gulana 2011'an**

Hevaleke jin jî di nameya xwe de behsa jina azad, azadkirina jinê dike. Girîng e, lê jina azad hat afirandin, tê afirandin. Jin, di vê rê de gelek rê girtin. Ji bo min beriya her tiştî azadiya jinê tê. Heta ku azadiya jinê nebe azadiyên din pêk nayên. Di sedsala nû de, di dema nû de hemû pêşketin wê li derdora azadiya jinê pêş bikeve.

Ji nameyên ku ji girtîgehan tê ez dibînim ku mijara azadiya jinê hatiye fêmkirin, tê fêmkirin.

**11'ê Gulana 2011'an**

PAJK'ê kongreya xwe ya 8. li dar xistiye. Di kongreya xwe de; diyar kirine ku xala destpêka çareseriya pirsgirêka kurd ku bûye weke girêka kor azadiya min e, dîsa bi kongreyê weke avahiya jinê ji bo şerê gel ê şoreşgerî, ji dema pêngava 4. re amade ne. Dibêjin li dijî avahiya serwer a mêr dikarin li ser piyên xwe bisekinin, hêza

wan heye ku parastina xwe ya cewherî bikin, parastina xwe ya cewherî dikarin pêş bixin? Her hal diyar dikin ku bi îdeolojîkî kûr bûne. Serkeftinê dixwazim.

**8'ê Hezîrana 2011'an**

Têkiliya di navbera kurdan û dewletê de weke hevberdanê ye. Bihevrebûna nû ya em ê biafirînin jî, pêwîst e zewaceke azad be. Bi vî aliyê xwe her wekî pirsgirêka jinê ye. Têkilî û têkoşîna navbera kurdan û dewletê, wekebihevrebûna azad û têkoşîna têkiliya wekhev a di navbera jin û mer de ye.

**24'ê Hezîrana 2011'an**

KJB'ê Kûrûltaya xwe ya 5. li dar xistiye. Nameyên wan gihîştin min. Di Kûrûltaya KJB'ê de biryarên hatine girtin ên herî girîng: Di têkoşîna cinsiyetê de Teoriya Qutbûnê esas digirin. Çêkirina kûrûltaya jinê ya dinyayê di hedefa wan de ye. Serkeftina jinê ya di hilbijartina 12'ê hezîranê de girîng dibînin, ji sedî 30 temsîliyeta jinê pêk hatiye.

Ji bo Sema Yuce li Tûtaxê, li ser gora wê bîranîna wê çêkirine. Tabî, divê bikin. Tiştên wiha girîng in.

Mijara jinê mijareke girîng û dîrokî ye. Yek ji mijarên herî girîng ku ez jî li ser disekinim mijara jinê ye. Derbarê azadiya jinê de heta niha xebatên me yên gelek girîng çêbûn, ji niha û şûnve jî wê xebatên me berdewam bikin. Di mijara jinê de du tişt hene em dixwazin bikin û ev gelek girîng in: Ya yekemîn: Jin, bi îdeolojîkî û fikrî azad bibe û xurt bibe. Ji aliyê îdeolojiyê ve jin pir gihaştî be. Ya duyemîn; jin rêxistinbûna xwe ava bike, bigihê rêxistinbûna xwe, were wê asta ku bikare rêxistinbûna xwe bike. Ger jin di van her du mijaran de bikaribe rê bigire, wê demê wê bikaribe di rêya azadbûnê de jî gavên girîng bavêje.

Li gor min, heta jin azad nebe ne mimkun e ku civak şoreşê bike, azad bibe. Azadbûna jinê, li hember çanda heyî bikaribe azad bibe, bi rexneyeke zêde ya kevneşopiyê, bi rexneya kevneşopiya heyî

mimkûn dibe. Ev jî gelek zehmet e. Ez dizanim ev gelek zehmet e. Têkiliyên heyî, bi giranî li ser destavêtinê, destavêtinên li ser bedena jinê tên avakirin. Di çanda heyî de meyla mêr, jinê weke bedeneke bikaribe dest bavêjê bibîne li ser wê ye. Di şertên heyî de pir zehmet e ku mêrekî bikaribe xwe ji viya paqij bike, ji vê ferasetê xelas bike. Heta ku jin azad nebe wê mêr jî nikaribe ji vê rewşa xwe xelas bibe.

Têkiliya jin û mêr ne biyolojîkî filan e, bi tevahî bi navend desthilatdarî û siyasî ye. Dema hûn dîroka pênc hezar salan jî li ser zêde dikin bêdesthilatîkirina jinê ye. Ev, ji aliyê zanistî ve jî wiha ye. Ez mijara jinê gelek girîng dibînim. Koletî û azadbûna jinê pirsgirêka herî girîng a civakê ye. Koletiya jinê ya di rewşa heyî de li gor min koletiya herî giran a di civakê de ye. Ez viya ji xwe jî dizanim. Ji zaroktiya xwe ve aliyekî min ê nakeve bin nîrê pêkutiyê, azad dibe, ji her tiştî azad dibe heye. Ez hê jî wisa me. Tevî viya her roj ji bo xwe azad bikim xwe diparêzim. Ya din, gelek zehmetir e ku jinek xwe azad bike, azadiya xwe biparêze. Hema hema ne mimkun e. Ji ber ku bi modernîteya kapîtalîst re, di şaristaniya pênc hezar salan de ketina jinê ew qas mezin e ku, rabûna wê ya ser pêyan, azadbûna wê pir zehmet e.

Tabî ez nabêjim jin nikare azad bibe, li ber xwe bide. Lê azadî û azadbûna jinê, ev jiyana wê ya heyî ya mîna kole, ketinê bişkêne bi wê ve girêdayî ye. Her tim aliyekî jinê heye li ber xwe dide. Gelek taybetiyên jinê hene ku di mêr de tune ye. Di hin mijaran de ji mêr hîn pêşketîtir e. Ji bo jin bikaribe azad bibe pêwîst e pêşî xwe nas bike. Ketin çiqas kûr be berxwedana ji bo azadbûnê jî divê ew qas kûr û mezin be.

Hem jin, hem mêr nikarin aliyên xwe yên kevneşopî derbas bikin. Ev pir zehmet û pir kûr e. Yanî divê jin, jinaniya kevneşopî derbas bike. Di xeta xwe ya azadiyê de dewam bike. Eleqe ji bo

jinanî û jiyana kevneşopî nîşan nede, qîma xwe pê neyne, nexwaze û pir jî girîng nebîne.

Di rojnameya Gundemê de keseke bi navê Nesrîn Akgul nivîsandiye. Di wê derê de gotineke fîlozofeke jin ku ji aliyê dewleta Romayê ve hatiye darvekirin a Hypatîayê radigihîne. Hypatîa dibêje "Hûn mêr, ji bedena min, cinseltiya min pêvetir tiştekî din nabînin, fêm nakin". Hypatîa di sedsala çaremîn de jiyaye. Çanda dawî ya felsefeya Yewnan temsîl dike, ji aliyê Romayiyan ve li Îskenderiyeyê hatiye darvekirin. Lê ji bilî bedena jinê ji bo parvekirinê gelek aliyên wê û taybetiyên wê hene. Ji ber ku jin, di cewhera xwe de ji mêr hîn pêşketîtir û pêşvetir e. Bi bandora çanda heyî, jin nikare xwe ji çanda destavêtinê rizgar bike. Ji ber ku viya qebûl kiriye. Têkiliya jin û mêr, di şaristaniya kapîtalîst de li ser daxwaziya, arezûya herî sivik a biyolojîk, cinseltiyê ye. Nêzikahiyeke ev qas sivik e. Lê ev, pêvajoyeke biyolojîk a demkurt û sivik e. Jina ku herî zêde jixwe razî jî nikare xwe ji vê destavêtinê rizgar bike. Sema Yuce jî qebûl nedikir. Û ji ber ku qebûl nekir çalakiyeke wiha pêk anî û bi vî awayî jî em Sema Yuce bi bîr bînin. Em vê axaftinê li ser bîranîna wê bikin. Li ser vê esasê ez xetabên hevalan girîng dibînim. Di wan şertên zehmet de, li çiyê dijîn, ez dizanim, lê têkoşîna wan pir hêja û girîng e. Bila berdewam bikin. Ez serkeftinê dixwazim.

Ya li Xetîb Dîcle hatî kirin komployeke mezin a siyasî ye. Komployeke tarî û rezîl e. Li gel ku bi dengê 80 hezar kesan li Amedê tê hilbijartin ya li Xetîb hatî kirin ya rastî ne tenê li Xetîb di şexsê wî de li Amedê hatî kirin. Amed jî sembolîk e. Li hemû kurdan hatî kirin. Di vê derê de tiştê ku dixwazin bikin şikandina îradeya siyasî ye. Ya li Xetîb hatî kirin, ya rastî li Amedê hatî kirin, ferzkirina fahîşetiya siyasî ye. Ji bo ez peyva fahîşe bi kar tînim li qisûrê nenihêrin, lê hûn dizanin fahîşetî şikandina îradeyê ye, bi tevahî radest girtina îradeyê ye. Daxwaziya xwe, her tiştên

dixwazin bikin bi wan dan kirin e. Di peyva fahîşetiyê ku ji bo jinê tê bikaranîn de, mêr piştî ku îradeya jinê şikand û wê bêrûmet kir, her daxwaziya xwe bi wê dide kirin. Di fahîşetiya siyasî de jî desthilatiya siyasî piştî ku îradeya gel dişkîne û bêrûmet dike, dixwaze her daxwaziya xwe bi wan bide kirin. Di vê derê de jî tiştê di şexsê Xetîb de dixwazin bikin fahîşetiya siyasî ye. Tiştê dixwazin bi Amedê bidin kirin fahîşetiya siyasî ye. Tiştên dixwazin bi tevahî civaka kurd bidin kirin fahîşetiya siyasî ye. Bi fahîşetiya siyasî tê xwestin îradeya wan bê şikandin. Bi kesek, civakeke îradeya wî hatî şikestin jî êdî hûn dikarin her tiştî bidin kirin. Lê ez dizanim, Amed miriyê îradeya xwe ye, wê rûmeta xwe biparêze. Xetîb jî wê vê rewşê qebûl neke. Xetîb mirovekî hêja û hurmetdar e. Ne Xetîb viya qebûl dike ne jî Amed viya qebûl dike. Kurd jî vê rewşê qebûl nakin. Nîvê Amedê bikeve bin axê jî vê fahîşetiya siyasî ku li ser wan tê ferzkirin qebûl nakin.

**18'ê Tîrmeha 2011'an**

Li Kopa Mûşê Evrîm Demîra 18 salî di salvegera 14'ê Tîrmehê de ji bo aştiyê bedena xwe daye ber êgir, jiyana xwe ji dest daye. Ez xemgîn bûm, xwezî nebûya. Min berê jî gotibû; ez çalakiyên wiha yên şewatê erê nakim. Çalakiyên bi vî rengî ji kûr ve min bandor dikin. Çalakiyên wisan in pir zorê didin min. Li hemberî van çalakiyan ez xwe bêçare hîs dikim. Ez dubare dibêjim, vî şêwazê çalakiyê yê xwe şewitandinê ez tu car erê nakim. Tevî viya, ez hurmeteke mezin nîşanî çalakiya hevala Evrîm didim. Wateyeke mezin didimê. Bi rêzdarî bejna xwe li ber ditewînim. Gelê me divê van nirxên mezin tu car ji bîr neke, her tim bide jiyankirin. Lê ez tika dikim, bila ev cure çalakiyên xweşewitandinê nekin. Hejmara çalakiyên wiha gihîştin 100'î. Di salvegera 15'ê sibatê de 4 hevalên gerîla bi vî rengî çalakî kirine û xwe feda kirine. Ez bawer im hevala Evrîm di nameya xwe de navê min jî bi bîr aniye. Ez li hember mezinahiya vê çalakiyê birastî jî xemgîn dibim, di bin de dimînim.

Di şûna çalakiyên wiha de pêwîst e derfetên bi azadî xwe îfadekirinê biafirînin û li jiyanê bimînin ku têkoşîna xwe bilind bikin.

Xwestiye li ba Mustefa Malçok were definkirin, wisa xwestibe pêwîst e wisa bikin. Mustefa jî 17 salî bû. Ew jî bi çalakiya xwe me ji kûr ve birîndar kiribû. Weke ku gotiye pêwîst e li ba Mustefa were definkirin. Ji bo her duyan goreke abîdeyî ya li wan bê were înşakirin. Em, têkoşîna ji bo jin, hele jinên kurd ji vê jiyana bi êş rizgar bibin û mîna xwedawendan bijîn didin.

**27'ê Tîrmeha 2011'an**

Ez nirxandinên xwe li ser bîranîna Evrîm Demîr dikim. Ya ku vê pêvajoyê herî baş fêm kiriye Evrîm Demîr e. Vaye keçeke ciwan, 18 salî ye, lê her tiştî, vê pêvajoyê, çi diqewime herî baş ew têgihîştiye û çawa têgihîştiye biryara xwe daye û çalakiya xwe kiriye. Hewcedarî bi gotinên zêde jî tune ye. Evrîm pêvajoyê fêm kiribû, lê KCK, PKK, BDP, DTK vana fêm nekirine. Ya ku bi rastî vê pêvajoyê fêm kiriye û pêşeng e Evrîm Demîr e. Mustefa Malçok jî bi heman rengî. Her du jî pir ciwan in, pêşengên me yên hêjayî hurmetê ne. Kesên di vê pêvajoyê de ji me re herî baş pêşengiyê bikin ew in, lê di şûna ku wiha xwe feda dikin, ez tercîh dikim û pêşniyar dikim ku derfetên jiyanê yên bikaribin xwe bi azadî îfade bikin çêbikin. Ez her duyan jî bi hurmet bi bîr tînim.

**ABDULLAH ÖCALAN**